peyama Kurd

Rojnameya Gişti ya Hefteyî | Hejmar 32 / Sal 1 | 15.04.2005

Kurdish weekly newspaper | Kurdische Wochenzeitung

Donald Rumsfeld: „Serok Georg w. Bush û birêz Mesûd Barzanî wek hev difikirin.“



Rûpel 7

Kê çi got!



Piştî îlankirina encama ku ***Celal Talebanî*** wek yekemîn serokomarê Îraqê yê demokratîk hat hilbijartin, dengê kêfxwşî û şahîyê bi bajar û gundên Kurdistanê ket, Kurd li hemû deveran daketin kolanan, aheng kirin, meş û şahiyên kêfxweşiyê lidarxistin, heyecan û dilxweşiya xwe dîyar kirin.

Rûpel 4-5

Tirkiyê berê xwe dide ku?

Kurd ji aliyê Serokerkanê Tirkiyê ve weke hemwelatiyên „xwedêgiravî“ hatin îlankirin û bi awayekî fermî fermana wan hat derxistin. Êrîşkirina ser mal û kargehên wan berdewam e. Parêzerê Kurd Medenî Ayhan li paytexta Tirkiyê ji aliyê kesên ne diyar ve hat birîndar kirin. Deng ji rayedarên dewletê dernakeve.

Ala Dewleta Tirk ya ku di pîrozbahiyên Newroza îsal de ket rojeva hêrkesî, bû destpêka pêvajoyeke nû. Piştî wê bûyera ku li Mêrsînê pêk hat, Serokerkanê Komara Tirkiyê daxuyaniyeke tûj belav kir û îşaretên destpêka pêvejoyeke nû da. Têgeha hemwelatîbûnê ji aliyê Serokerkan ve hat guhertin. Bi awayekî eşkere hat gotin ku li wî welatî Kurd, hemwelatiyên „xwedêgiravî“ ne û divê ew hedê xwe derbas nekin. Piştî daxuyaniyan Kurd bûne hedefê êrîşên nijadperestan. Ewlekariya can û malê Kurdan ji berê bêhtir kete talûkê.Malbat di malên xwe de êsîr hatin girtin, zarok ji dibistanan man, kargeh û malên Kurdan hatin mohr kirin. Ala Dewleta Tirk weke singoyan li ser serê Kurdan hat hejandin û heqaret li wan hat kirin. Ev êrîşên nemirovî hîna jî berdewam in. Di demeke wiha tarî û nazik de, nûçeya birîndarkirina parêzerê Kurd Medenî Ayhan belav bû. Medenî Ayhan, di gelek axaftinên xwe de siyaseta dewletê ya li hemberî Kurd û Ermeniyan û Kemalîzm rexne dikir. Li gora hinek çavdêran ev bûyer ne girêdayî hev in û nayêne wateya destpêka pêvajoyeke nû, ji ber ku Tirkiyê nikare wî barî hilgire. Nerîneke din jî ew e ku aliyekî Dewletê û bi taybetî jî aliyê ku weke „dewleta tarî“ tê binavkirin, di nava hewldana pêşgirtina li ber demokratîkbûnê de ye. Tirkiyê dixwaze û dikare vî barî hilgire yan na? Gelo Dewleta Tirk dixwaze di çareserkirina pirsa Kurdan de li rê û rêbazên salên 1990î vegere? Heger naxwaze, wê demê çima êrîşên li ser Kurdan nayêne rawestandin? Rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd bersiva van pirsan dan Peyama Kurd.

Rûpel 3

Polîsên Îranê êrîş birin ser Kurdên sivîl
Rûpel 6

Albumî Nîlufer Akbal o newe vêciya
Rûpel 16

Mîlîtanê PDK re heta serekkomariye IRAQ: Celal Talebanî
Rûpel 17

Feqîyê Teyran li Ludwigsburgê bû mêvan...
Rûpel 15

Me di unîwersîteyên welatê xwe de berê xwe daye ser avakirina Kurdolojîyên fermî
Rûpel 9

Peyva "Kurdistan" li ser ewlekariya neteweya tirk xeter e !
Rûpel 8

Bayram Ayaz
Tirkiye dixwaze bi mertala şovenîzmê xwe li ber tîrên globalîzmê rabigre!
Rûpel 2

Salar û Mîdya: Stêrkên muzîka Kurdî yên pêşerojê
Rûpel 8



D 1.50 EUR, A 1.70 EUR, B 1.70 EUR, NL 1.70 EUR, CH 2.60 SFR
LUX 1.70 EUR, I 1.70 EUR, S 19.00 SKR, DK 14.00 DKR,
N 16.00 NOK, GB 1.10 £, GR 1,70 EUR

4 196577 401503 32

Tirkiye dixwaze bi mertala şovenîzmê xwe li ber tîrên globalîzmê rabigre!

Bayram Ayaz

Ev nêzîkî mehekê ye li Tirkîyê cardin kampanyayek şovenîst destpêkiriye û tê meşandin. Hedefa nasyonalîstên Tirk ên şovenîst tevgera welatparêza Kurd e. Van hêzan êrişên xwe wisa pêşda birine, cîh cîh xelkê Kurd yên bêrî û li halê xwe jî dibin armanca êrîşkaran.

Ev kampanya, bi taybetî piştî şewitandina ala Tirkan li Mersînê bi hêztir û berfirehtir bû. Wisa xuyaye kampanyayek bi vî rengî li hesabê dewletê jî û hukûmetê jî tê. Dewlet bê deng dimîne. Her hêz ji aliyê xwe de, hewl dide ji vê kampanyayê îstîfadê werbigre.

Kampanya û hewldanên bi vî rengî li Tirkiyê ne nû ye. Li dijî Ruman, Yahudiyan û Ermenan êrîşkeriyên wisa kirin. Di salên şêstan û heftêyan de gelek caran li dijî çepan û Alewiyan provakasyon li darxistin. Ji xwe tevgera Kurd hertim hedefa wan bûye.

Gelo yên li dû vê kampanyayê ne kî ne û armanca wan çi ye?

Hêzên ku van kampanyan organize dikin di nav dewletê da perçeyek in. Ev hêzên tarî û veşartî dem dem bi nexşeyên nasyonalîst, carna jî bi motifên olî-mezhebî hin grûpan germ dikin û wan bera ser grûpên din didin. Ev leyiztik û provakasyon îro jî hêj berdewam in. Di salên heftêyî da li bajarê Elazîzê, Meletyê, Maraşê, Çorumê û Sêwasê bozkurtçî û olperest germ kirin û wan bera Alewiyan û hêzên pêşverû-demokrat dan. Cîhna jî Tirkçiyan raste rast êrîşên Kurdan dikirin û îro jî van karên gemarî her berdewam dikin.

Tirkçîtiya şovenîst û nêrînên olî-mezhebî yên fanatîk, di destê statûkoperestan da, yanî destê Kemalîstan da du silahên grîng in.

Serkêşiya Kemalîstan ordî dike. Lê ordî tenê nîne. Gelek hêzên sivîl; wek burokrat, siyasetvan û ulimdarên Tirk hene ku mejiyê wan ji generalan hişktir, mîlîtarîsttir û şovenîsttir e.

Kemalîst, evên „çep“ jî û rast jî xwe xwediyê dewleta Tirk dihesibînin. Ew „kuweyê millî“ ne. Hem xwediyê dewletê ne û hem jî zêrevanên wê ne. Serkêşiya Kemalîstan ordî dike. Lê ordî tenê nîne. Gelek hêzên sivîl; wek burokrat, siyasetvan û ulimdarên Tirk hene ku mejiyê wan ji generalan hişktir, mîlîtarîsttir û şovenîsttir e. Ev hêz rê nîşanî hevdu didin, hevdu germ dikin û bi rê û metodên xerîb parêzeriya dewleta Kemalîst dikin. Îro tiştê li Tirkiyê diqewime, leyiztikek wisa ye.

Ev kampanya leyiztik e. Bi vê kampanyayê Kemalîst dixwazin sîstema dewletê û civakê, yanî statûkoya heyî biparêzin, rê li ber guhertinan bigrin. Emerîka ketiye Rojhilata navîn û dixwaze li vê heremê azadî û demokrasî bi cîh bibe û civakên sivîl û huquqî peyda û xurt bibin.

Ev kampanya leyiztik e. Bi vê kampanyayê Kemalîst dixwazin sîstema dewletê û civakê, yanî statûkoya heyî biparêzin, rê li ber guhertinan bigrin.

Di çarçoveya globalîzmê da xurtbûna azadîyê û demokrasîyê û geşbûna zanîna mafan û hûqûqê, gelên bindest jî şiyar dike û dihêle ku ew xwedî li mafên xwe yên rewa derbikevin. Wek encamekê van deh donzdeh salên dawî em dibînin ku bayê azadîxwaziyê û demokrasiyê êdî tesîra xwe nîşan dide.

Gelê Kurd, ne tenê li başurê welat, li hemî perçeyên Kurdistanê bi aşkere xwedî li nasnameya xwe derdikeve û doza mafê xwe bi xwe îdarekirinê dike. Bi kêmasî doza sîstemeke demokrat û federal tê kirin. Kurd daxwaza dewletê dikin û dixwazin di dewletên merkezî da jî bibin hevparek xwedî nasname, yanî hevparek bi navê KURD û KURDISTANÎ. Lê ne ku wek kesayetekî Iraqî, Iranî, Surî an Tirkîyeyî! Îro birêz Celal Talebanî, wek lîderekî Kurd bûye Serokkomarê Cumhuriya Iraqê. Dinya, birêz Celal Talebanî wek serwerekî Kurd dinase û hilbijartina wî jî wisa hat ragihandin.

Azadî, aşitî, aramî û îstîqrar armanca me ye, demokrasî daxwaza me ye, Kurd û Kurdistanîtî nasnama me ye, dewletek Kurdistanî jî hedefa me ye.

Haa, Tirkîye dixwaze pêşiya vê şiyarbûnê bigre. Ew dixwazin zanîna azadîxwazîyê û doza dewletê pûç bikin, ku her diçe di dilê Kurdên welatperwer da geş dibe. Bi van kampanyên şovenîst û êrîşkar Kemalîst û dewleta wan ya aşkere û veşartî hewl didin ku Kurdan û Kurdistaniyan bitirsînin, wan çavtirsayî bikin. Yanî Kemalîstên statûkoperest dixwazin agirê azadîxwaziyê bi êrîşên şovenîst bitefînin.

Ji bo vê yekê Av. Medenî Ayhan nav rojê li ser kolanên paytextê Tirkan li Enqereyê li ber çavên bi dehan însanan gulebaran kirin, xwestin wî bikujin. Ji bo vê yekê êrîşê dibin ser komeleyên ku di navên wan de gotina Kurd heye û xebateke Kurdewar dimeşînin, dixwazin dengê van komelan û birêvebirên wan bibirin.

Armanca dewleta Tirk û Kemalîstan dîyar e. Hêzen welatperwerên Kurd divê şiyar bin, rê li ber provakasyonan bigrin, lê her wisa di daxwazên xwe da divê em xwe ticar nedin paş. Azadî, aşitî, aramî û îstîqrar armanca me ye, demokrasî daxwaza me ye, Kurd û Kurdistanîtî nasnama me ye, dewletek Kurdistanî jî hedefa me ye.

Em divê ticar ji bîrnekin, xelkên nebin xwediyê dewlet an hevparê dewletan, di nav dest û lepê neyar û dagîrkeran de dimînin! Ew dihelin û di nav rûpelên dîrokê da wenda dibin û diçin. Derd û kulê Kemalîstan ew e ku em nikaribin bibin xwedî dewlet, dixwazin pêşî li ber bayê Kurdistana azad bigrin. Ji nuha ve dijminahiya Kurdan bihêz dikin.

Ala zilmê tucar bilind nabe



Faruk Aras

Komara Tirkiyê, li ser mîratîya Împaratoriya Osmaniya hat damezirandin. Di sedsala 19-an de di dinê de, bi taybetî jî di Awrûpa de guhirîn û pêşdehatinên mezin pêk hatin. Ev yeka tesîreke piralî li ser Împ. Osmaniya kir. Di destpêka sedsala 20-an de bi taybetî kontrola Împaratoriyê li ser gelên Balkan û Ereb hatin şikandin. Agirê azadiyê di çar alî Împaratoriyê de bilind bû. Gelên Balkan, wek Bulgar, Alban, Yunan û Sirpan aktîf û bi organîze li dijî zordestîya Osmaniya rabûn. Bê şik wê yekê bi rengekî tesîra xwe li ser gelê Kurd û ronakbîrên wî jî kir. Lê mixabin di gel hin faktorên dîrokî, civakî û sîyasî Kurd ne wek miletên din organîze bûn ne jî îradeke wana yekgirtî hebû.

Ev xetera dîrokî, bu sebebê domandina bindestiya Kurdan ya sedsalê din jî. Ji ber ku di dîroka gelê Kurd de ew konjonktur û mercên dîrokî yên wê dewrê ji yê her demê zêdetirîn destdayî bûn. Ew îmkanan cardin bi wê keysê derneketin pêşiya Kurdan.

Piştî jidestrevandina wan îmkanan, Kurd mecbûr man ji bo ku bikaribin bighêjine hin mafê xwe yên netewî, bi hemu îmkanên xwe ve piştevaniya damezirandina Komara Tirkiyê kirin. Bê şik, di wê alîkariyê de hin faktorên olî û psîkolojîk jî di helwestê de rol lîstine.

Mustafa Kemal û hevalbendên wî, ji bo ku perçek ji Anadoliyê bikaribin di dest xwe de bihêlin, gelek pirs û qewl dane Kurdan. Piştî damezirandina Komara Tirkiyê, ew pirsana di demeke kurt de hatin bîrvekirin. Kurd wek hertim dîsa hatin xapandin! Komar, di destê Kemalîstan de bû diktatoriyeke xwinxwar. Cara pêşîn dest avêtin wêrankirina Kurdistanê. Zilma xwe ya bêsînor pêşkêşi gelê Kurd kirin. Stratejîya xwe ya mîlîtarîst li ser esasê, bi xurtî înkarkirina hebûna Kurdan û Tirkkirina wan ji xwe re kirin armanc.

Ji bo guhertina vê rewşê, Kurdan dest bi serhildana kirin. Lê mixabin di bin şert û mercên kêrnehatî de bi sed hezaran Kurd hatin kuştin, bi hezaran gundên Kurdan hatin şewitandin û talankirin. Ev sîyaseta zilm û zordariyê bû qedera Kurdan.

Îro jî, Kurd çi wextê ji bo mafê xwe yê netewî, xwedî helwestekê bin, desthilatdariya Tirkiyê bi tehdît û zorbetiyê ve êrişî Kurdan dikin.

Îsal di şahiya pîrozkirina Newrozê de carke din ev helwesta qirêj derkete holê. Li ser provakasyonekê, Serleşkeriya Giştî ya Tirkiyê di daxuyaniya xwe de toz û dûman rakir. Kurd wek "qaşo hemwelatî" bi navkirin û bi qatlîama ve hatin tehtîd kirin. Li ser vê daxuyaniyê, lêpên nijadperestiya Tirkan, di çar alîyê Tirkiyê de ji bo qatlîama Kurdan bu wek provakê. Ala xwe lî hemberî Kurdan kirin sembola nîjadperestiyê. Ya rastî ev bûyera dawiyê carke din jî nîşan da ku, nasyonalîzma Tirkan mîlîtarîst, şoven û îrredandist (êrişkar, îlhaqçi) e.

Ev "serhildan" a Tirkan hîç şik tuneye, ji bo bikaribin ku rojekê rihetî mudaxaleyi Kurdistana Başûr bikin, cara pêşîn pêwîste tewgera gelê Kurdistana Bakur bête pelixandin. Di bingeha vê paranoyayê de pêşketin û îstiqrara Kurdistana Başûr heye. Ji alî yê din de jî, tevgera Kurdistana Bakur, her diçe zêdetirîn xwe ji manîpulasyona dewletê bi dûrdixe û xwe nêzî xeta welatparêziyê dike. Ev yek ji bo dewletê êşeke mezine. Faktorekî din jî heye, gere ji ber çawan neyê dûrxistin, ew jî prosesa Yekîtîya Awrupayê (YA) ye. Hêzên şoven û mîlîtarîst bi tundi dixwazin riya YA bê xitimandin ku bikaribin, panturkizm û panturanîzma xwe rihet bimeşînin.

Rastiya heyî eve ku, tecrubeyên dewlemend yên tevgera neteweyî nîşan didin, ev sîyaseta dewleta Tirkîyê yê hertim derkeve pêşîya me. Bi hin çalakiyên provokatîfên nû ve, yê doza şiddeta xwe jî her bilindtir bikin. Ji nika ve dest bi organîza hêzên paramîlîter kirine. Li gor vê pîlanê hijmara wan hêza yê bi qasî 200 000 be. Ev hijmara yê ji general û sûbayên teqaut, polîs, hêzên MHP û hevalbendên wana pêk bên. Kurdên bê parastin yê bibin hedefa van xwînxwaran. Pêwîste Kurd, rojekê berê van plan û programê tehdîtwarî deşîfre bikin û wan bighînîn rêxistinên nawnetewî. Sibehê dikare dereng be!

Impressum

Xwediyê Rojnameyê
Peyama Kurd Verlag
Peyama Kurd
Thomas-Mann-Str. 22, 53111 Bonn / Germany
Fon: +49 (0228) 18 00 654
+49 (0228) 18 00 655
Faks: +49 (0228) 18 00 656
www.peyama-kurd.com
info@peyama-kurd.com

Redaksiyon
Kurmanciya Jorîn:
Fadil Özçelik (*Editoré Bakur*),
Sîrwan Hecî Berko (*Diaspora*)
Pîrkemal (bêhnvedan-magazîn)
Kirdkî (Zazakî):
Seyîdxan Kurij (*Editor*)
Kurmanciya Jêrîn:
Dana Alî, Venus Faiq, Sîmkan Azîz, Nizar Caf, Cotyar Darfiroş, Mansur Sidqî, Mustafa Chuartaîy

Peyama Kurd ji mafê xwe dibîne, ku nivîsên jê re têne şandin, kurt bike. Ew ji aliyê rêziman û rastnivîsînê ve di serastkirina berheman de azad e. Peyama Kurd berhema ku jê re tê şandin û berê li ciyekî din hatibe belavkirin, naweşîne.

Tirkiyê berê xwe dide ku?

Heta ku dewlet pêşiya nijadperestiyê negire û jiyana her Kurdekî nexe bin ewlekariyê, emê bêdeng nemînin.

Nurettîn El Huseynî (Rewşenbîr):

Ev ne pêvajoyeke nû ye, 20 sal in ku ev tişt dibin. Hêrsa ku ji demeke dirêj ve di hundir de kom bû ye, niha diteqe. Weke volkanekî ku di hundirê xwe de bikele û piştre biteqe. Ev ne bi tenê li dijî Kurda ye. Di nava civaka Tirk bixwe de ye û tirsa ji demokratîkbûnê ye. Gavên ku di dema dawî de, li ser riya Yekîtiya Ewrûpa têne avêtin, dengeya civakê xerab kirine. Piştî vê tevlîheviyê, wê li Tirkiyê her tişt li cihê xwe rûne. Bê guman ev hinekî zehmete, ji ber ku sîstema Tirkiyê sîstemeke hişk e. Guhertinên ku li Îraqê çêbûne, bandoreke mezin li civaka Tirkiyê kirine, lê ev yek bi awayekî vekirî nayê axaftin. Ji dewletê re her demê hinek senaryo lazim in. Tirsa civakê bi meseleya Kerkûkê û ewlekariya xwe zêde kirin. Li hemberî van pirsgirêkan, zeîfiya Kurdan ew e ku tevgera siyasî li Bakurê Kurdistanê, di destê PKK de maye. Ev 5-6 sal e ku Kurdan dest bi siyaseteke nû kiriye, lê gotinên wan ne li gora dilê hemwelatiyên vî welatî ne. Ev hêzên Kurdî, xîtabî gel nakin,ew xîtabî dewlet, hikûmet û eskeran dikin. Jixwe hêza ku hêrsa civakê bilind dike esker in. Hikûmet di tengasiyê de ye. Hem di siyaseta derve û hem jî di siyaseta hundir de, di tengasiyê de ye. Ji ber vê yekê hikûmet li beramberî van provakasyonan hinekî bêdeng ma. Niha di dema dawî de, diyar dibe ku haya hikûmetê ji van provakasyonan heye. Jixwe li Tirkiyê gotina „Dewleta Kur" êdî di ferhengên wan de jî cî digre. Lê „Dewleta Kur" ne bi tenê esker in.

*** *** ***

Muhsîn Kizilkaya(Nivîskar):

Mirov dikare bûyerên ku li Tirkiyê diqewimin, bi gelek awayên cuda şîrove bike. Pêwîste mirov başî û nebaşiyan jî bibîne. Tirkiyê kakilê xwe diguherîne. Pêvajoya yekîtiya Ewrûpa destpê kir, hinek zagon hatin guhertin, pirsa Kurdî bû pirseke vekirî, kelemên li pêşiya zimanê Kurdî hatin rakirin. Van guhertinan nerazîbûnek di nava civaka Tirk de çêkir. Heger mirov bi çavekî siyasî li meselê binere, mirov dikare vê yekê weke krîza naskirina nasnameya Kurdan jî bibîne. Lê heger mirov bi çavekî negatîv li meselê binere, mirov dikare bibêje ku Tirkiyê li salên derbasbûyî vedigere. Lê ez bixwe bi çavekî wisa negatîv li bûyeran nanerim. Li gora nerîna min ev welat li salên derbasbûyî venagere, lê ew kakilê xwe diguhere. Di dema herî germ ya şerê PKK û dewletê de, di Kongreya HADEPê de ala Tirkiyê hat daxistin, lê wê demê milet daneket kolanan û bûyer hevqasî mezin nekir. Sedem jî ew bû ku civakê hinekî baweriya xwe bi biratiya Kurd û Tirkan anî bû û bawer nedikir ku Kurd di wî şerî de biser kevin. Lê belê ew îro dibînin ku şerê di qada siyasî de, ji aliyê Kurdan ve hatiye qezenc kirin ji ber vê yekê nerazîbûnê nîşan didin. Ev tiştekî normal e û di nava hemû civakan de çêdibe. Pêwîste mirov vê nerazîbûna ku di dema şerê germ de nehatibû nîşandan û niha diteqe bi xwîneke sar şîrove bike û nebêje „eman em perçe dibin, şerê navxweyî çêdibe, wê însan hev dû bikujin". Bê guman divê mirov hesabê her tiştî bike, lê lazime mirov ne xwîngerm be.

Medenî Ayhan (Parêzer):

Dewleta Tirk li ser bingeha faşîzmê ava bûye. Di bingeha netewayetiya Tirkan de Ittihat-Terakki heye û kemalîzm jî berdewamiya wê ye. Kemalîzm bixwe faşîzm e. Li Tirkiyê dema ku mesele tê ser Kurdan, komunîst, sosyalîst, çepgir û oldarên wan tev dibin nijadperest. Navê nijadperestiya xwe jî dikin "parastina welat". Qibris bi qasî taxeke Nisêbînê ye, kirine dewlet û dixwazin ku herkes qebûl bike. Ma ev ne nijadperestî be, çi ye? Di bûyera ala Tirkan de jî ev yek diyar bû. Ala xwe xistin nav destê du zarokan, bi wan dan qetandin û piştre qiyamet rakirin. Li Trabzonê êrîşî mirovan kirin û xwestin wan birecimînin. 2 hezar mirovan êrîşî 4-5 kesan kirin. Ew 2 hezar kes ji ber xwe ve li hev kom nebûne, hinek li pişta wan hene. Di bûyera birîndarkirina min de jî ew hêz hebû. Tirkiyê di van salên dawî de, cînayetên xwe hinekî kêm kiribûn, lê diyare ew niha Kurdan bê taqet dibîne û dixwaze careke din li şêweya berê vegere. Dewleta Tirk dewleta kontrgerîla ye. Dewleta ku kontrgerîla di nav de hebe, dewleteke terorîst e. Min ev yek ji dadgêr (sawcî) re jî got. Bi dîtina min Tirkiyê dixwaze careke din dest bi cînayetan bike. Ez niha yê dawî me, lê dibe ku ez di vê pêvajoya nû de bibim yê yekemîn jî. Lê ez dixwazim bibêjim ku artêşek jî nikare îradeya min bişkîne û çavê min bitirsîne.

*** *** ***

Ihsan Aksoy (Rewşenbîr):

Di 22ê Adarê de, senaryoyeke mezin çêbû. Bi hezaran xelk daketin kolanan û Newroz pîroz kirin. Piştî nîvro, dema ku xelk li malên xwe vedigerin, mirovek –piştre diyar bû ku ew ji MHP ye- radihêje alekê, di ser serê beşdarên Newrozê re dihejîne û dibêje "ev ala me ye, emê tucarî nehêlin ku kesek bêhurmetiya wê bike" û xelkê provoke dike. Du zarokên biçûk jî radihêjin wê alê û davêjin erdê. Piştre daxuyanî hatin belav kirin û çapemeniyê mesele mezin kir. Diyar e ku bûyer ji berê ve hatiye amade kirin û armanca wan provakasyon e. Kurdan ev bûyer bi aqilekî selîm şîrove kirin û dengê xwe nekirin. Bûyera alê ev bû. Bi ya min êrîşa ku li hemberî Av.Medenî Ayhan hatiye pêkanîn, ne girêdayî vê bûyerê ye. Pêwîste mirov baş li ser wê bûyerê raweste. Ew demekê nêzîkî PKK bû, piştre ji wan cuda bû û li dijî wan pir gotin kirin. Ev bûyereke serbixwe ye. Niha li Tirkiyê bêdengiyek heye. Kurdan heta niha dengê xwe nekirine, lê heger pir pêde herin wê kaosek çêbibe ku Tirkiyê di bin de bimîne. Ev provakasyona mirovên li dijî demokrasiyê ye û ewê zêde dirêj nebe. Baroya parêzerên Izmîrê jî doz li Serokerkan vekiriye û dixwaze ew ji ber gotinên xwe were darizandin. Pirsgirêka nijadperestiyê ya Tirkan bixwe ye û divê ew li dij derkevin. Tu qisûra Kurdan tune ye.

Omer Axin(Rewşenbîr):

Vegera li salên 1990î ne hêsan e. Lê ev jî rastiyeke ku li Tirkiyê tansiyona civakê hinekî bilind bûye. Sedemên vê yekê pir in, Tirkiyê li hemberî guhertinan ketiye nava tengasiyeke mezin. Pirsgirêka betaliyê heye, pirsgirêkên jinan hene, pirsgirêkên ciwanan hene, pirsgirêka Kurdî heye û her wiha. Tirkiyê ji bo çareserkirina van pirsgirêkan gavên berbiçav jî navêje. Guhertinên ku li dinyayê çêdibin bandoreke mezin li Tirkiyê dikin lê Tirkiyê dûrî guherînê ye. Amerîka hatiye herêmê û roleke bi bandor dileyize. Ew dixwaze hemû sîstemên totalîter, paşverû û ne demokrat hilweşîne. Tirkiyê li hemberî vê guhertinê li ber xwe dide û naxwaze tevlê bibe. Pirsgirêka Kurdî li pêşberî demokratîkbûna Tirkiyê kelemeke mezin e. Lê ew naxwaze vê kelemê rake. Bê guman her kesê ku li Tirkiyê dijî ne bi vê siyasetê re ye. Lê ew çete û nijadperestên ku dibin navê "Dewleta Tarî" de tevdigerin, li hemberî guhertinê ne. Li Tirkiyê di nava dewletê de mirovên aqilselîm jî hene, kesên demokrat hene. Kurd jî ne weke berê ne. Divê mirov bêhnfereh be. Dengeyên li Tirkiyê destûrê nadin ku ev welat li salên berê vegere.

*** *** ***

Fehmî Demîr (Alîkarê Serokê Giştî yê HAK-PAR):

Em herkesê ku piştgiriya vê pêvajoyê dike û li hemberî êrîşan bêdeng dimîne, şermezar dikin.

Li Trabzonê recimkirina xwendevanên ku belavok belav dikirin şermezariyeke.Li şûna êrîşkaran ew ciwan hatine girtin. Ev nêzîkbûna dewletê, cesaretê dide kesên faşîst û nijadperest. Ev yek helwestek e li dijî demokrasî,mafên mirovan,azadiya ramanî û rêxistinî. Em hêvî dikin ku ev şaşî werin serrastkirin û sûcdar werin ceze kirin.

Em hêvî dikin ku raya giştî û tevayê mirovên aqilselîm li dijî vê kampanya antî-kurd, derkevin ku bi behaneya bûyera alê hatiye destpê kirin. Bela bûyerên Çorûm, Mereş û Sîwasê neyêne dûbare kirin.

*** *** ***

Hasan Kaya (Nivîskar):

Li başûrê Kurdistanê ji aliyê kurdan ve rewş ber başbûnê ve diçû, diçe û wisa dixuyê ku ewê biçe jî. Di Newrozê de gelê kurd guhê xwe neda polîtîkayên "komara demokratîk", "civaka ekolojîk" û hemû wan "lojîk"ên din. Kurdan bi munasebeta Newrozê; girêdan, hezkirin û daxwaza xwe ya bi maf û azadiya xwe re eşkere kir. Bi milyonan derketin qadên Newrozê, digel kincên neteweyî û hwd. Her çiqas bi sloganên vala û bê naverok, yên wekî "konfederalîzm"ê û bi hin alên nû ku gel bi xwe nizane ka wateya wan çi ye, hatibe xwestin ku berê gel ji dozê were zivirandin û hişê gel were tevlihevkirin jî; dewletê baş fam kir ku kurd êdî ne hemwelatiyên "baş" in. Ji ber van sedeman û hinek tengasiyan, dewleta piştperdê xwest pêleke şovenîst bi ser kurdan de biherikîne. Ewê niha çi bibe? Ger kurd ne amade bin, wê fizîkî gelek zererê bibînin. Mînak, li hin deverên ku çend malên kurd lê hene, wê êrîş zêde bibin. Belkî nîjadperest hinek kurdan bikujin û ziyanê bidin wan. Ev siyaseta nîjadperest ewê bibe sedemê hişyarbûnekê. Profesorek dibêje, "nîjadperestên tirk, ewê bibin sedemê dabeşkirina Tirkiyê".

*** *** ***

Li hemberî bilindbûna pêla nijadperest, 200 rewşenbîrên Tirk belavokek belav kirin û bang û tirsa xwe ya ji ber xurtbûna nijadperestiyê anîn ziman. Di nava van nivîskar, rojnamevan, hunermend û rewşenbîran de navên weke, ***Adalet Agaoglu, Can Dundar, M. Ali Birand, Aytaç Arman, Cengîz Çandar, Cuneyt Ulsever, Çetin Altan, Derya Sazak, Fikret Başkaya, Lale Mansur, Mujde Ar, Mehmet Altan, Murathan Mungan, Murat Belge, Meral Tamer, Neşe Duzel, Nadire Mater, Rifat Balli, Şanar Yurdatapan, Tarik Ziya Ekinci, Yavuz Onen, Yusuf Alataş û Zulfu Livanelli*** jî hene. Ev rewşenbîr tirsa xwe ya ji nijadperestiyê tînin ziman û dozê li dewletê dikin ku ew ferqê nexe navbera hemwelatiyan.

Parêzer Medenî Ayhan





Xebat û keftelefta Kurdan a bi sedê salan, êdî hêdî hêdî berhemên xwe didin û şevên tarî diçirînin. Bi hevkariya herdu hêzên sereke, **PDK û YNK**, ev berhem gihan konaxek bilind û hêviyên mezin li seranserê Kurdistanê reşandin. Bi van hêviyên mezin gelê Kurd bi giyan û rewanê netewî hişyar bû/dibe, û ev rewanê netewî wê di pêşerojê de wek xwînê di laş û bedena Kurdistana mezin de bighê hev.

Li Iraqê, bidestketinên Kurdan ruh û rewanê netewî gur û geş kirin, lê ji aliyê din de jî derba mirinê li Kemalîzmê û li helwestên Kemalîstên Kurd û Tirk xistin. Kurd û Tirkên Kemalîst di nava helwest û xewna Tirkkirin û çewisandina giyanê Kurdewarî de bûn. Wan bawer dikir ku ewê karibin Kurdan bi riya Kemalîzmê bihilînin, ji qalikê xwe derxin, wan bikin Tirk û pirsgirêka Kurd ji holê rakin. Lê serketina Kurdên Iraqê ev xewn û helwesta wan di qirika wan de hişt û bi derba mirinê sersem bûn. Ji ber êşa vê derba mirinê, Tirk û hevalbendên xwe di Newroza îsal de xwestin şewitandina ala Tirk bikin mahne da ku karibin vî giyanê Kurdewariyê vemrînin û neteweperestiya Tirk xurttir bikin. Lê ew jibîr dikin ku Kurd ne Kurdên berê ne, ew êdî xwe nasdikin û ewê her li Kurdewariya xwe xwedî derkevin, bi Kemalîzmê nexapin. Qewimandinên li Kurdistanê û Tirkiyê vekirî derxist holê ku êdî li Kurdistanê du rê mane. Kurdayetî û Kemalîzm. Kesên Kurdewar wê her li doza Kurd û Kurdistanê xwedî derkevin, û Kemalîst jî wê xulam û berdevkiya dewleta xwînmij berdewam bikin.

Serokkomariya ***Celal Talabanî*** ne tenê li Kurdistanê, lê herweha li temamê dinyayê jî deng da. Gellek rayedarên dewletan, sazî û partiyan peyamên pîrozkirinê ji ***Celal Talabanî*** re şandin û di kesayetiya wî de serketina gelê Kurd pîroz kirin.

Li herçar perçeyên Kurdistanê Kurd gelek kêfxweş, bextiyar û serbilind bûn. Kurdên derveyî welêt jî bi her derfetê kêfxweşî û serbilindiya xwe diyar kirin.

Partiyên kurdan, rêxistin û dezgehên çi hindur çi derveyî welêt, rêxistin û kesên ji her parçeyên Kurdistanê bi name, telefon û mailan, ***Celal Talabanî***, serokkomarê Cumhuriyeta Îraqa Federal pîroz kirin

George W. Bush (Serokkomarê Amerîkayê)

Bush, kêfxweş bû

Serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ***Georg Bush*** bi hilbijartina ***Celal Talabanî*** kêfxweşiya xwe anî zimên. ***Bush*** got *"hilbijartina Talabanî di riya demokrasiyê de gavek girîng e"*. ***Bush*** herweha got ku ew bi hilbijartina Talabanî pir kêfxweş bûne. ***Bush*** bi berdewamî got *"di pêvajoya ji dîktatorîiyê derbasbûna demokrasiyê de, li ber gelê, Iraqê karên mina nivîsandina makzagona Iraqê, perwerdekirina hêzên ewlekariyê, pêşkêşkirina xizmetên bingehîn û gellek karên din hene. Gelê Iraqê girêdana xwe ya bi demokrasiyê re nîşan da. Em bi hêvîne ku bi hikûmeta nû re bixebitin. Em div ê roja dîrokî de hemû gelên Iraqê pîroz dikin"*.

Ahmet Necdet Sezer (Serokkomarê Tirkiyê)

Kê çi got!

Serokkomarê Tirkiyê ***Ahmet Necdet Sezer***, bi nameyekê ***Celal Telebanî*** pîroz kir û got *"em serkeftinê ji bo we dixwazin; ew mewkiyê serokdewletiyê wê ji bo pêşeroja siyasiya Iraqê û yekitiya netewa Iraqê bibe xwedî rolek girîng. Di dema muwaqed û di pêvajoya hazirkirina qanûna bingehîn a Iraqê de, pir girînge ku heq û hiqûqa terefên ku ji nifûsa Iraqê pêk tên têkevin bin ewleyiyê, lihevkirinek li ser esasê demokrasiyek zelal û adil. Tirkiye ji bo serkeftina gelê Iraqê yê dost û ji bo pêşeroja Rêvebiriya Iraqê ya Muwaqet çi piştgirî û alîkarîi pêwîst be, wê bike"*.

Muhemed Xatemî (Serokkomarê Îslamiya Îran)

Xatemî serokkomariya ***„Celal Talbanî"*** pîroz kîr

Serokkomarê Îslamiya Îranê bi peyamekê hilbijartina ***„Celal Talbanî"*** ji bona Serokkomariya Iraqê, piroz kir.

„Muhemed Xatemî" Serokkomarê Îslamiya Îranê di peyama xwe de, destnîşan kir, ku xelkê Iraqê bi pişikdariya li hilbijartinên azad îsbat kirin ku ew dikarin bê midaxila biyaniyan çarenivîsa welatê xwe, kifş bikin.

„Xatemî" di berdewamiya peyama xwe de bal kişand ser zîzbûna qonaxa vê gava Iraqê û hêvî kir ku, xelkê Iraqê bi agahî û fersend, tifaq û yeketiya netewî, her wisa bi saya jîr û şarezatiya serokkomarê bijartiye xwe bikarin li nav aştî û ewlehiya Iraqek serbixwe de bighînin armancên xwe.

Her wisa ***„Muhemed Xatemî"*** ji bo ***„Celal Talabanî"*** hêviya serketinê xwest û got: *Îran amadeye hevkariya gel û dewleta Iraqê bike.*

Cengiz Çandar (Nivîskarê Tirk)

Nivîskarê Tirk ê navdar ***Cengiz Çandar*** ji bo hilbijartina ***Celal Talabanî*** dibêje:

Heger hilbijartina Talabanî baş bê pîvan wê ji bo Tirkiyê bibe awantajek mezin. Kurdan, li Iraqê nîşan dan ku u ew piştî Ereban grûba duyemîn in. Li Iraqê ji bo wekheviya navbera Kurd û Ereban rê vebû. Wê zimanê Kurdî bibe zimanê fermî yê duyemîn, ji ber vê ev bûyereke ku êdî wê Kurd doza dewletek serbixwe nekin, ji ber ku êdî dewletek wan heye, dewleta Iraqê. Talabanî Tirkiyê baş dinase, polîtîkvanekî jîr e. Heger Serokdewletbûna Talabanî baş bê pîvan, evê ji bo Tirkiyê awantajek mezin be.

Henry Barkey (perwedekarê zanîngeha Lehighê)

„Ji Talabanî çêtir nedibû"

Perwerdekarê Zanîngeha Lehighê Henry Barkey dibêje "Talabanî, wê hem Ewrûpa û hem jî Amerîka rihet bike. Ji vê çêtir nedibû. Îhtîmala dewletxwestina Kurdan kêm pir kêm bû. Iraqê, wê bi Serokatiya Talabanî di ser Tirkiyê re li Ewrûpa binere. Ew mirovekî pir nêzîkî Tirkiyê ye. Bêguman hemi pirsgirêk bi carekê çareser nabin. Talabanî û Barzanî civakên cuda temsîl dikin. Talabanî ji zû de dixwest ji Bakurê Iraqê derkeve, ewder jê re teng dihat. Îhtîmala dewletbûna Kurdan pir kêm bû. Ji Talabanî çêtir kesekî din nedibû".

Partî û Saziyên Kurd

Birêz Celal Talabanî
Serokkomarê Iraqê

Hilbijartina cenabê we, wek Serokkomarê Iraqê, encamek dîrokî û berhema yekîtiya navxweyî ya tevgera Kurdistanê ye. Ev, ji bo netewa Kurd û tevgera welatparêz û demokrata Kurdistanê bûyerek dîrokî ye. Di hilbijartina Iraqê de tevgera welatparêzên Kurdistanê, di meclîsa Iraqê de jî bû hêzek mezin. Di encama vê prosesê de gelê Kurd bûye hevbeşê dewleta Iraqê jî. Tevgera Kurdistanê van destkeftinan bi saya yekîtiya navxweyî bi dest xist. Hilbijartina cenabê we, di prosesa dewletbûnê de gavek dîrokî ye.

Di dîroka Kurdistanê de, piştî Serokkomariya Qazî Mihemed, cara yekemîne ku siyasetmedarekî Kurd mîna cenabê we, bi nasnameya xwe dibe Serokkomarê dewletekê. Ev serketina milletê Kurd û tevgera welatparêziya Kurdistanê, li cenabê we û li gelê Kurd û Kurdistanê pîroz be

PDK-BAKUR
Partiya Demokrata Kurdistan - Bakur

*** *** ***

Birêz Cenabê ***Mam Celal TELEBANÎ***

Serokê Komar a Federala Îraqê ,

Hilbijartina cenabê we, wek Serokê Komara Federal a Îraqê ji bo me şahî û bextewariyek bê hempa afirand. Ew li gelê Başurê Kurdistanê, li hemî gelên Îraqê û li hemî Kurdan pîroz be. Bi vê pêvajoya ku bi Serokatiya Cenabê we dest pêdike, pelê reş yê diroka Îraqê û heta yê Rojhelata Navîn tê tewandin, pelek nû, paqij û sipî tê vekirin . Pelê azadiyê, demoqrasiyê û wekhevîyê bi serokatiya we dest pêdike.

Ked û tekoşîna cenabê we, ji bo gelê Kurd, ji bo demokrasiyê û ji bo hemî gelên Îraqê encamên pîroz û laîq wergirtin. Em ji dil û can hêvî dikin ku hûn di hemî karên xwe de, serkefîî bin. Em bawer dikin ku Iraqa Federal bi serokatiya cenabê we, ji bo dewletên din yên herêmê dê bibe nimûneya demoqrasî, pirrengî û pirdengiyê.

Bijî Kurd û Kurdistan
Musa Kaval
Nunerê Hevbendiya Demoqratik a Kurdên Bakur.

*** *** ***

Birêz Celal Talabanî
Serokkomarê Îraqê

Wekî hemû Kurdên dinyayê em jî, bi hilbijartina we ya serokkomarê Iraqê kêfxweş û dilşa bûn. Bila ev gava pîroz, li we, li Yekitîya Niştimana Kurdistan, li gelê Başûrê Kurdistanê, li gelên Iraqê û herweha li miletê Kurd pîroz be. Bêşik, hilbijartina we di dîroka gelê Kurd da gavek dîrokî û encama têkoşîn û keda mi-



letê Kurd, yê Başûrê Kurdistanê ye. Herweha encama hevkarîya tevgera Başûrê Kurdistanê ye û di dîrokê de evê cîyekî birûmet bigre. Em hêvîdarin, ku ev gava dîrokî, di bergehek serketî û azadîyê de ji bona guhertina bextê bêyom yê miletê Kurd, dê bibe bingehek û destpêka rojek nuh.

Hilbijartina we, dê bibe hinceta bêtir naskirin û famkirina miletê Kurd û daxwazên wî yên demokratîk û neteweyî. Ev jî di têkoşîna azadîya miletê Kurd de konaxek gelek girîng e.

Birêz serokkomar,

carek din bila hilbijartina we, li we û li miletê Kurd pîroz be.

Serketina we daxwaz û hêvîya me ye.

Komela Dijberên Sûcên Şer Li Kurdistanê

Mahmut Kilinc

Serokê Komela Dijbertiya Sûçê

*** *** ***

Ji bo birêz,

Mam Celal Talabanî, Serokkomarê Iraq a Federal

Em, vê bûyera dîrokî li we, li gelê Kurdistan û li me bi tevayî, bi dil û

can pîroz dikin.

Serokkomarî ya we ya Iraq a Federal, ku bi nasnameya Kurde, di jîyana

neteweya Kurd de cara yekem e. Eva jî, ji bo seranserê Kurdistanê

destkeftîyeke hêjaye, parastin û pêşvexistina wê erkekî neteweyî ye.

Kurdistan hêjaye, gelê Kurdistan jî layiqî jîyanek bi rûmet, azad û

democrat e.

Serkeftina we ya me ye?

Bi silav û rêzên biratî û hevwelatî.

Partîya Rizgarîya Kurdistanê

PRK/Rizgarî

*** *** ***

Serokê Gîştî yê DEHAP'ê Tuncer Bakirhan, ji Celal Talabanî re peyama pîrozbahiyê şand. Bakirhan, di peyamê de wiha got: „Guherîna demokratîk a gelên azad ên Iraqê ku di vê asteya dîrokê de pêk anîne, mirov gelekî kêfxweş dike. Ez hêvî û bawer dikim ku pêvajoya demokrasiya li Iraqê, dê bi îrada azad û tercîhên demokratîk kûrtir bibe. Iraq dê bibe welatek ku di serî de pirsgirêka Kurd, her wiha hemû pirsgirêkên xwe çareser kiriye. Dê bibe welatek ku hemwelatiyên wê di nava aştiyê de dijîn û dê bibe welatek mînak a Rojhilata Navîn. Li ser navê partiya xwe û gelê xwe, we ji dil û can pîroz dikim û ji bo we serkeftin dixwazim.“

Dehap

*** *** ***

Ji bo birêz Mam Celal, Serekkomarê Iraq a Federal,

Me, wekî hemû gelê Kurdistanê hilbijartina we ji bo posta serekkomarîya Iraqê bihîst û em pê gellek kêfxweş bûn. Hilbijartina we ji bo vê posta sîyade, destkefteke dîrokîye ji bo hemû Kurdên welatevîn û dilsozên welêt. Ji ber ku di dîrokê de ev cara yekemîn e, Kurdek bi nasnameya xwe a Kurd ve dikare bi awayekî demokratîk bibe serekkomar.... Hilbijartina we ji bo vê postê li Rojhilata Navîn jî taybetmendîyek xwe heye. Ji ber ku, hûn yekemîn serekkomar in bi awayekî demokratîk hatin hilbijartin.. Ew welat û paytextên ku,Kurdistana me a şêrîn di navbera xwe de dabeşkirine, hertim wekî navendên tefir û tunekirina Kurdan karkirin.. Îro ev tirs nemaye.. Nûnerên rasteqîn ên gelê Kurd di postên sîyade ên vî welatî de cih digirin û rênadin dek û dolabên navnetewî û navceyî...

Di dawîyê de ,bi sedema hilbijartina we ji bo vê postê, em bi dil û can pîrozbayîya we û gelê Kurdistanê dikin û serkeftina we dixwazin...

Ligel rêz û silavên me, ên germ û şorşger....

Partîya Şoreş KAWA

Komîteya Navendî

*** *** ***

Bo Serokkomarê Iraqa Federal Celal Talabanî,

Serokkomara Hêja,

Hilbijartina yek jı tekoşer û serkirdeyeke Kurd ji bo Serokkomariya Iraqa Federal wekî dilê hemu Kurdan, dilê me jî şad kir.

Ez bi navê hemû endam û alîgîrên partiya xwe germtirin pîrozbayi û piştgiriya xwe pêşkêşî cenabê te dikim û piştrast im, ku hilbijartina cenabê te ji bo Serokkomarîyê, zêmina avakirina Iraqeka federal û demokrat e.

Bi hêviya saxî û serketinê...

Mesud Tek

Sekreterê Gîştî yê PSK

*** *** ***

Birêz Celal Talabanî

Serokkomarê Êraqa Federal

Helbijartina cenabê te, destpêka demek nûye ji bo Rojhilata Navîn û cîhanê.

Serfirazîyeke dîrokîye ji bo hemu Kurdan.

Berhema tekoşîneke muqaddes ya bi zanyarî û bi rêk û pêke.

Berhema yêkitîya hêzên Kurdistanî û hestên welatparêzîyê ye.

Şadbûna hemu şehîdên Kurd û Kurdistanê ye.

Serfirazîya Kurdan û dostên wan e.

Hîvîdarîn, bibe nimûneyek ji bo hemu parçeyên Kurdistanê.

Hîvîdarîn bibe bingeha desthilatîyên mezintirîn ji bo Kurdan û Kurdistanê.

Em ji dil û can cenabê te û ewên vê serkeftinê da pişikdar pîroz dikîn. Di

hemu kar û xebatên we da serkeftinê dixwazîn.09.04.2005

Bizava Bakurê Kurdistanê

Çapemeniya Biyanî

LE FİGARO

Tirkiyê, ji ***Talabanî*** paraztina yekîtiya Iraqê xwest

Rojnameya fransî **La Figaro**, dibêje ku *"Tirkiya ku ji daxwaza serxwebûna Kurdan paxav dikir, bi hilbijartina Talabanî kêfxweşiya xwe anî zimên û jê xwest ku yekîtiya Iraqê biparêze. Tirkiyê, ku hilbijartina birêz **Talabanî** bi kêfxweşî pêşewazî kir, guhertina polîtîka xwe ya di derbarê Kurdên Iraqê de teyîd kir. Guhertina vê polîtîkayê bêguman girêdayî hevalbendiya Kurdan û Amerîkayê ye".*

*** *** ***

FAZ

Tirkiyê bawere ku wê bi ***Talabanî*** yekîtiya Iraqê bê paraztin

Rojnameya Almanî **Frankfurter Allgemeine Zeitung** hilbijartina ***Talabanî*** nirxand û got *" ev pêşketin şansê yekîtiya erdên Iraqê zêdetir dike, Ankara jî di vê baweriyê de ye. Li gora Tirkiyê, bi Serokkomariya **Talabanî**, tirsa parçebûna Iraqê ya piştî Saddam wê ji holê rabe û yekîtiya erda Iraqê bê paraztin. Di peyama Tirkiyê de ev dixuye. Lê hîna gellek pirsgirêkên mezin li pêşiya welêt hene. Wek: Di makzagona nû de wê rola îslamê çibe?"*

*** *** ***

FOX NEWS

Têkiliyên Tirkiyê û Amerîka kare bandorek neyînî bibîne

Saziya weşanê ya Amerîkanî **FOX**, dibêje *" ji destpêka şer û heta niha di navbera Tirkiyê û Amerîkayê de sariyek heye. Lêkolîner dibêjin ku hîna zûye ku meriv bêje ka wê hilbijartina **Talabanî** di navbera Tirkiyê û Amerîkayê de çi bandorê bike. **Talabanî** berê gotibû ku çavê Kurdan di erdê Tirkiyê de tuneye. Lê Tirkiyê ji **Talabanî** bi şik e, ji ber ku sempatiya **Talabanî** ji bo teroristên Kurdên Tirkiyê heye, û ev jî tê maneya ku wê têkiliyên Tirkiyê û hikûmeta nû ya Iraqê bêîstîqrar be. Û ev têkilî çiqasî bêîstîqrar be, wê têkiliyên navbera Tirkiyê û Amerîkayê jî hewqasî zehmet bibe".*

*** *** ***

Washington Post

Talabanî serokek agresîv û kone ye

Rojnameya **Washington Post** gazetesi, di nirxandina ***Talabanî*** de dibêje *" **Talabanî** serokekî agresîv û di warê taktîkan de kone ye".* **WP** dibêje ku ***Talabanî*** hem li dijî artêşa ***Saddam*** û hem jî li dijî fraksiyonên Kurd tekoşîn daye, lê piştre bi van fraksiyonan re hêza xwe kiriye yek. **WP** bi berdewamî dibêje *"Îro,**Talabanî** bi gelemperî polîtîkvanekî tûj û nerm e, lê **Talabanî** gotiye ku ewê tucarî qebûlneke ku Iraqê bibe dewletek îslamî. Ew Iraqek federal dixwaze."*

*** *** ***

The New York Times

Hilbijartina ***Talabanî*** wê tansiyonê bilind bike

Rojnameya **The New York Times**, dibêje ku *„**Talabanî** yekem Serokkomarekî Kurd e ku li welatekî Ereban tê hilbijartin. Lê bi hilbijartina wî re, di nav grûbên siyasiyên Iraqê de tevliheviyek mezin çêbûye û tansiyon bilind bûye".*

*** *** ***

FİNANCİAL TİMES

Soz da ku bi hemû grûban re bixebite.

Rojnameya **Financial Times**, dinirxîne ku *„**Talabanî** soz daye ku bi hemû grûbên etnîk re bixebite. Herweha* **FT** *dibêje Kurdan pozîsyona ku piştî hilnijartinê bidestxistine li dijî Şîîyan wek qoz bikaranîne da ku karibin xwestekên xwe bidest xin. Herweha Kurdan û Şîîyan helwestek mezin nîşan dane ku karibin nûnerên Sunniyan jî têxin nava hikûmetê".*

*** *** ***

The Washington Times

Tirkiyê bi ser ku ditirsiya piştgiriya ***Talabanî*** kir.

Rojnameya **The Washington Times**, dinirxîne ku *„Tirkiyê bi ser ku ji 12 milyon Kurdên nava xwe ditirsiya ku doza azadiyek berfirehtir bike, dîsa jî hilbijartina **Talabanî** bi kêfxweşî pêşewazî kiriye."* **WT** balê dikşîne ser gotinên ***Talabanî*** û dibêje *„**Talabanî** piştî hilbijartinê gotiye ku ewê ne tenê ji bo Kurdan herweha ji bo temamê Iraqiyan bixebite".*



www.arsiv.org

Divê Kurd krîterên welatparêziyê fireh bikin

Yaşar Gülen



Em li ser ruwê erdê endamên gelê herî mezin ê bê dewlet in. Bêguman, her kesekî Kurd di dilê xwe de valahiya evîna welêt hiştiye. Her kesekî Kurd bi êş bêriya serxwebûnê dike. Kurdê li meyxanê serxweş bûye, bi serê xweş bîranînên Bekaa dibilîne. Êşkence û çilekêşiya xwe. Gundiyê li gundê xwe paleyê dike tîne zimên hisreta azadiyê. Bajariyê li bajêr dijî xeyal dike rojekê li bajarê xwe nivîsa "bexteware yê ku dibê ez Tirk im!" nebîne. Zanîngehî xeyal dike rojekê di akademiyê de bi Kurdî dersê bibîne. Dersên profesorên Kurd guhdarî bike. Parêzer xeyal dike li gor makzagona Kurd, di dadgehê de berketiyên xwe bi Kurdî biparêze. Doktor xeyal dike nexweşê xwe bi Kurdî tedawî bike. Mamoste xeyal dike şagirtên xwe bi alfabeya Kurdî fêrî zimanê zikmakî bike. Şagirt xeyal dike her roj bi marşa Ey Reqîb dest bi dibistanê bike. Polîs xeyal dike li emniyetê sûcdaran bi Kurdî darizîne. Parsek xeyal dike bi Kurdî parsekiyê bike. Stranbêj xeyal dike di welatê xwe de bi zimanê xwe bistrê. Nivîskar xeyal dike bi zimanê xwe binivîse. Mele xeyal dike bi zimanê xwe waazan bide civata xwe. Feqe xeyal dike di medresa xwe de bi Kurdî ilmê Quranê hîn bibe.

Her Kurdek li gora xwe ji xwe re evînek Kurdayetiyê girtiye. Her Kurdekî di aliyekî dilê xwe de ji Kurdistanê re cîh hiştiye. Başe siyasetmedarên Kurd çiqasî di ferqa vê de ne? Li gor min qet ne di vê ferqê de ne. Carekê li rêbaza Partiyên me binerin, ez pêşniyazî we dikim. Konsepta siyasiya Kurd di ber çav re derbas kin. Hûnê bibînin ku tu rêxistinek me ku karibe hemû Kurdan, bi wekhevî, di nav manîfestoyek netewî de bicivîne, tuneye. Heger em azadiyê dixwazin, berî her tiştî divê em bihêlin ku hemû hêlên civakê bi xeyalên xwe re bijîn.

Divê em wêneyekî çêkin ku di vî wêneyî de ji hemû xeyalan reng hebin. Wî çaxî wê rizgariya Kurdistanê nêzîktir bibe. Wî çaxî emê karibin bi manîfestoyekê bi hevre bin. Wî çaxî ne karkirên me di sendîkayên Tirkan de tên hilandin, ne xwendevanên me di komelên Tirkan de, ne karmendên me di komelên karmendan de, ne çepên me di rêxistinên çepên Tirkan de, û ne jî dîndarên me di cemaatên Tirkan de. Ji ber ku hemû dixebitin ku me di nava xwe de bihelînin û me ji koka me bidûr bixin.

Hah, wî çaxî hewayek Kurdewarî pêk tê.

Û divê em, ji bo vê serê xwe bêşînin!

Ji ber ku riya azadiyê ji vê derbas dibe!

hemserim80@hotmail.com

HAK-PAR ji çareseriya Pirsa Kurd re federasyonê daxwaz dike

Riha - Partiya maf û Azadiyan (HAK-PAR) ji bo minaqeşekirina bername û destûra partiyê dest bi civînên xwe yên plankirî kir.

Civîna yekemîn di 26ê Edarê de li Mersînê, ya duwemîn ji di 27ê Edarê de li Urfayê pêk hat. Civîna Mersînê li Mis Hotelê çêbû. Civîn bi hilbijartina dîwanê dest pê kir, ji bo serokatiya Dîvanê Fehmi Demir hat hilbijartin. Axaftina vekirin a civînê ji aliye serokê HAK-PARê liqê Mersînê Maaz Bozyel hat kirin. Piştre Serokê HAK-PAR Abdulmelîk Firat qisê kir.

Civîna duwemîn li Urfayê çebû

Li pey civîna Mersinê di 27ê Edarê de li Urfa yê bi axaftina serokê HAK-PARê liqê Urfa Mehmet Taş civîna duwemîn pêk hat.

Di wan herdû civînan de serokê giştî yê HAK-PARê Abdulmelîk Firat, Bayram Bozyel, Hasan Dagtekîn, İhsan Erdem, Abdulmenaf Kıran, Mehmet Akyol, Reşit Deli, Ramazan Kandemir, Abdulselam Uğurlu, Fahri Saraçoğlu, Salih Özçelik, İbrahim Güçlü, İbrahim û Ali Doğruyol li ser rewşa dinyê, ya herêmê û ya Kurdistanê ditînên xwe anîn zimên. Piraniya axftaran bal kişandin ser rewşa nû ya herêmê, prosesa YE û bi taybetî destkevtiyên Kurdan ên Kurdistana Başûr.

Rêvabirên HAK-PARê anîn zimên ku pirsa Kurdî gihiştiye qonaxeke nû, ji ber wê ji divê HAK-PAR bi vekirî doza federasyonê bike û federasyonê bigre bernama xwe.

Civîn roja Înê, di 14ê Meha Gulanê, sehet di 10:00 de destpêdike û heta roja Duşemê piştî nîvro didome.

Peymanek zanyarî di navbera Köln û Koy de

PK/Düsseldorf - Di navbera instîtûta psîkologiya klînîk û dermankirina psîkologî "derûnî" ya grêdayî zanîngeha Köln ê û zanîngeha Koyê de li Kurdistanê, di roja cejna Newrozê de peymanek hevkarî hate pêkanîn. Di vê peymanê de tê pêşnûmekirin bihevguheztina kadirên zanyarî û nifşên nû ji zanyaran, bi taybetî di warê dermaniya psîkologî, û aciziyên derûnî yên trawmatîk(gabûsî), kar,xebat û derûnya saziyan de.

Dermanya derûnî di warê nexweşiyên laşî de li nik zarok û ciwanan, hem jî şêweyên dermanên xwezayî di warê rehetkirina nexweşiyên derûnî de.

Tê pilankirin ku zanîngeha Koyê beşa xeste-derûnî û dermankirina derûnî dê ligorî pîvanên Awrupî ava bike, ev gav jî wê bê piştgirtin.

Radeyên xwendinê ku liberçav têne dîtin evin (Bachelor, Master û Promotion)

Hem jî bihevguhestina lêkolînan di van waran de tê xwestin:

Derûnya gabûsî, dermanya derûnî, derûniya kar, xebat û saziyan

Û bjîşweriya psîkologî.

Wekî ku tê zanîn miletên Kurd di hemû diwerên jiyana xwe de gabûsekî komwerî jiyaye, bi taybet jî di dema dawî de ``w.m. Helebçe û Enfal'' bindestî, şerên bê rawestan hem jî kultûr û ola biyan ku bi darê zorê pê pejirandiye efsaneyeke ji nexweşiyên derûnî derxistiyê holê.

Berpirsyarê alyê Elmanî profesor Dr. Wolfgang Mathias e.

Polîsên Îranê êrîş birin ser Kurdên sivîl



Li gora agahdariyan, Kurdên Rojhilatê Kurdistanê ji bo pîrozkirina Serokkomariya Mam Celal daketin kolanan û şahiyên kêfxweşiyê pêkanîn. Hêzên Ewlekariya Îranê tehemula şahiyên Kurdan nekirine û bi ser pîrozbahiyên wan de girtine. Piştî hatina Hêzên Ewlekariyê şer derketiye û tê gotin ku bi dehan xwepêşander birîndar bûne û zarokeke 13 salî jî jiyana xwe ji dest daye. Di heman şerî de gelek polîsên Îranî birîndar bûne û nêzîkî 80 mirovên Kurd hatine girtin. Tê gotin ku endamekî îstîxbarata Îranê jî di şer de bi giranî birîndar bûye. Li gora nûçeyên Middle East Newsline pêşmergeyên Kurdistanê jî tevlî şer bûne, avahiyên polîs û eskeran girtine û ew bêçek kirine. Hêzên Ewlekariya Mehabadê ji neçarî alîkarî ji derve xwestin e. Gelek tirimbêl û avahiyên Hêzên Eskerî jî ji aliyê xwepêşanderan ve hatine xera kirin û şewitandin.

Bibe aboneya/ê Peyama Kurd

Nav / Paşnav: .....

Navnîşan: .....

USA, Kanada û Austuralya
6 mehan: 70, € - Salekê: 120, €

Almanya:
6 mehan: 50,00 €
Salekê: 70,00 €

Welatên Yekîtiya Ewropa
6 mehan: 60,00 €
Salekê: 90,00 €

Commerzbank Bonn
V. Efe/Peyama Kurd
Konto: 1007947
BLZ: 38040007

Konto:
V. Efe/Peyama Kurd
IBAN: DE38 3804 0007 0100 7947 00
BIC: COBADEFFXXX

Ji bo welatên din têkiliyê bi rojnameyê re deynin.
Peyama Kurd, Thomas-Mann-Str. 22, 53111 Bonn, Germany
Tel.: +49 (228) 18 00 654 - 18 00 655, Faks: +49 (228) 18 00 656
www.peyama-kurd.com, eMail: info@peyama-kurd.com

Donald Rumsfeld: „Serok Georg w. Bush û birêz Mesûd Barzanî wek hev difikirin.“



SELAHEDÎN (Kurdistan) — Wezîrê parastinê yê Amerîkayê Donald Rumsfeld hat Kurdistanê û li Selahedînê digel serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê Mesûd Barzanî kom bû, minaqeşeya pêşeroja Iraqê û Kurdistanê kir. Donald Rumsfeldî got „Kurdistan welatekî ji aliyê xwezayî ve hêşîn û ji aliyê aborî ve jî pêşketî ye.

Bêguman serdana Rumsfeld moral û payebilindiya Kurdan bilindtir kir û bi vê serdanê bi awayekî vekirî eşkere bû ku têkiliyên Kurd û Amerîkiyan wê ji bo pêşeroja Kurdistanê û Rojhilata Navîn li ser stûnên bingehîn dimeşin. Herweha bi serdana Rumsfeld, carek din pîj û şûjin di çavên dewletên cîran de rabûn û guman û şikên wan ên di derbarê avakirina Kurdistanek serbixwe de zêdetir û kûrtir bûn. Dewletên dagîrker baş dizanin ku helwest û daxwaza Mesûd barzanî ya ji bo avakirina dewletek serbixwe xurt û qewîn e. Ji ber vê, serdana Rumsfeld û pesinandina wî ya Kurd û Kurdistanê carek din xof û tirs xist dilê dagîrkerên Kurdistanê.

Mesûd Barzanî di preskonferansa hevbeş de got „Kurd bi serdana Donald Rumsfeldî kêfxweş in û hevpeymaniya Kurd û Amerîkiyan wek dema şerê li dijî Seddam Hisên berdewam e û Kurd wê xebatê ji bo Iraqek demokratîk, federal, pirpartî bikin û wê Kurd û Amerîkî şerê li dijî terorê jî bi hevre bimeşînin.

Donald Rumsfeld jî di preskonferansê de got “em spasiya gelê Kurd û serkirdayetiya wê ya siyasî dikin. Me silavên Serokê Amerîkayê George Bushî ji bo Mesûd Barzanî û gelê Kurd anîye“. Donald Rumsfeld bi berdewamî got ku vîzyona Mesûd Barzanî û George Bush wek heve û herdu jî bi heman awayî difikirin.

Mesûd Barzanî bi kêfxweşiyek qedirbilind, bi ala Kurdistanê û ala Amerîkayê pêşewazî li Donald Rumsfeld kir.

Hilweşandin û afirandin

Cemal BATUN



Salên berî 80yan tên bîra min...Li Kurdistanê bayek welatperwerî ya berz xwe li tevayiya welat belav kiribû. Kurdistanîbûn cîhê serbilindî û rêzê bû. Şoreşgerî di dilê xortên Kurdistanê de bicîh bû bû. Xebatek berkeftî û giran li gund, bajar û çiyayên Kurdistanê de pêl dabû...Bakurê Kurdistanê hêdî hêdî dibû navenda doza Kurd...Ev yek ji alî serdestên rasteqîn a dewleta Turkiye – Arteşa Turk ve hate dîtin û lempeya alarmê hate pêxistin. Dezgehên istihbaratî, leşkerî, çekdarî derbasî seferberiyê bûn...Di 12ê îlon a 1980yan de biryara destdanîna ser hukimet, parlemento û hemû dezgehên dewletî yên "siwîl" hate dan. 57 salan piştî damezrandina Komara Turkiye, Artêşa desthilatdar biryara hilweşandina wê demokrasiya seqet a Turkiye dîsa da. Zagonek bîngehîn a li ser bîngehek nîjadperestiyek tund hate danîn. Heta îro jî, qanunên wê yên hişk û paşverû û nîjadperest derbas dibin.

Artêşa Turkiye di tevayiya pêvajoya sedsala 20an de û niha di destpêka sedsala 21an de jî, wekî hêza serdest a rasteqîn li Turkiye, hemû bîngehên ku dikarin li ser demokrasî, aştî û pêşkeftina civatî ava bibin, ji kokê ve hilweşandiye. Ev yek ji bo civata Turk têrê nake, mixabin ji bo civata Kurd li Bakurê Kurdistanê jî derbasî jiyanê bû, bi taybetî jî piştî salên 1980yan.

Dibe ku ecêb bête dîtin, lê rastiyek e jî ku civata Kurd li Bakurê Kurdistanê karî li ser avahiya xwe ya civatî li ser piyan bimîne û strukturên dewletî yên Turkiye heta navbeyna salên 1980an jî nikarîn avahiya civatî ya Kurd hilweşînin. Piştî salên 1980yan li Bakurê Kurdistanê bi destê serdestên dewleta Turkiye ve, planên din derbasî jiyanê hatin kirin û bi destê Kurdan mala Kurdan hate destpêkirin ku bê xerakirin. Yekem armanca şerê gerillayên Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) bû; hilweşandina avahî û strukturên civatî yên Kurd. Ger îro handikapên mezin di hunandina xebatên kurdewerî yên neteweyî û civatî li Bakurê Kurdistanê tên jiyandin, sedemek mezin hilweşêna bîngehên civatî yên Kurd in. Ji bo vê jî, di destê yekem de niha li pêş me Kurdên Bakur erk ek giran: afirandina struktur û heta cîhekî hêviyên civatî yên Kurdên Bakur e.

Di vê babetê de, fersendek mezin ku ketî destê me de: serkeftina Başûrê Kurdistanê ye. Serkeftina Başûr, otomatîkî pêvajoya hilweşêna bîngehên civatî li Bakur dirawestê ne. Di vê çarçoweyê de xwedîderketin û parastina Başûrê Kurdistanê bi awayek zanyar girîngiyek xwe ya mezin heye.

Başûrê Kurdistanê di van sêzdeh salên dawî de pêlên welatparêziya Kurd carek din karî berz bike. Ger Şoreşa Îlon a mezin di sala 1961an de tesira xwe li hunandina doza Kurdewariyê li her çar perçeyên Kurdistanê kir, îro jî serkeftina Dewleta Federe ya Kurdistana Iraqê û destkeftiyên doza Kurd li navenda Iraqê bi xwe de-wekî nimuneya herî berçav hilbijartina Serokkomariyê ya Iraqê ya Sekreterê Giştî yê Yekîtiya Niştimanîya Kurdistanê Celal Talabani, wekî nasnameya xwe ya parêzgerê doza Kurd, tesira xwe li hemû perçeyên Kurdistanê û her kesê xwe wekî Kurd binav dike, kir.

Ez bawer im ku sedsala 21an dê bibe sedsala serkeftina doza Kurd. Dema hejîn û hilweşandina bîngehên civatî, avahiyên civatî, strukturên civatî yên Kurd qediya. Dem, dema afirandina wan bîngehan e; li hemû aliyên Kurdistanê... Afirandin a ku dê bibe bîngeha serfiraziya me. Xwedîderketin û parastina Başûrê Kurdistanê, rêya wê serfiraziyê dê nêzîktir bike....

„Kusî jî difirin” bû xwediyê xelateke din

PK - Filmê derhênerê Kurd Bahman Ghobadi yê bi navê “Kusî jî difirin ” li Kopenhagê di 16. Mihrîcana Natfilm ya Navnetewî de xelata „raya giştî“ wergirt.

Ghobadî di her filmê xwe de destê xwe datîne ser birîneke Kurdan û bala raya giştî dikişîne ser rewşa Kurdistanê. Mihrîcana Natfilm ya Navnetewî roja 17ê Nîsanê bi dawî bû. Di mihrîcanê de ji 46 welatên cuda 150 film bi hev re ketin pêşbaziyê. Natfilm, Mihrîcana herî balkêş ya Danîmarka ye. Di Mihrîcanê de filmê bi navê „li qada şer“ yê ku ji aliyê derhênerê Libnanî Danielle Arbid ve li ser şerê sivîl yê Bêrûtê hatiye kişandin jî „xelata jurî ya taybetî“ bi dest xwe ve anî.

STAR
GASTRONOMIE HANDEL
Tevi 300 celeb male xwe di xizmeta we deye!

DÖNER PRODUKTION
LEBENSMITTEL
VERPACKUNG
GETRÄNKE
GERÄTE
•HÄHN[EN]-DÖNER
•PUTE[N]-DÖNER
•MIX ([H]Ä[H]N-PUTEN)
•KALB[S]-DÖNER (VAKUUMVERPACKT)
• Penir • Thunfisch • Champignons • Schinken
• Salami • Paprika Streifen • geschälte Tomaten
• Pizza Sauce • Peperoni • Pizza Box • Pommes
• Alufolie • Essig • Salz
ABHOLMARKTPREIS
Öffnungszeit: 08:30 - 18:00 Uhr
€
Pizza Käse-Gouda (%48): 3,09
Thunfisch-Dose(2,65 gr.) LA PERLA: 4,49
Puma Feta Rot (20kg.- Netto 16 kg.): 39,99
Essig (10lt.-%5): 4,99
Salz (10kg.-Eimer): 5,50
Mayo Hamker-(10kg-Eimer): 11,99
Ketchup Hamker- (10kg.-Eimer): 11,49
Pommes (10 kg. Karton-4x 2,5 kg.): 6,99
Schinken (kg. Preis): 1,89
Putenschinken (kg. Preis): 4,49
Salami (kg. Preis): 4,19
€ Stück
Pizza Box: 20x20x3: 0,071
Pizza Box: 24x24x3: 0,083
Pizza Box: 28x28x3: 0,10
Pizza Box: 26x26x4,5: 0,10
Pizza Box: 28x28x4,5: 0,111
Hamburger Box: 0,03
Menüteller: 0,10
Alufolie (1500x30 cm): 4,75
Not: Yen ku male xwe bi xwe biven di %7 erzani heye!
•FIRMA STAR KALITE YE!
•FIRMA STAR ERZANIYE!
•FIRMA STAR QASI TELEFONEKE NEZI WE YE!
Adrese: Windelsbleicher Str. 180
33659 Bielefeld
Tel.: 0521/ 5227366-77
Fax: 0521/ 5227388
Mobil: 01797805900



Salar û Mîdya: Stêrkên muzîka kurdî yên pêşerojê

Sîrwan Hecî Berko
Rothenurg

Li welatên pêşketî, dê û bav ji dema zaroktiya zarokên xwe guh didin wan û behreyên wan, da ku bikaribin di warên behreyên xwe de encamine mezin û hêja bidin. Ji ber limiqatebûna dê û bavan, zarokên ku talentên wan zû têne naskirin, piştî ku mezin dibin, dibin stêrkên neteweyên xwe û ji welatên xwe re navdariyeke cîhanî tînin. Ew in ên ku civatên xwe bi pêş dixînin.

Salar (10) û xuşka wî Mîdya (13) salî du zarokên kurd in ku dê û bavê wan derfet dane wan ku behreya xwe pêk bînin û xwe di vî warî de bi pêş xînin. Ji destpêka sala 2004ê, herdu diçin dibistana muzîkê û xwe fêrî amûra kemanê dikin. Li wê derê, ew bi şêweyekî zanistî fêrî notên muzîkê dibin û roj bi roj lêdana wan a kemanê bi pêş dikeve. Serketina wan giha wê radeyê, ku di demek kurt de ew beşdarî gelek konsertên dibistanê bûn û herweha di Newroza îsal de, wan ahenga li bajarê Bremen ê elmanî bi sirûda "Ey Reqîb" û strana "Herne pêş" vekir.

Salar û Mîdya ji bajarê Amûdê li Kurdistana Suriyê ne. Ev dora 8,5 sal in ku ew ligel malbata xwe koçberî Elmanyayê bûne û li bajarê Rothenurg (Wümme) dijîn. Ligel ku wan mafê penaberiyê hîn bi dest nexistiye û rewşa wan a aborî ne zêde baş e, û herweha pereyên dibistana muzîkê ji bo herduyan pir giran in jî, lê dê û bavê wan giring dibînin, ku zarokên wan fêrî muzîkê bibin. Diya wan diyar dike, ku "em dixwazin sûdê ji hebûna xwe ya li vî welatê pêşketî werbigirin û derfetê bidin zarokên xwe, ku xwe fêrî muzîkê bikin, da ku bikaribin di pêşxistina muzîka kurdî de rolekê bilîzin."

Li ser pirsa çima wan amûra kemanê hilbijart, Mîdyaya fedyokî bi rûyekî bi ken dibêje, ku pêkanîna muzîkê li ser vê amûrê zehmet e, û ger mirov bikaribe fêrî wê bibe, amûrên din dê piştre hesan bin.

Herdu zarok ne tenê di muzîkê de serketî ne, ew herweha di dibistanên xwe de jî jêhatî ne. Mîdya di pola 6ê ya dibistana "Gymansium" de ye, ku di sîstema dibistanan a elmanî de baştirîn dibistan e. Birayê wê Salar di pola 4ê de ye û ew jî dê sala bê biçe heman dibistana xuşka xwe.

Ji ber Salar û Mîdya bi şêweyekî zanistî xwe fêrî muzîkê dikin, hêvî heye ku ew jî rojekê bibin stêrkên Kurdan û muzîka kurdî bigihînin asteke bilind, ku bikaribe di nav muzîka cîhanî de bibe xwedî rolek giring.

sirwan@amude.com

Mamosteyek austryayî ji dibistanê hate avêtin

Peyva "Kurdistan" li ser ewlekariya neteweya tirk xeter e !

Ji ber ku mamosteyekî ji Austryayê di dibistaneke austryayî li Stenbolê de di dersa xwe de peyva "Kurdistanê" got, ew ji dibistana „Sankt Georgs-Kolleg" a ya katolîk hate avêtin û nema dikare derasn bide. Mamosteyê zanyariyên sirûştê yê bi navê Dr. Gerhards Pîls ragihand kovara hefteyî "Profil" ku di gotina wê peyvê de mebesta wî ne siyasî bû.

STENBOL (APA/PK) - Mijara dersê elercî (hesasiyet) bû. Mamoste Dr. Gerhards Pils xwest berî salekê ji şagirtên xwe yên 16/17 salî re şirove bike, ku elercî bi qatên civakî ve girêdayî ne, ku bêtir mirovên xwedî rewşeke aborî ya xerab bi vê nexweşiyê dikevin. Wî bi henekî berdewam kir û got: "Probêlm dê tucarî ji kurê min re çênebin, ji ber ku ew berî demekê li Kurdistanê bû û li wir goşt xwar." Şagirtan heneka mamosteyê xwe fêm nekir. Pîls dibêje ku du şagirt rabûn ser xwe û bi dengekî bilind got: "Emê her kesê ku Kurdistanê dixwazin, bikujin." Pîls diyar dike ku herdu şagirt di dersên xwe de ne baş bûn. "Min yek ji şagirtan seqitand. Ji ber vê yekê bavê wî giliyê min kir."

Piştî vê bûyerê, ji aliyê şagirtan ve çalakiyên protestoyê pêk hatin. Dibistan neçar ma ku mamosteyê xwe ji bo demeke kurt ji dibistanê bavêje. Lê piştî bêhnvedana dawiya hefteyê, mamoste vegeriya dibistanê û karî berdewam dersan bide, lê ne di wê pola ku problêm tê de çêbû de. Piştre du komîsyon hatin dibistanê, pêşî yek ji encûmena dibistanan a Stenbolê, piştre yek ji Enqereyê. Pîls dibêje ku wî ji wan re şirove kir ku wî bi peyva Kurdistan nexwestibû tiştekî siyasî bibêje, lê wî ew tenê wekî "têgeheke coxrafî" bi kar anîbû. Wî berdewam kir û ji wan re got, ku ew wekî mamosteyê botanîk gelek caran diçû Kurdistana Tirkiyê û li wê derê ji aliyê leşkeran ve dihat rawestandin. Wan jê re şirove dikir, ku ji bo çûna wê herêmê erêkirin pêwîst e.



Mamoste Pîls dibêje ku havînê erêkirina wî ya kar jê hate kişandin. Herweha peymana xanima wî, ku di heman dibistanê de kar dike, dê piştî bidawîbûna wê di dawiya sala xwendinê de neyê dirêjkirin. Pîls eşkere dike ku ew fêm nake bê çima ew nema dikare dersan bide. Ew dibêje: "Di zagonên kar ên tirkî de, tenê paragrafeke giştî heye. Li gorî wê divê erêkirina kar ji kesên biyanî bête kişandin, ger ew ji bo adetên welat, ewlekariya neteweyî û herweha tenduristiyê xeterek bin."

Dîrektorê dibistanê Franz Kangler dibêje ku "ji bo Tirkiyê peyva Kurdistan li dijî yekîtiya welatî ye". Li gorî wî, "ev mijarek hesas e", ku Tirk bi wê şerê li dijî PKK û kesên ku hatine kuştin, girêdidin. Kangler diyar dike, ku "mamosteyên me divê hesas bin". Ew mamoste Pîls rexne dike û dibêje ku "ev hest li cem wî peyda nabe". Dîrektorê dibistanê dibîne, ku vê bûyerê "ziyan gihand dibistanê".

Lê dîsa ew û mamoste Pîls hewil didin ku erêkirina kar dirêj bikin. Wezareta Perwerdeyê, balyozxaneya Austrya li Tirkiyê û herweha Wezareta Derve hatine agahdarkirin. Pîls dibêje ku Wezareta Derve jê re parêzerek peyda kir û di heman demê de jê xwest ku li dijî dezgehên tirkî ti dozê veneke. Kangler dibêje ku "hemû tişt fêde nekir." Mamoste niha hewil dide ku ji xwe re kar li ciyekî dî peyda bike. Ew nikare vegere bajarê xwe Lînz li Austryayê. Wî xaniyê xwe ji bo du salan daye bi kirê. Malbata ku xaniyê wî kirê kiriye, tirk e. (SHB)

Divê Tirkiyê Cîgirê Serokê Perlemana Ewrûpa, Hannes Swoboda jî ji kar biavêje

Cîgirê Serokê Perlemana Ewrûpayê Hannes Swoboda, di derbarê mamosteyê Avûstûryayî yê ku li Stenbolê ji ber gotina Kurdistanê ji kar hatibû avêtin, daxuyaniyek da û got ku ewê vê yekê qebûl nekin û ewê bûyerê bişopînin. Swoboda da zanîn ku ew bixwe jî gotina Kurdistanê ji bo wê erdnîgariya ku Kurd li ser dijîn, bikar tîne.

Cîgirê Serokê Perlemana Ewrûpa Swoboda diyar kir ku ewê xwedî li mamosteyê biyolojî yê Koleja Saint-George ya Avûsturya Gerhard Pils derkevin û ew vê yekê qebûl nakin.

Swoboda dibêje, „çawa ku li Fransa ji bo herêma Alsasiyan dibêjin Alsas, ji bo herêma Brotonan dibêjin Brotonya, mirov dikare ji bo wê herêma ku Kurd bi hezarê salan li ser dijîn jî bibêje Kurdistan. Ger hinek naxwazin fêrî vê gotinê bibin, ew pirsgirêka wan bixwe ye.



Serokê Weqfa Çanda Kurdî li Stockholmê Salih Ince

Me di unîwersîteyên welatê xwe de berê xwe daye ser avakirina Kurdolojîyên fermî

Kitêbên ku me çap û belav kir, dighê destê 130 hezar kesî. Ger baş jê îstîfade bê kirin, dê feydeke mezin bide miletê Kurd

Peyama Kurd: ***We ji bo zarok û ciwanên Kurdan li Tirkiyê û Kurdistana Bakur projeyek çapkirin û belavkirina pirtukên Kurdî pêk anî. Tu dikarî ji bo me behsa wê projeyê biki? Ew fikir çawa derket? Proje çawa pêk hat?***

Salîh Ince: Li welatê me fenomenek bi du rengî heye. Li dora 4 hezar gundên me hatin vala kirin. Kurd perperîşan ji axa xwe hatin dûr xistin, ketin bin penca jîyaneke dijwar. Helbet ev yeka gelek nexweşî û problem peyde kir an problemên heyî zêde kir. Sosyal dejenerasyon gelek zêde bû. Eger em Dîyarbekir weke nimûne derxin pêş, tabloyek xerîb çêbûye. Nifûsa bajêr ji salên 80 yî virde 5 car mezintir bûye. Bajarvanî û gundîtî bi nav hev ketîye. Hem pêşketin û hem başketin heye.

Kurdayetî jî li ser vê bingehê rûniştîye: Bê tirs e, mîlîtan e, lê di gerînoka civata paşdemayî de sîyaset dike. Gundî, hem ji dinya xwe ya berê ya piçûk û teng derketine, û bi dinyake nû binas bûne. Lê her wisa asîmîlasyonek xurt ketîye nava civatê. Zêdetir jî zarok û taybetî jî yên piçûk, bê ziman mezin dibin. Her çi îro rehetîyek nisbî di nava civatê de hebe jî, tu qewet niha nikare li hember vê asîmîlasyonê bibe bend. Yan divê sîyasî guhertinên ciddî çêbin, zimanê Kurdî bibe xwedî statu, ku xilasî li wir e, yan jî ta guhertînên sîyasî pêk bên, xwendin û nivîsandina Kurdî bête teşwîk kirin. Ji bo ku teşwîq bikî, divê ziman hêsan bikî.

Kitêbên ku me derxistin, xwendin û nivîsandinê teşwîk dike, ji ber ku bi rismên pedegojîk hatine neqş kirin. Lê em bawerin, kesên mezin jî dê jê hez bikin, ji ber ku kitêb hêsanin hinên wan çîrokên civata men in. Dê û bav wan çîrokan bi wan zanin.

Kitêbên ku me çap û belav kirin, dighê destê 130 hezar kesî. Ger baş jê îstîfade bê kirin, dê feydeke mezin bide miletê Kurd.

Elaqa dewleta Tirk û masmedya Tirkiyê çawa bû?

Weke tê zanîn, berê kitêb bêne hazir kirin li Tirkîyê hêzên nîjadperest welweleyek geş kirin ku pêşketina Kurdayetî geş nebe. Dewleta Swêdê bi xebata separatîstî hat îtham kirin.Bi kurtî, hicûmek hov û negatîv hat ser projeyê. Bi vî avayî xwestin cesareta gavên demokratîk bişkînin. Lê proje meşîya. Kitêb jî bê problem belav bûn û hê jî gav bi gav belav dibin.

Piştî ku kitêb belav bûn, ger mirov bala xwe bidê xeber zêdetir informatîf in. Êrîş kêm in. CNN Turk du car roportaj çêkirin. NTV jî. Sabah xeberek hêja û dirêj belav kir. Li Dîyarbekirê Televîzyon û rojnameyên herêmî xeber çêkirin. Di belavkirinê de hikûmetê asteng dernexist û wisa dixuye ku tedbîrên xwe jî kiribûn ku problem dernekevin.

Weqf çawa hat damezirandin? Çima ne enstitu? Weqf?

Weqfa Kurdî ya Kulturî li Stockholmê, fermî di sala 1996 an de hat damezirandin. Hîmdarên Weqfê 8 kesin û hemû Kurd in. Weqf, bi sermayek 200 hezar kronên hîmdaran ve hat damezrandin.

Armanca weqfê, pêşxistina kultur û zimanê Kurd e.

Lê rastî, destpêkê armanca me damezrandina institutek Kurdî bû. Xebatek dirêj jî hat kirin. Gelek însan angaje bûn û semayeke baş jî dicivîya. Lê bi saya hin "xêrnexwazên" Kurdan, dubendî û qelsî ket nava xebatê û hîmdaran. Lê kirinên me û intututek Kurdî nejihev zêde dûr e.

Di komîta me ya îdarî de 9 kes henin û 2 yên wan cîgir in. Di salên derbasbûyî de,di komîtê de artîstên navdar û hin mebûsên Swêdî jî cîh girtin. Lê îro bi temamî Kurd in.

Tu dikarî behsa xebata weqfê biki?

Xebata weqfê heta îro, bi giranî ji bo xizmeta zimanê Kurdî hatîye kirin.. Ne ku weqf bi xwe li ser ziman xebitiye.

Kar û barên me bi kurtî ev in:

Pêşangehên fotografan ku Kurd û jîyana wan nîşan didin. Taybetî jî fotografên Ann Eriksson.bûn. Pêşangeh di kutubxaneyên Swêdê de hatin çêkirin.

Bi armanca ku di mekteban de zarokên Kurd bi kar bînin , cd+rom, interaktiv hat hazir kirin. Heqê frotinê ya NEFEL ê ye û ez bawerim hê jî tên frotin. Proje bi alîkariya Yekîtîya Ewrûpa û Dezgeha Perwerdeyîya fermî ya Swêdê hat hazir kirin.

Piroja me ya herî giran û zehmet, perwerdekirina xortên Kurdan di Unîwersîteya Uppsala yê de bû. Sê salan ev kara berdewam bû. 30 xortên Kurdan li Swêdê Kurdî xwendin û vegerîyan welatê xwe ku di xizmeta Kurdî de bin. Hem mesrefên wê, hem jî pêkanînên wê gelek zehmet bû. Serketina me, bala Swêdîyan jî kişand û bawerîya wan bi weqfê gelek xurt bû. Li ser van xebatan di massmediayê de gelek roportaj hatin çêkirin. Vana bûn sebeb ku proja pirtûkên zarokan hat qebûl kirin.Dezgeha SIDA alîkarî da weqfê.

Proja me ya perwerdeyî di Unîwersîteya Uppsalayê de dawî hat, ji ber du sedeman: Yek jê ew e ku, projeyeke giran û bi mesref bû. Îmkana me ku xwe bidin ber wê û dûr û dirêj bidomînin tune ye. Proja perwerdeyî di demeke wisa de pêk hat ku, ne tenê feyde gîhand zimanê Kurdî, û pirestîj dayê, lê her wisa sîyaseta nijanperestîyê jî bi xurtî îfşa bû. Alîkarîya ku ji bo perwerdeyîyê me girt ji hin dezgehan û ji şexsan hatin . Hem Kurd û hem Swêdî destê xwe dirêjî me kirin. Lê gelek bi xebat û bi sebat proje bi serket.

Mixabin di Kurda de dezgehbuyîn ewqas ne adete, yên heyî zû xiradibin, jiyana wan pir najo. Ji bo ku weqfa we jîyandirêj be çi planên we hene?

Bersiva pirsa we ya, wê dezgeh û sazendeyên Kurdî çawa payîdar bin, çawa bakî bin ne hêsan e. Bindestî problema herî giran e. Sermayedarên Kurdan xwe naxin binê barên wisa. Her wisa civata me gelek paşde maye. Li dervayî welêt îmkan zêdetir e. Zordestî tune, civatên em lê dijîn pêşketîne. Lê daxewa, Kurd li derve van îmkanan baş bikar naînin. Xebata ziman,ilm û dezgeh jî xwe ji perçebûna sîyasî neparastîye.Ji bo wê jî, her çiqas gelek kes li derdora dezgehan hebin jî, însan bi mêranî û fedakarî xwe bidin ber kar jî, ji gerîneka sîyasî nikarin derkevin. Em dibînin, hin dezgeh henin ku sîyasî ne û emirdirêjin. Sebeb jî ewe ku di paş wan de xebatên gelek zêde û giran henin lê xebata wan ne rasyonel in. Ez bawerim ev pirsana hewceyê munaqeşê ye, lazime mirov, di bin sernameya SAZENDE de civîn û konferansan çêbikin.

Projeyên wê yên dahatî çi ne?

Ji vir û wê de me berê xwe daye ser di unîwersîteyên welatê me de avakirina Kurdolojîyên fermî. Ev karana bi me naqedin, lê tiştên ku em jî bikin henin. Em îro bi tundî serê xwe bi wî tiştî diêşînin. Em hêvîdarin ku rewşa sîyasî ber bi wê ve biguhirin alîkarê xebatên wek wê bin.

Hevpeyvîn: Seyîdxan Kurij



Salih Ince kî ye?

Di 1951 an de li Dîyarbekirê, li qeza Pasûrê(Qulp) hatiye dinê. Di 1969 an de zaningeha mamosteyî xilas kir û li derdora Dîyarbekirê mamosteyî kir. Di sala 1974 an de hat Swêdê . Di sala 1982 an de bû serokê Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê. Di derxistina çend kovarên Kurdî de aktîf kar kir. Salih Ince 9 salin serokê Weqfa Kurdî ya Kulturî li Stockholmê ye.

Têgeha azadîyê û azadîya jinkê -II-

Dewleta Elî

Gelek cara pirsa hindê tête kirin û nexasme ji layê zelama ve, ka boçî jinik ya bindeste û chi bizava naket da azad bibît, ev pirse wesa têne kirin, her wek em yê di meydana şerî da, ne di meydana jiyanê û hevpişkîyê da, yan jî wek tranepêkirin bi jinkê û shiyanêt wê. Dema mirov li meydana şerî û hevrikiyê bît, ya fer ewe berî ku hîtafa vedet, bizanît çi dibêjît, egerêt wî şerî bizanît, bi zanîn û siyaset rêka xwe veket, her wesa di şerê jiyanê da, zanînê û waqi'îyet baştirîn çeke bo şirovekirna binasêt wî, lewra divêt em jî li nik van pirsa rawestîn û bêjîn: kî ye jinkê bindest diket?. Wek em dizanîn, jiyan hevpişkîye di navbera zelmî û jinkê da, û wek me di pişka êkê da behis jê kirî, ku zelam xudanê emir û nehya ye, eve jî tiblêt gunnehbarîyê dirêj dikete zelamî û wesa xuya diket, ku jinik bara pêtir ji layê zelamî ve tête bindestkirin û bi rêka hinek ,uzrêt olî û civakî. Ez ne digel zelamî me dijî jinkê, ne jî desta ji daxaza azadîya jinkê berdidem, bi tenê min divêt binasêt serdestîya zelamî bo jinkê şirove bikem û ,uzra wî diyar bikem, lê pa di gel hindê jî, ev çende wî mafî nadete zelamî ku jinkê bindest biket..

Dema mirov yê bindest bît, nikarît azadîyê pêşkêşî kesekê di biket, zelamê Kurd jî, wek zelamekê rojhelat û wek Kurd, girtîyê gelek bandûra bû, êk: siyasî, ji layê rijêma ve, çi bi rengekê taybet ba, çi jî bi gîştî di gel milletê xwe, gelek nexweşî dîtîne û gelek serbor biserda borîne, berpirsîya wî ya mezin beramber mala wî û nexasme namûsa wî (xwîşkê, daykê, kiçê, jinê), gelek cara ew neçar kirîye ku serdestîyê biket da ku wan biparêzît, her çende hinek cara e n - camêt ne qènc di bûne verêja vê çendê, lê pa di wan barudûxa da, chi rêkêt baştir



nebûn, her dem tirsa girtinê û kuştinê û revê di dilî da bu, hizir û bîrêt wî her dem di belav û alûz û şêlwî bûn, wî bi xwe chi serbestî û azadî nebû, evca çawa da karît azadîyê dete jinkê, da chawa dîmuqratîyetê bikar înît û ew yê dinav sistemeka diktatûr da dijît. Welatê bindest nikarît dîmuqratîyetê bikar bînît, her dema ku welat azad bû, dê civak jî azad bît û dê mal jî azad bît, û bi vî rengî dê jinik jî azad bît, lewra jî her çende bi nisbeta azadbûna jinkê dîmuqratîyet pêtivîye, lê pa ev dîmuqratîyete ya bi azadîya milletî ve girêdaye. Anku bi nisbeta welata azadî dayka dîmuqratîyetê ye, eve ji layê siyasî ve bû. Bandûrek din heye ew jî: ol û civak in, her çende milletê Kurd pêtir ji gelek milletên din, rêza jinkê girtîye û bihayê wê zanîye û azadî dayê, lê pa hemî cara, zelam hatîye neçar kirin ku jinkê bindest biket û bizavêt wê bi rêka, eve helale, eve herame û eve şerme, qeyd biket, û hemî car em dikarîn ,uzrekê bo zelamî wergirîn , em dikarîn bêjîn,eve ne gunneha wî ye, lê yê li ser vî tiştî hatîye taşandin. Zelam û jinikên Kurd, ji zarokatîya xwe li ser qalibekî hatîne kopî kirin, her yekî ji wan rolê xwe di jiyanê da wergirtîye û jiber kirîye, herdu cihê dilpêvebûnê ne, zelam, ji ber ku yê hatîye girêdan bi hêza zelamînîya xwe ve, û jinik bi lawazî û bêhewlîya xwe ve. Eger em binêrîne kesatîya jink û zelamêt rojhelat bi gîştî û yêt Kurd bi taybet, ji nwî dê zanîn ka çend ferq û cudahî di taşandina jinik û zelama da hatîye kirin, ji nwî dê hest bi kêmasîyê û gunnehê keyn di rasta wan da, me zelam-yê kirîye xudê yê hêz û şiyana, û her dem me bi nizmî li jinkê nêrîye, kêmtir bawerîya dayê, lewra şiyanêt wê kêmtirin û hosa bawerîya wê jî bi xwe û şiyanêt xwe kêmtire, dirwîyê hindê yê liser hatî çêkirin, ku ya lawaze û her dem ya pêtivî harîkarîya zelamî ye, lewra zelam jî bi çavê kêmasîyê lê dinêrît û perêt wî qij dibin û delîve bo heldikevît ku wê bindest biket, her wesa û her wek me di babetê namûsê da behis kirî, ku têgeha zelamî ya xelet bo azadîyê, nahêlît jinik azad bibît. Eve hinek bûn ji binasêt bindestkirna jinkê. Hejî gutinê ye ku, her chende jinik ya bindeste, lê pa gelek cara zelam pêtir xatira mirovî dişkênît û dibîte cihê dilpêvebûnê, ji ber eger jinik carekê ya bindest bît, zelam dehcarkî yê bindeste!.

Bo çaresekirna vê piroblêmê,ya baç ewe, çi jin bît çi zelam, berî her tiştî, daxazkirna azadîyê di çarçûvê dijatîyê û hevrikîya hevdu da, ji hizra xwe pavêjin, diblomasîyetê bikar bînin, guhrîna bêxine di jiyana xwe da, , dem demê zanîn û pêşkeftinê ye, bila jinik bo zelamî diyar biket ku ew yê xelete di hizra xweda beranberî jinkê, harîkarîya hevdu biken, hewcey diruşmêt vala nîne, milletê me niha yê azade, evca dê karîn bi sanahî dîmuqratîyetê bi kar înîn, da ku jinika Kurd jî azad bibît, û ya fer ewe, da pişikdarîyê di pêşkeftina milletî da biket.

Rav û Nêçîra Kewa -I-

Mahîr Berwarî



Kew, balindekî koviye, dema bi mezinî bigirin kedî nabin, dema biçûkbin, berî şiyana firînê hebit ko dibêjnê têjkewk, bigirin di malê de bi sanahî kedî dibin. Kew bi kedîbûnê, dengxweşiyê (qebqeba wan) û goştxweşiyê navdarin. Goştê wan gelek bi tam û bi lezzet e û ji bo ciwaniyê jî tu kêmatî lê nînin. Tiştê herî balkêş li cem kewan eve, ku hevrikiya hev dikin, şerê hev dikin, ji loma jî Kurd dibêjin "Kew dijminê serê xwe ye yan kew dijminê qewmê xwe ye". Gelek caran Kurd xwe wekî kewan hisab dikin. Ji ber lihevnekirin û bi dijminên Kurdan re karkirin, rûdana şerê birakujiyê ku hêvî û armancên Kurdan têk didet.

Girtina kewa çend armanc jê hene:

1. Ji bo xwarinê **2.** ji bo xwedîkirinê, ciwanî û sebr ê. **3.** Ji bo ravpêkirinê û pê girtina kewa. **4.** Ji bo pevçûna kewa, şer pê kirin.

Li gelek bajarên Kurdistanê meydanên kewa hene, ko nêçîrvan kewên xwe dibin wêrê û kewên xwe lêkdixin, we kewên ne- revin ê wêrek bin, ji y ê n din jîrektirbin, zor cara di ser re para diden xudanên wan.Ji layê girî, xurtî û rengan ve kewên deverekê ji yên din cuda ne. Kewên hinde devera mezinin lê xurt nînin, hindek risasîne. Lê ji bo xurtbûnê kewên devera Şingalê nimre yek in. Paşê kewên devera Sindiya tê. li Kurdistanê piraniya kewan hene. Li deverên çiya û nîv çiyayî hene, lê li welatên din kêm hene. Lew Kurdistan bi warê kewan dihêt niyasîn. Girtina kewan bi du pêngavan dihêt kirin:



Têjkewk: piştî mêkew li buharê hêkan dikin, hêlînan ji bo xwe çêdikin û li ser hêka kurk dibin. Li nîvê buharê hêkan dişkîne, têjkewk (çêlkew) jê derdikevin û şiyana birêveçûnê heye,dişên her zû bi zû lezokî birevin. Ewên divên kewan bi xudan kin, dizanin hêlînên kewan bi nêzîkî li kîrêne û nêzîkî kengî demê têjkewkane diçin lê digerin, li mil û nihal (newal) û girika. Bi taybet li nêzîkî ava (kanîka, gerka) ko mêkew nîvroya wan av didet. Wextê ew bi ser mêkew û têjkewka ve hildibin, mêkew difirît û têjkewk jî heyle li wî xwe di konekêra, di bin belgekî an di bin tiraşekê de xwe veşêrin. Ji tirsa hindek ji wan dikevin destê gundiyan (lêgeran) we li mal bi xudan dikin, mezin dibin, dikine reka de û li ciyek taybet, ji kitka (pisîka) dûr datînin.

Kew: Piştî ew têjkewkên nehên girtin ji layê gundiyan ve mezin dibin, firoke dibin, belav dibin, hindik cara wek grûp komdibin, pêkve dimînin ko jê re dibêjin "birê kew". Gundî û nêçîrvan bi van rêkên xwarê wan digirin we çêdibit li deverekê bo deverka din cudahî di navberê de hebin, lê li devera me û li derdorê bi vî rengî ne.

1.Tepik: Bahra pirtir li zivistanan, dema befir zor dibarit erd hemî spî dibit, kew xwe di bin rizde, kevir û daran de vedişêrin, da xwe ji sermayê biparêzin we piştî birçîbûna kewan ji wan cihan difirin we li cihên reş (bejayî) digerin. Ji bo vedîtina xwarinê, lew gundî an nêçîrvan bi delîve dibûrin diçin ko ew erdê kew lê heye reş dikin. Hinde erda an jî li ber kevra ewên befir jê negirit her mabeynekê, tepkekê lê datînin, we ji van pişka pêk dihêt:

Kurk: Ew kurke (çale) ya kew dikevitê, bi kolana erdê ko hindî meziniya kewê bit û piçek mezintir bit da kew tê de ne tengav bit, nemirit we ya çarkujiye wekî xizinkekê ye (boks).

Çamberik: ew kelank in (berên tevş) ko li ser herçar lêvên korka di erdê de kolayî dideynin û helankê singî divêt ko fireh û mokomtir bit, çonkî giranî dikevit ser.

Çeqilk: Darikek du taye (du çeq e), binê wî bi kêrkê tenik û pehin dikin da ko damberk xwe li ser bigirit. Dirêjiya wî nêzîkî (5-10 cm) dibit û stûrî jî 1-2 cm ye.

Damberk: Darikek zirave, mokome, karê wî helank ragirtine ko dikeve navbera çeqilkê û kelankê de. Dirêjiya wî di navbera 10-15 cm dibe we stûriya wî 1-1,5 cm dibe

Helank: Berek (kevirek) mukum û pehn û tenik e, divêt ji kurka tepkê pehintir bit da kurkê hemiyê bigirit û kew delevey nebînit, ji tepkê derkevit, herwesan divêt helank yê giran bit heta kew neşêt raket wextê di kurkê da xwe pirr didet, xwe li hedankî didet.

Tomk: Xwarina kewa ye, wekî genim, ceh, garis, tehle, genmok,bahra pirtir genim bikar tînin, we dikin di karkê de, anko tepkê de..

Piştî tepik bi pişkên wê ve bi domahî dihên ş amade dibin, tomkî dikin di tepkê de, paşî çeqilkê li ser çamberkê dadidin ko serê du ta dirêj dibite hindavî tepkê. Heta nîvekê, paşî damberkê li ser çeqilkê datînin, bi stûnî (rast) li dûv de helankî bi lariya (zawya) 30 –.45 pile (nimre) li ser datînin, we wesan diînin û dibin. Li ser êk ko xwe bigrin hersêk li ber êk û li pilt bin. Her dema giraniyek bikeve ser çeqilkê, ji nişkê ve (yekser) danberk ji bin helankê vereşit û helank bikevite ser tepkê..

www.kurd.org

Jinekolog, mêrekolog, dînekolog Prof. Doc. Dr .
Fatê Were Civatê



Xaltîka Fatê, çavê me ronî, wa Mam celal bû Serokkomarê Iraqê! Ma kêfa te nayê qey porkurê!?Bi xwedê ji kêfa re min îro sê mirîşk serjêkirin, qelandin û li cîrana belav kir. De min go bila setqa serê Mam Celalê me be, ma lê ne hêjaye!? Ma te çi kir setqe Fata porkur? Biner dinya alem Mam Celal pîroz dikin, jê re silav û rêzan dişînin, diyariyan dişînin, ma te çi diyarî ji Mam Celal re şand hêê? Biner bêaqiliyan meke û zû têkeve dora pîrozkirinê, yan wê qismetê te bireve haaa!!!

Eyşoka Gewende / Bexdad

Şêxbat

Yahewlelwelaaa, yehewlalwelaa! Yao ma kesekî biaqil bi ser min venabe bavooo! Hey Eyşoka Gewende, porkura porkur, ma çilo min Serokkomariya Mam Celal pîroz nekir lêêêê! Bi serê te min xwe li erdê xist, xwe dawşand û wek serxweşa bû zirzira min! Çend elokên min hebûn min go ezê bikim qurbana Mam Celal, lê piştre dilê min bi elokan şewitî û ez mam halekî heyirî. Min rahişt kêrê go herim elokê serjêkim, bû "gûlû gûlû gûlû"ya elokê û dest bi girî kir. Min ji elokê pirsî " tu çima digrî?" Elokê bersiv da min " ma ezê çilo negrîm, ev pêncî salin Mam Celal elokan dixwe, tuxmê me qeland, em çendek li ser lingan mane lê çavê we bar nabe, hûn dixwazin tuxmê me ri ruyê erdê biqelînin, hûn hemi wek hev zalim in!" Ma tu tibê ez li ber xwe ketim!? Wele bi serê te û Mam Celal, ez û elokê me hevdû himbêz kir, bigrîîî û hey bigrîîîî! Ez serê te neêşînim, taliya talî min û elokê biryara xwe da go ji Serok Bush re gazindnameyekê bişînin û daxwaza heqên elokên dinyayê bikin! Îcar peppûka Eyşoka Gewende, bi xwedê ez mame halekî heyirî, ez nema zanim çi diyariyê ji Mam Celal re bişînim qirikêêêê!?

*** *** ***

.Hevala Fatê, silav û hurmet! Ma ezê çi bêjim û çi nebêjim!? Va Mam Celal bû Serokkomarê Iraqê, Kek Mesûd dibe Serokê Kurdistana federal, Mam Derwêş çavê xwe berdaye Serokatiya Bakur, Leylokê bû Muxtara Tevgera Demokratîk Cimhûriyetê, Baqirxan ji xwe xwarziyê dewletê ye, lê tu zanî ez li ber çi dikevim nee!? Ez li ber Evdokê me dikevim lêê! Te go kîjan Evdo? Wîîî, peppûkê Evdokê me lêê, Serokê Komelên Kurdistanê haaa, brakê min ê mezin!! Rebeno hevqasî qîrewîr kir, geh bû Serokê Netewî, geh bû Serokê Gelê Kurd, geh bû Pêxember, Îsa û Mûsa, geh firya ezmana û geh çû Afrîka û taliya talî tiştek ji xwe fêm nekir. Talî hat û xwe kir Serokê Konfederasyona Koçeran jî, rebeno dîsa negiha meqsed û miradê xwe! Ev hisret di dilê wî de ma. Hevala Fatê ez pir li ber kekê xwe dikevim haaa, bi xwedê xew nakeve çavê min! Ma tu dibê çi?

Fatima Muxribî / Komela Ruhayê

De îcar yabooo, ez Fatê û tu Fatê, de îcar werin civatê yabooo! Hey belqityê, ma çi li dinyayê biqewime sûcê mine qey! Ê ma ji berê de negotine "heçê bilind bifire wê nizm bikeve" qurban! Celal û Mesûd bilind nefiriyan, nizim firiyan lê bilind bi hewa ketin. Heçê brakê te ye jî bilind firiya lê nizim ket! Ev ne eybe ne qebhete Fatimê! Ma te aqilek neda brakê xwe qey? Te jê re gotiba "keko binere gava xwe li gor xwe bavêje, tiliya xwe mexe bin her kevirî, mar hene, dûpişk hene, dost hene dijmin hene!" Ê go brakê te bi ya te nekiribe ma sûcê mine îcar! Brakê te firiya, firiya û hey firiya heta go li Afrîka danî. Îcar bi wir jî qaîl nebû hat û hat ket dafika xalanên xwe keçko, ma ez çi bikim! Ê ne dîsa jî bi halê xwe neraziye haaa! Ê xwedê jê razî, tu li ku û Serokatiya Komelên Kurdistanê li ku!? Binere Leylokê deh salan qulallaweehed xwend, nermik û germik bû, biaqil bû, hat û hat heta go bû Muxtara Tevgera Demokratîka Civakî, bû Tirka mêvanperwer! Îcar xwîşka Fatima Muxribî, ez bi qurban, daw û delingê xwe hilde û ji brakê xwe re bêje " keko ya baş wer ji Muxtariyê dest pê bike!" Yanî hindik û rindik ez qurban, çavnebarî xirabe haaa!!

fate@peyama-kurd.com

Heywanê xerîb

Li Çolemêrgê Mamostekî Tirk derzê dide şagirtan. Rojekê derza heywanan dide zarokan. Wêneyê Çêlekê pêş wan dike:

- Ev çi heywan e?
- Ew Çêlek e

ş Aferim..

Wêneyê kerê pêş wan dike. Baş e ev çiye?

- Ew ker e
- Aferim...

Ê hespê pêş wan dike. Ev çiye?

- Ew hesp e
- Aferim...

Mamoste bi dizî wêneyê Atatirk derdixe û dixwaze zanibe ka zarok wî dinasin yan na.

Başe zarokno ev kî ye?

Zarok bêdeng dimînin.

-Çima hûn bêdeng man, ma hûn vî nasnakin ?

şagirtek bi tirs destê xwe bilind dike:

-Mamoste, me heywan dîtine lê ev heywanekî xerîb e, em nasnakin!...

- Wey ne aferim!.....

Xaçerêz

Serejêr

1. Bager, firtone / xaliya piçûk (paşûpê) 2. Bajarekî Kurdistanê / vekirî, eşkere, alenî 3. Kesê bindest, stuxwar / zebaniyê devê deryê cehnemê 4. Du tîp / navekî mêrên Ewrûpî / girî, hilke hilk (paşûpê) 5. Gotina telefonê / çare, derman, rê (paşûpê) / kurtegotina Kurd û Kurdistan 6. Adetî, toreyî / kesê ji eşîra Ebasiyan e 7. Tesîr, pêguhertin / bazû, qas, koma damaran 8. Ling, pê (paşûpê) / sertîpên beq û rovî / kevir, teht, fîşek 9. Bajarekî Kurdistanê, Colemêrg / kesê bi qapan, ji xwe hezkirî 10. Hejmarek / çavsorî, êrîşkarî, harî



Çeperast

1. Çêlika mîhê / konê mezin, qumaşê qalind 2. Gemiya-keştiya- mezin a masîgirtinê / gotinek ecêbmayînê 3. Fermana çûyînê / seqet, kêm, bi lingekî 4. Cot, didu (paşûpê) / hêsirên çava, hêstirk 5. Kurmikên nava avê / paytextê Vîetnamê (paşûpê) 6. Ne şil, hişk, bêav / damar, reh, kok 7. Doz, armanc / çala avê, ray, baweriî 8. Hesûd, zikreş, çavbirçî 9. Lihevhatin, aramî (paşûpê) / edalet, maf, heq / li hinek ciyan ji zewacê re dibêjin 10. Di înternetê de gotinek / maddeyek paqijiyê 11. Yan, yan jî / navekî mêrên Ewrûpî (paşûpê) 12. Parçeyek ji zik û nava mirov / xwedayekî Yûnaniyan

Bersivên hejmara berê

Ceperast

1. Sarûgerm 2. Erênayî / ae 3. Roland / ern 4. Êd / erbod 5. Wî 6. Trigtsedib 7. Ararat / ne 8. Amt / îr / ecn 9. Dûis / îmdad 10. Esnek / ras 11. Ta / wate / ol 12. Înor / atakî

Serejêr

1. Serwet / adetî 2. Aro / ramûsan 3. Rêlêgirtin 4. Ûnad / ga / sewr 5. Gan / etrî / ka 6. Eyde / sarî / ta 7. Rî / rwet / mret 8. Ebîd / eda 9. Aro / încasok 10. Zendûbend / lî

Remildank



Beran (21.03-20.04)
Ji bo te rojek romantîk e. Surprîz li pêşiya te hene. Nekeve heyecanê.



Gamêş (21.04-20.05)
Tu tişt naqewime, rojek tenha ye. Tu dixwazî xwe rihet bikî û bêhna xwe berdî.



Cêwî (21.05-21.06)
Rojek romantîk lê her weha tevlihev e. Ne hissî be, bi pîvan be.



Kevjal (22.06-22.07)
Tu xwe westiyayî û nerihet dibînî, bê taqat î. Li xwe haydar be, evîn heye.



Şêr (23.07-22.08)
Ji bo te rojek xweş e. Tu dixwazî tiştên nuh û guhertî bikî, têkevî nav civatek nuh.



Simbil (23.08-22.09)
Rojek tenha ye, zêde tişt naqewimin. Tenhayî ji bo te baş e. Nekeve nav xeyalên kûr.



Mêzên (23.09-22.10)
Wê roja te xweş derbas bibe. Plan û bernameyên baş di serê te dene. Hewldan û cesaret pir e.



Dûpişk (23.10-21.11)
Tê bi karûbarên hûr û mûr dakevî. Wê rojek tenha û bêdeng be. Serê xwe rihet bike.



Kevan (22.11-21.12)
Tu livbaz, enerjîk û xwîngerm î. Tu ji civatên çalak û germane hez dikî. Lezûbez nebaş e.



Kovî (22.12-19.01)
Zêde tişt naqewimin, tu xwe nerihet dibînî. Bi hezkiriyê/ya xwe re derkevin seyranê.



Satil (20.01-18.02)
Ji bo te rojek bi kêf û şahî ye. Bangewazek heye, tê kêfxweş bibî. Bi hêvî be.



Masî (19.02-20.03)
Enerjiya te kêm e û ne li ser xweyî. Bûyerên balkêş naxuyin. Bêhnfirehî baş e.

Zelal

Ava xoxên xelatê



Navend:
Trink-Zel (Köln)
Tel.:0221 376 24 05

Bayiyên Zelal

AKCAN GmbH (HAMBURG)
Tel.: 040 723 402 96

LIZA GmbH (BERLIN)
Tel.: 030 390 380 30

ESD Softdrink GmbH (MANNHEIM)
Tel.: 0621 318 76 70

TRINK-ZEL II (DÜSSELDORF)
Tel.: 0211 49 62 150

CAN GETRÄNKE (ESSEN)
Tel.: 0201 289 74 17-18

TRINK-SEM (DORTMUND)
Tel.: 0231 981 86 23

HARRAN GmbH (FELLBACH)
Tel.: 0711 592 08 64

CHAPLIN GETRÄNKE (BREMEN)
Tel.: 0421 691 96 78

EURO-FRESH-FOOD GbR (ERFURT)
Tel.: 0361 26 27 516

TRINK-ZEL I (KÖLN)
Tel.: 0221 977 63 11

NERGIZ
Tel.: 02562 22 168

چیا حاجۆ: وەرزشکارێکی کورد لە ئاستی وەرزشی جیهانیدا

غەریبی رەوشێکی سەختە، بەڵام ئەوەی لە غەریبیدا دڵی مرۆڤ خۆش دەکا ئەوەیە کە هەندێ جار لە هەندێ بواردا سەرکەوتن بەدەست بێنێت لە کارێکدا کە سوودی بۆ نەتەوەکەی تێدابێت. وەرزش وەک یاری یەکی سادە نەماوە، بووە بە سیاسەت و بازرگانی، کاتێک یازیزانانی هەر دەوڵەطیک بەشداری هەر یاری یەکی نێودەوڵەتی دەبن، گەل و حکومەتی ئە تیپە پێی سەربەرز دەبن و خۆیان بە خاوەنی دەزانن و ئالای رەنگاو رەنگی خۆیان دەشەکێننەوە، ولتان بە ملیۆنان دۆلار لە بهواری وەرزسدا خەرج دەکەن تا بتوان لە یاری یە جیهانییەکاندا سەرکەوتن بەدەستبێنن. چیا حاجۆ یەکێک لە یاریزانە سەرکەوتوانەیە کە یاری فلۆرباڵ دەکات، فلۆرباڵ یارییەکە بۆ جاری یەکەم لە ساڵی ١٩٨١ لە سوید کرا، لە ساڵی ١٩٨٦ وە فیدراسیۆنی فلۆرباڵ ی نێونەتەوەیی دامەزرا و لە سەرانسەری جیهاندا ٢٣٠٠٠یاریزانی هەیە، ئەوانیش لە ٣٩٠٠ یانە دا لە ٣٤ وڵاتدا یاری دەکەن، ئەم وەرزشە زیاتر لە وڵاتانی وەک سوید، فنلاند، چیک، سویسرا و نەرویج دەکرێت. بە گوێرەی ئاگاداری فیدراسیۆنی فلۆربالّی ی جیهانی ژمارەی ئەو کەسانەی کە ئەم یاری یە دەکەن دەگاتە ١/٥ ملیۆن کەس. چیا ١٨ ساڵە و لە شاری ترپەسپی رۆژئاوای کوردستان لەدایک بووە. هێشتا تەمەنی سێ ساڵان بوو کە خێزانەکەیان ئاوارەی سوید بوو و لە شاری ئالفتا ی ٣٠٠ کم دوور لە ستۆکهۆڵمی پایتەخت جێگیر بوون. لەبەر ئەوەی یاری تۆی پێ لە سوید لە لیستی یارییەکاندا لە پێشەوەیە، چیا لە منداڵییەوە بایەخی بەم یارییە دا، بەڵام لەبەر ئەوەی لەم یاری یەدا دوو جار قاچی شکا، خێزانەکەی ئەویان لەم یاری یە دوورخستەوە و ئەویش رووبکردە یاری فلۆربالّ، ئەوا هەشت ساڵە کە چیا ئەم یاریە دەکا، چونکە چیا هەردەم لەم وەرزشەدا سەرکەوتنی بەدەست دەهێنا، سالی پار بۆ یانەیەکی سویدی ١٩ سالان هەڵبژێردرا، لە تیپێکی سویدیدا چیا بەشداری یاریەکی نێونەتەوەیی بوو. چیا شانسی ئەوەی هەیە بچێتە تیمی مەزنتر و لەم وەرزشەشدا گۆڵکەرێکی باش و لێهاتووە. کۆمەڵی لە رۆژنامەکانی سوید لەسەر چیا نووسیویانە و باسی چیایان کردووە، سەرکەوتنەکانی چیا لە یانەی ئالفتا و هەروەها لە تیپی سویدی وای لە یانەکانی تر کردبوو کە چاوی تێبڕن و هەر یانەیەک خوازیاری ئەوە بوو بۆلای خۆی رابکێشێت، چونکە هەر یانەیەک بتوانێت چیا بۆ لای خۆی بێنێت، باری ئابووری ئەو یانەیە باشتر دەبێت و قازانجێکی باش دەکا. چیا تەنها وەرزشکارێکی سەرکەوتوو نییە بەڵکو خویندکارێکی زیرەکە، ئەو ئێستا لە قۆناغی بەکالۆریدایە و هیواخوازە کە بتوانێ زانکۆ تەواو بکات، بۆ ئەوەی چیا لەناو میللەتی خۆشیدا سەرکەوێ پێویستی بە فێربوونی زمانی کوردی هەیە، چیا لە ئاخاوتنی بە زمانی کوردی، گرفتی هەیە و ئەگەر ئەو بتوانێ زمانی دایک فێر ببێ و وەک کوردێک سەرکەوتنەکەی تەواو ئامانج دەپێکێ.

تێبینی: ئەم یاری یە هەرچەند لە ساڵی ١٩٨١ەوە لە سوید دەستپێکردووە و وا ناسراوە کە سویدییەکان دایانهێناوە، بەڵام لە راستیدا یارییەکی فۆلکلۆری کوردیی‌یە و لە دەشتی هەولێر و دەوروبەریدا باوە و پێی دەڵێن (قاشوانێ).



سێرکی گەڕۆک



لە شاری دڵگیری "مێکینهایم"ی نزیک "بۆن"، سێرکێکی خنجیلانە سەرنجی راکێشاین کە لە چوارچێوەیەکی مام ناوەندیدا چەترەکەی هەڵدرابوو. لە نزیک چەترەکەوە قەفەسی ئاژەڵە جۆراوجۆرەکان بەدی دەکرا کە پڵینگ و حوشتر و مەیمون و مار ولاما و مامز و ئەسپ و گوێدرێژ و سەگ و پەلەوەری تێیدا دەبینرا. ئەم سێرکە کە ناوی(**Sarrani**)یە و لە ساڵی١٨٤٢دا دامەزراوە، هەموو ساڵێک ئەم کاتانە دەوارەکانیان لە شاری مێکنهایم هەڵدەدەن و نمایشە سەرنج راکێشەکانیان پێشکەش بە دانیشتوانی ئەو شارە دەکەن. نمایشەکانیشیان بریتین لە یاری جومناستیک و گەمە لەگەڵ ئاژەڵەکان و جادوویی و سەما و یاریکردن بە ئاگر و چەقۆ هاویشتن بۆ دەوروبەری کچێک کە وەستاوە و هەندێ شتی دیکەش. پەیامی کورد بە باشی زانی کە لە نزیکەوە چاوپێکەوتنێک بکات لەگەڵ سەرپەرشتیکاری ئەم سێرکە و چەند پرسیارێکی ئاراستە بکات.

پەیامی کورد: چۆن خۆت بە خوێنەران دەناسێنیت؟

وەلام: من ناوم "**Fredy**" یە و بە رەگەز ئەمریکیم و پتر لە بیست ساڵە خەریکی کارم لە سێرکدا.

پەیامی کورد: وەک دەبینین کاری ئێوە سەقامگیر نییە، ئایا چالاکییەکانت لەسەر چ ئاستێک نمایش دەکەن؟

وەلام: ئێمە سەرباری ئەوەی کە لە سەرانسەری ئەڵمانیادا چالاکییەکانمان نمایش دەکەین، لە هەمان کاتیشدا سەردانی هەموو وڵاتانی ئەورووپامان کردووە و چالاکییەکانمان لەوێ نمایش کردووە، بەم زووانەش سەردانی وڵاتی کەنەدا دەکەین بە هەمان مەبەست.

پەیامی کورد: ئەوانەی لەم سێرکەدا کار دەکەن خەڵکی کوێن؟

وەلام: دەتوانم بڵێم تێکەڵەیە، هەرجەندە زۆربەیان ئەڵمانن بەڵام ئیتالی و پۆڵەندی و روس و تورکیشی تێدا بەدی دەکەیت.

پەیامی کورد:لە کارەکەتان رازین؟

وەلام: بێگومان زۆر رازین و بەختەوەریشین چونکە سەرباری ئەوەی کارەکەمان کەسانی دیکە شاد دەکات، ئێمەش لە هەمان کاتدا وەک گەشتیارێک بە شار و وڵاتی جیاوازدا دەگەڕێین و شتی تازە و بەسوود فێر دەبین.

وتاری پێوراو بە بست!

ئەردەڵان جەمال

زۆر جار کە هەندێک وتار لە رۆژنامە یان گۆڤاردا دەخوێنمەوە، تام و چێژێکی یەکجار زۆری لێ وەردەگرم. ئەو جۆرە وتارانە، سەرباری ئەوەی کە بە شێوازیکی گونجاو و ڕێک و پێک نووسراون، کەچی لە هەمان کاتیشدا زۆر زانیاری و بابەت و تەوەری جیاوازی تێدا بەدی دەکرێت. بەڵام لە هەمان کاتیشدا و لە زۆر رۆژنامە و گۆڤاردا، کاتێک هەندێ وتار دەخوێنمەوە سەرم خەریکە دەئاوسێت و دەداتە ژان، بەبێ ئەوەی هیچی لێ تێبگەم یان بەلای کەمەوە سەرێکی لێ دەربکەم و بزانم باسی چی دەکات. سەیریش لەوەدایە کە وتاری جۆری یەکەم، واتە وتاری بەپێز و واتابەخش، سەرباری هەموو لایەنە پۆزەتیڤە جۆراوجۆرەکانی، بە کورتی و پوختی نووسراوە. بەڵام وتاری جۆری دووەم، سەرەڕای هەموو نەهامەتییە جیاوازەکانی، کەچی لە هەمان کاتیشدا بە دوور و درێژی نووسراوە، تەنانەت هەندێکیان دەست دەدەن وەک فەرشێکی بچوک لەسەر زەوی رایان بخەیت(هەرچەندە لە راستیشدا تەنها بۆ ئەوە باشن وەک سفرەیەکی خێرا بەکار بهێنرین). بابەتی سوود بەخش و خاوەن ئامانج، هەر لە سەرەتاوە دیارە، هەر بۆیە سەرنجمان رادەکێشێت بەلای خۆیدا و ناچارمان دەکات تا دوا وشە بیخوێنینەوە. بابەتی خوێنەرکوژێژ، هەر لە یەکەم رستەوە ئاوازێکی ناسازت بۆ لی دەدا و دەمارەکانی لەشت گرژ دەکاتەوە و وات لێ دەکات کە بە تورەییەوە چاوێکی خێرای پیا بخشێنیت، سەرەنجام بەرمالێک لە شێوەی وتارێکدا دەبینیت کە دەکرێت بە ئاسانی بە بست بپێوێت!!

بەکوردی بدوێ،
بەکوردی بخوێنە،
بەکوردی بنووسە،
بەکوردی بیربکەرەوە!



ئاژانسی توریستی
NEW PLAN
ئێمە ئامادەی خزمەت کردنی هاوڵاتییانی کوردی عێراقین
کوردستان لە ڕێگای تارانەوە
ڤیزای ئێران لە ماوەی دوو هەفتەدا
خەڵات
لەگەڵ هەر بلیتێکی دووسەرەی تاران، مەودای خواردن لە شیکترین ڕێستوران لە تاران بە مۆزیکی زیندوو
بلیت بۆ سەرتاسەری جیهان حەجی "عمرە"
گەشتی توریستی بۆ سەرتاسەری جیهان تاران لە ٣٢٠ یۆرۆ
Thomas-Mann Str, 24
53111 Bonn
Germany
Tel.: 0049 (228) 180 24 34
Fax: 0049 (228) 180 24 38
E.Mail: info@newplan-travel.de
www.newplan-travel.de

Kovara Serbestî

Lokman Polat



Niha li Stenbolê çend kovar derdikevin, yek ji wan kovaran jî kovara "Serbestî" ye. Ev kovar ji alî weşanên Doz'ê ve tê weşandin. Kovara Serbestî kovareke îdeolojîk, polîtîk, teorîk û akademîk e. Naveroka kovarê gelek xurt e û her hejmarên wê bi nivîsên lêkolînî, akademîk û teorîk tije ne.

Weşanên Doz'ê bi navê "Pelîn" kovareke Kurdî û bi navê "Serbestî" kovareke ku hemû nivîsên wê tirkîne weşand. Kovara Pelîn piştî deh hejmaran weşana xwe rawestand. Lê, kovara Serbestî weşana xwe domand û heta niha 18 hejmarên kovara Serbestî derketine. Kovar ji bo parastina doza netewa Kurd, têgihîştina kultura demokrasîyê, zanîna îlmî û sîyasî, pirdengî û pirrengîya ramanî û herweha pêkanîna sîyaseta felsefî û parastina doza netewî bi ruhê Kurdayetîyê diparêze. Digel naveroka nivîsên kovarê, weke weşanxane jî, pirtûkên ku ji alî weşanên Doz'ê ve hatine weşandin hemû jî li ser parastina doza netewa Kurd û têkoşîna netewî û demokratîk ya Kurdan in.

Navê kovarê anku peyva "serbestî" peyveke xwerû Kurdî ye. Maneya peyvê azadî ye. Kurd peyva "Azadî" jî bi kar tînin. Lê, bi min "azadî" peyveke farisî ye û di maneya peyva azadîyê de peyva Kurdî ya asil serbestî ye. Ev peyva asil ya Kurdî ji Kurdî ketiye zimanê Osmanî û Tirkî. Wan jî vê peyvê bikar anîne, lê wekî min got eslê peyvê Kurdî ye.

Dema mirov li kovara Serbestî'yê dinêre çar damezrevan û xebatkarên kovarê têne bîra mirov. Ew jî A. Zekî Okçuoglu, Mehmet Sanrî, Alî Riza Vural û Koroglu Karaaslan e. Helbet divê mirov heqê kedkara kovarê Nadîre Işik nexwe. Ew jî di hêla teknîk û mizampajê de keda xwe dixe nav amadekirina kovarê.

Di salên 1975-an heta 1980-yî de kovarên Kurdan yên herî îdeolojîk û teorîk kovara "Ozgurluk Yolu" , "Jîna Nû", "Rizgarî" û "Kawa" bû. Piştî salên heştêyî, bi taybetî jî ji sala 1989-an heta sala 2000-î kovara "Medya Guneşî" , "Vatan Guneşî" û "Deng" ji hêla îdeolojî û siyasetê ve kovarên teorîk bûn, xurt bûn. Kovara "Deng" bê rawestandin hêj jî weşana xwe didomîne. Lêbelê carna hinek hejmarên wê bi naverokeke dewlemend û hinek jî bi naverokeke qels derdikevin.

Ji salên duhezarî û virve, bi taybetî jî niha du kovarên kurdan ku ji hêla naveroka xwe ve gelek xurt derdikevin. Ew jî yek jê kovara "Serbestî" ye û ya din kovara " Kurd Solu" ye. Kovara Serbestî ji alî hemû rewşenbîr û nivîskarên Kurd ve tê xwendin. Nivîskarên ku di kovarê de dinivîsin kesên lêkolînvan, teorîsyen, akademîsyen, dîrokzan, sosyolog, îdeolog û sîyasetmedar in. Nirxandinên sîyasî yên gerînendeyê kovarê Mehmed Sanrî bi şêweyeke îlmî, zanîstî tê pêşkêşkirin. Dîrokzan û lêkolînvan Hasan Yildiz, sosyolog Îsmaîl Beşîkçî, siyasetmedar Umît Firat û gelek rewşenbîr û nivîskarên Kurd di kovara Serbestî de nivîsên hêja diweşînin. Di kovarê de gelek nivîsên nivîskarên biyanî yên derbarê Kurdan û doza netewa kurd de ji îngilîzî, almanî, fransî, farisî, arebî û zimanên din têne wergerandin û di kovarê de têne weşandin.

Kovara Serbestî di her hejmara xwe de li ser mijarên girîng dosyayên taybetî amade dike. Babetên dosyayan gelek balkêşin û mijarên ku li ser minaqeşe têne kirin, ji alî nivîskarên kovarê ve bi şêweyeke îlmî, zanîstî tê nirxandin. Hemû dosya û nivîsên kovarê hêjayê xwendinê ne û divê her sîyasetmedar, rewşenbîr û nivîskarên Kurd her hejmara kovara Serbestî'yê bixwîne.

Ji bo ku min vê nivîsa danasîna kovara Serbestî'yê ji bo xwendendevanên rojnameya "Peyama Kurd" nivîsî, loma min nivîs dirêj nekir. Nivîsên dirêj ji bo kovaran û yên kin ji bo rojnameyan pêwîst e. Heger min yekoyek behsa mijara dosyayan û behsa naveroka her hejmarê bikira, dê nivîs gelek dirêj bibana.

Bi kurtî û Kurdî ez di derbarê kovara Serbestî de vê bibêjim; Kovara Serbestî hêjayî pesnê ye û divê Kurd lê xwedî derkevin, bikirin, bixwînin, belav bikin.

Ji bo kêmaniya kovarê ez vê bibêjim û vê pêşniyaza xwe bikim. Di kovarê de tunebûna nivîsên Kurdî kêmanî ye. Bi min, divê di her hejmarê de hinek nivîsên Kurdî jî hebin. Heger çend nivîsên lêkolînî yên bi Kurdî di kovarê de bêne weşandin dê kovar bi her awayî hîn baştir be. Nivîsên teorîk, akademîk yên bi Kurdî dê bibe xemlandina pirdengî û pirrengîya kovarê.

Çiyayê Cûdî

Bavê Kamûran

Çiyayê Cûdî çiyayekî zor bilind û gewre ye. Her wextê li ser serê wî mij û dûman e. Bi ezmana bi ser de dibare. Menik, gezo şêrîne weke hingiv e. Ê li ser dara dikeve reng şîn e û ê li ser kevira dikeve reng spî ye, wek hingiv şêrînin. Hûr û girbûn weke şekirê hûre, dermanê dila ye û aspîrîna serêşa Kurda ye.

Bajar û gundên li derdora wî ev in:

Kurdistana Başûr:

Cizîra Bota, Silopî, Zaxo, Duhok, Hewlêr, Şaqlawa, Rawandûz, Akra û gelek gundên li dora wan

Kurdistana Rojhilat:

Lîdera, Hikar, Rizaîye, Xana, Mahabat, Romiye, Seqez.

Kurdistana Bakur:

Şirnex, Hezex, Midyad, Êstil, Hesenkêf, Batman, Qûrtelan, Diyarbekir, Masert Omerî, Stewrê, Mêrdîn, Qerejdax, Qoser

Kurdistana Rojava:

Nisêbîn, Dêrik, Qamişlo, Amûdê, Dirbesiyê, Serê kaniyê, Hesiça, Efrîn

Birca Belek, Dîcle û Fe-rat, dil û milê çiyayê Cûdî ne.

Berî bi hezar salan, tofan rabû, xweda emir da Hezretê Nûh ko têkeve gemiyê û li gel hevalbendê xwe li ser çiyayê Cûdî sekinî. Di qûrana pîroz de daket ser hezretî Nûh ko li ser Cûdî gemî raweste. Çîrok dirêj e, jê re pir pel divên. Li gora vê qûnaxa ko çiyayê Cûdî têde ye û gelê dinê ji tofanê xelaskir, bi emrê xweda ev xizmet kir. Pêwiste ko gelê Kurd navên mindalên xwe bikin Cûdî û Nûh. Heger milletê dinyayê hinek wîjdan hebûna, divyabû ko qet zilim û zorê li Kurd nekiribana, alîkarî bi wan re bikirana. Lê li eksê vê qenciya ko ji wan re hate kirin, pêwiste ko gelê dinyê tev de û bitaybetî yê Kurd her sal qurbana bidin û li malbatên şehîdan belav bikin. Ji salê rojekê ji bo Cûdî û navê Cûdî bikin cejn. Heger çiyayê Cûdî li ser axa milletekî din bûya, wê ji çiyayê Erefat û hemû çiyayên dinyayê bêhtir dend bidaya. Lê ji bo ko li ser axa Kurdistanê ye, bêdeng maye. Hêvîdarin bi alîkariya gelê Kurd û yekbûna wan, emê bighên armancên xwe û wê çiyayê Cûdî serê xwe bêhtir rake û wê bibe mal û mizgefta paraztina gelê Kurd û Kurdistanê.



Kurdzanê bi nav û deng Prof.Dr. Sakiroyê Xudo Mihoyî



Zanyarê bi nav û deng, akademîkerê Kurd, serokê Navenda Lêkolînên Kurdî li bajarê Moskivayê, Profesor Şakiroyê Xudo Mihoyî êdî 75 salîye. Em wek xebatkarên Peyama Kurd, 75 saliya Mamostê birêz Prod.Dr Şakiroyê Xudo Mihoyî pîroz dikin û jê re jiyan û temenek dirêj û bextewar dixwazin.



Beşê duyem a pirtûka Birêz **Mesût Barzanî** di Sibatê de dîsa ji aliyê Weşanên Doz ji bo xwendevanan hat pêşkêş kirin. Ev beş nêzîkî 600 rûpelî ye û ji serhildana sala 1961ê dest pê dike. Bi pirtûka yekem jî dîroka Barzanî yê nemir ya heta serhildana 1961ê ji bo xwendevanan hatibû eşkere kirin.



Pirtûka **Hasan Yildiz** a bi navê "Yekitiya Ewrûpa, Tirkiye û Kurd" 184 rûpele û di Çileya Pêşîn a sala 2004an de ji aliyê Dozê hatiye weşandin.



Ev pirtûka **Etem Xemgîn** di Çileya Paşîn a sala 2005an de ji aliyê Weşanên Dozê hatiyê weşandin û du sed rûpelî bêtir e.

Hûn dikarin van pirtûkan ji **„Peyama Kurd"** bi dest xin. eMail: ***info@peyama-kurd.com***

www.ar

Feqîyê Teyran li Ludwigsburgê bû mêvan...

Ikram Oguz

Nîzamettîn Ariç (Feqîyê Teyran), roja 9'ê Nîsanê li bajarê Ludwigsburg, Restauranta Mavi de resîtalek da.

Gelek zeman bû, me hinek hevalan dixwest ku carcaran bi hunermendên Kurd ra wek bi rewşek cuda, bê slogan û bê protokol werin ba hev, li alikî xwarin û vexwerinê bixwin, alîyê din klam û stranên xwe bi hevra bêjin.

Ji bo cara yekemîn niyeta me ew bû ku, em vî daxwaza xwe roja Newroza



2005'an da bînin cîh. Lê belê ew hunermendên ku me dixwestin, li gelek deran bernamê wan hebûn. Ji bo vê yekê, hevalê hêja Ali Riza Sever pêşnîyar kir kû ewê bi Nizamettin Ariç re biaxife û di rojên pêşî da wî dawet bike. Li ser vê pêşnîyarê em gelek kêfxweş bûn û me ew kar hewaleyî wî kir. Bi rastî wî jî, tenê bi serê xwe, alîkî bi Nizamettin re, alîye din bi xwedîyê restaurantê re axifî û ji bo 9'ê Nisanê biryar da û dest bi hazirîya bernamê kir.

Ne hewce bû ku em jê ra alîkarîyê bikin, ji bo serfirazîya wî telefona wî û navê Feqîyê Teyran tenê bes bûn. Wusa jî bû.

Êvara 9'hê Nîsanê hemû kesên ku me dixwest werin, hatin cîyê xwe girtin. Piştî xwarin û vexwarinê hunermendê hêja, Fêqîyê Teyran li sahnê cîyê xwe girt.

Bi hunermendîya xwe, di mêjuyê me da bi Selehaddîn Eyubî û Seydayê Cegerxwîn re rêwîtîyek dîrokî kir. Rêwîtîya wan ji Şamê destpêkir, ser Qamişlo, Amed, Dersim, Mehabad û Helepçeyê de derbas bûn, hatin ba me, li bajarekî bîyanî bûn mêvan.

Bi kilama "Lo Mîro", ruhê mîrê mîran, kumandarê mezinê bi nav û deng Selehaddin Eyubî şad kir, lê ji bo rewşa ku îro Kurd tê da, jê gilî û gazinê xwe kir.

Bi kilama "Zînê", Zîna zêrîn, Zina ku sala 1988'an da li bajarê Helepçe, bi çekên kimyewî ve hatibû birîndarkirin, trajedîya ku gelê Kurd derbaskiribû, carek din nîşanî me kir.

Repertuvara xwe, bi helbestên Seydayê Cegerxwîn, helbestên ku tê da bîr û bawerîya wî hatibûn nexşkirin, xemiland.

Bi vê bîr û bawerîyê program qedîya, lê dilşahîya guhdarvanan berdewam kir. Bi dilên şa û bi ruyên ken berê xwe dan malên xwe.

Galaya fîlman bi navê 4653 li Amêdê hat çekirin



Galaya fîlman bi navê 4653 ku ji alîyê fîlmçêkerên Mehmet Hatman û Feyzullah Yildirim hatibû çêkirin, li salona beledîya Bexlarayê pêk hat.

Fîlm bi navê 4653ê li ser mêrkujîyên salên 1991 û 2003a ne.

Wek tê zanîn ev mêrkujî bi kuştina Wedat Aydîn dest pêkiribû û di encamê da bi hezaran sîyasetmedar, ronakbîr, ronamevan û xwendekarên Kurd hatibûn kuştin. Kuştinên ku ji alîyê rayagiştî wek „ kuştinên qesas nedîyar „dihatin binavkirin hêdî hêdî eşkere dibin.

Di vî fîlmê dokumenter de hevpeyvîn bi malbatên maxduran, bi şahidan û her wiha bi Abdulkadîr Aygan re jî hene.

Qeder, neheqî û aqil - II -

Bargiranê OMERÎ

Gava go giyan xwe dispêre êqil, kubarî û qapanî ji dest êqil dikeve nava wîna. Gerek qirardana li ser her tiştî, emir, şêwr, şîret tim di destê dilekî paqij de bin, tim di destê giyanêd qencîxwaz, heqanîxwaz, paqijîxwaz de bin. Gerek giyan tim amir be û aqil wek qewetekê, wek şwîrekî, wek xizmetkarekî tim di xizmeta wî de be.Giyan bi dengê nava xwe tim qirarê bide, emir bike û aqil her emir bîne cî. Bêyî go hayê însanan jê hebe aqil dibe hacetek, maşikek go dikeve destê xizmetkarê tarîtiyê. Xizmetkarê tarîtiyê, hevalbendên xirabiyêne go demekê jo xafil de ketibûn xefika wî, xwe spartine xerabiyê û nema li ber xwe didin. Gerek giyanê xelkê go li heqîqetê, li rastiyê digerin xwe ji giyanêd go ketine bin hikmê xerabiyê biparêzin. Hinek ji wana li vê dinyayê ne, gelek ji wana mirine, nebedîl in (veşartî ne), bi erda vê dinyayê ve girêdayî mane (aliqîne). Kesê go wilo jêhatî di xizmeta tarîtiyê de ne, nêzîkî însanan dibin, gelekî tabê didim xwe, li çavrêyê fealê xirab digerin, keysa xwe lê tînin go xirabiyê, zikreşiyê, fen û fûta, derewa di dilê însanan kin. Kubariyê, qapaniyê di dilê însanan de xurt bikin. Devera go şewq, rastî, heqîqet lê hebe, bi derewa, bi fen û fûta, bi xerezdariyê êrîşî şewqê dikin, teşqela tînin serê însanan û manihî xelasbûna wanî ji tarîbûnê dibin.

Temamê pevçûn û şerê, temamê qede û beleyê, temamê teqûreqa li ser ruyê erda vê dinyayê, ne ji bêaqilbûnê ye, wekî din e, ji gelekî-biaqilbûnê ye. Ji kêmwîjdaniyê, ji kêm dilpaqijiyê ye. Ji ber go aqil û kubarî, qapanî, dilnepaqijî, bêwîjdanî û nefsektî tifaqa xwe dikin yek, dibin şirîkê hevdû, temamê xelkê dinyayê berdidin hevdû û tadê li wana dikin. Rehm, wîjdan, însaf, heqanî bi tîrêjên şewqê û bi teblîxê go ji bihiştê tên, dikeve dilê însanan. Ma aqilê, mejiyê go ji axê çêbûne, karin tucarî neheqiyê, însafê fêm bikin!? Temamê ilmê li mekteba û li zanîngehayi go giyan û xwedê ji nav xwe derxistine û asasê xwe li ser êqil danîne û temamê ilmê felsefê (pfîlozofî) û dînî go li ser êqil ave bûne, go bi êqil dişixulin, bûne berberê xwedê (bi xwedê re ketine qayîşê), di xizmeta xerabiyê de, di berberiya Mêhdî û xwedê de, ala ticcaliyê li ba kirine.

Ji her dînî, her milletî, însan tevde ketine xefika êqil. Xerabiyê ev xefik li ber wana vedabû. Aqil bûye maşika riya xerabiyê, hikumdariya êqil bûye ticcalî. Xizmetkarê riya tarîtiyê, riya xirabiyê, têketina çav xwe bi ber însanan dixînin. Li axa (li nav maddeya) vê dinyayê û li axa wê dinyayê, di navbera şewqê (xwedê) û tarîtiyê (hevalbendên prensîpên xerabiyê) de pevçûnek mezin destpêkiriye. Giyanê însên tenê kare (qadir e) hiş bi vê weqîtê bê dawiya vî şerî wê hikumdariya êqil hilweşe, rabe (hilê). Wê riya xirabiyê rabe. Wê xizmetkarê tarîtiyê di çala (koncala) bêbinî werbin. Navê wana ji kitêba heyatê rabe, vemire, şiklê wana ê li kaînatê biqesife. Wê ev goka erda vê dinyayê û deqa rojê, stêrê sîstema deqa-rojê bi hinnera xwedê berjor de bikişin, li ciyek nêzîktirî nûra xwedê li ser riyê xwe bizîvirin, bigerin. Heqê herkesî heye û suxra herkesiye go qedera xwe serrast bike, xwe ji neheqiya xelkê, ji êrîşkirina xelkê biparêze, li ber xwe bide, lê divê ev liberxwedan bê zikreşî, bi spartina xwedê, gav bi gav bi sebr bicire.

Gava go goka erda vê dinyayê hin bi hin bi hewa dikeve, wê ji xurtbûna qeweta xwedê erd û ezman li herdû dinyaya bihejin. Wê însan pê bihisin go wa giyanê miqeddes di bedena Mêhdî de nazilî erda vê dinyayê bûye (hatiye vê dinyayê). Wê kitêbêd dîna (mezheba), felsefe, îdeolojiya, kitêbêb xwedênasa û ê xwedênenasa tevde betal bibin. Wê şewqa xwedê go li Rojava nazilî erdê bûye, bi ser Rojhilat, Bakur û Başûr de dagere. Wê dijminayî, zikreşî ji nav ehlê dîna, ji nav milletan rabe û însan tevde xwih û bira bin. Wê tada li ser zarok û pîreka, li ser kesê bi tenê, ê seqet, ê nuqsan, ê feqîr rabe. Wê hişê heqaniya li ser namûsê ne ji kuflet û malbata mero tenê re be, wê pîrek û zilamê, keçik û xortê, zarokê ji dîn û milletê din jî, herkes ji mero re xwih û bira bin. Wê keçik û pîrek taca serê xort û zilama bin. Bi qudreta tîrêjêd pîrekaniyê ji xort û zilaman re deriyê bihiştê bin û wilo sitara heyata wan bin. Wê însan bi kerem û dana Yezdanê xwe têkevin nametê, xenê bibin. Wê ji kêfa, bistrên, bilîlînin, pesnê wî vedin, dengê xwe bi ezmana xînin. Ji ber go wê însan şiyar bin, ew bêbextiyê nakin, li xwedayê xwe naqulipin, wê gelekî tabê bidin xwe, jêhatîbin, bi keda aniya xwe bikemilin, bistewin. Wê xwedayê wan jî xelata wana, taca nemirinê bide wan.

Ê de bila herkesê qencîxwaz bigihê mirad û meqseda xwe û bereket û sitara xwedê li ser qenciya dilê xwendevanan be!



Rojnameya Kurd „Dema Nû" dest bi weşana xwe kir. „Dema Nû" ji niha û pê de ewê heftê carekê derkeve.

Muhyeddîn Efendî û Laz Memed

Îrfan Kaya

1950 de Menderes ome bi îktîdar, o wext rayero asin Xarpet ra şînî Dara Hênî û Muş ser ra heta Tatwan şînî.

O wext rayer bin erdî (Tunel) mutehitan viraştîyen. Laz Memed miyabin Çira Xirab (Suveren) û Dara Hêni di rayerî bin erd viraştîyen.

Laz Memed yew merdimo zaf yarûn bi. O yew roj şino dewê Kelaxsî, beno meymanî rehmeta Muhyeddîn Efendî (Muhittin Bilgin). Şefeqî sibê xizmekarî Efendî ziwar dûno Laz Memedî.

Xizmekar vûno:

Memed Efendî warz! wextî nimajo, desmacî xo bigîr, ma nimajî sibê kenî.

Laz Memed emir xo de nimaj nêkerdib. O çiqas vûno ke ez nimaj nekena, xizmekar fam nêkeno.

Xizmekar vûno:

Îta keyeyî şex o, ti mecbur warzenî û nimaj kenî.

Laz Memed vûno:

La qey to nêvendenî Efendî? Wa o zi warzo, ma pîya nimaj biker.

Xizmekar vûno:

Ez tersena venda Efendî bidî, bacê mi bê arz keno, ti venda Efendî bidî, o to ra veng xo nêkeno.

Laz Memed duno berî Efendî re, vûno:

Efendî kalk sabah oldu, abdest al namaza duracagiz. (Efendî warz! Siba dîya, desmac biger, ma nimaj kenî).

Efendî hetî nimajî ra binê sist bi, ey hewn ra zaf heskerdîyen. Ey tim-tim nimajî sibê viyarnayn, dima qeza kerdîyen. Efendî ageyreno, Laz Memedî ra vûno:

Memed sen namazini kil ben sonra kaza yaparim. (Memed ti nimajî xo biker, ez bacê qeza kena)

Laz Memed xo ra geyreno mehney, o vûno:

Efendî sen bu gobeginle kaza yaparsan bende vilayet yaparim. (Efendî ti bi na xilikê xo ya qeza bikerî, ez kena wilayet)

Laz Memed tepiya ageyreno, şino miyanî cilanî xo, rakueno.

Albumî Nîlufer Akbal o newe vêciya



Istanbûl- Hozana Kurd Nîlufer Akbal bi yew albumo newe ya hunerî xo peşkeşî gueşdaran kena.

No Albumî Akbal de 16 deyirî kurmancî, kirdkî, soranî, erebî û tirkî estî. Namê Album şewa yo. No album de çend deyirî Nilufer bi xo nuştî û muzisyen Ayhan Evcî ci re muzîk viraşto. Ê bîn deyirî şarê. Miyan nê deyiran de orijinala deyira „ Ayaginda Kundura" bi kurdî esta. Hûnc orijinala deyira „ Ada sahîllerinde" zi bi soranî û erebî esta.

No album bi prodoktorê Ayhan Evcî Îstanbul de fîrmaya Stardîum veto.

PJK emsêr kombiyayişî xo ê 12. Osnabruck de virazeno



PK - 1994 de çeher parçê Kurdîstan ra cînî amê pîyeser û persan xo ser qisêkerd. Pênî inî kombîyayiş de bi namê „Platform cînîyan Kurdîstan" yew platform o xo ser nîya rue.

Cînî ke no platform de ca gênî wahar vînayêyan cîya cîya yî.

Emser serrê 12.ey ruenayişî PJK o. No platform her ser yew ray semedî minaqaşa kerdişî persanî cîniyan yew kombiyayiş virazeno.

Emser zi PJK raya 12. bajar Almanya Osnabrück de yew kombîyayiş kerdo hedre.

Temayî kombîyayişî:

1- Neweşiyî Psîkomatik û sebebî înan

2 Verdşiyayişî poltîtîk Kurdistana Başur de

3- Temayî bîn ke kombiyayiş de biyerî tesbît kerdiş.

Kam ke wazeno torn ê kombiyayiş bibo gain heta penî aşmê Nîsan xeber bido hedrekerdanî kombiyayiş.

Kombîyayiş roj yene 14 aşmê Gûlan sehet 10.00 de destpêkenû û heta roj Dişeme bad nîmroj rûmenû.

Not: ***Ê ke mecbûrî qicanî (Domananî) xo xo de biyarî, ganî waxt de xeberî bidî. Miqatêbîyayişî qican bi peran o.***

Biha: pîyer pîya 60 €

Kontak: 0049(0)541- 6687684

0049(0) 160- 6218514

Faşîstan mehla Gazî de yew xort kişt



Îstanbul- Heftekû vîyert roja înê Esat Atmaca bi destî Güleran ame kiştiş. Esat Atmaca şandî roja înê gure ra veciya, o mehla de bi embaza xo ya rayer re şînî, no hel de Kabil Güler, birayî ey Zülfü Güler û pî înan Yaşar Güler bi kardana eriş berd Atmacayî ser. Atmaca brîndar şî neweşxaneyî hususî ê Gazî, la o neweşxane de merd. Çend sehet cuwa pey Cemal Bayturan û Mustafa Doşan bi darbê guleyan bî brîndar û taye pî û mayî Esat Atmaca kuayî.

Nê biyayan ser koma „Xortanî Antîfaşîst" qehwexaneyî Güleran veşna û heta verî neweşxanî şîyayiş viraşt. şarî mehla şîarî sey „ Ma Gazî de narkotîk nêwazenî" û „ Ma nêverdenî çete Gazî de biciwî" eştî.

Qetilkarî Esat Atmaca Kabil Güler, birayî ey Zülfü Güler û pî înan Yaşar Güler mehlayî Gazî de çiyanî narkotîk û cîniyan rueşenî ey mafyayî çek-senet î û bi ziwar şar re pere genî.

Kabîl Güler bi laqabî „Reîs" yeno sinasnayiş û çend hefte cuwa ver hepisxane re veradîyawo.

Polesî Îstanbul 4 tenî tepiştî. Dozgerî îfadê nê 4 kesan girot û bi sucdarkerdîşî merdim kiştişa nê 4 kesî erzîyayî Hepisxaneyî Bayram Paşa.

Weqfa Kurd 130 hezar kîtabî kerdî vila

Stockholm- Weqfa Kurdî ya Kulturî li Stockholmê projeyî xo ê hedrekerdişî kîtabanî Kurdî û bêpere vilakerdişî înan Bakurî Kurdistan de kerd temam. No Proje bi ardimî SIDA (Dezgehî Swêd ê semedî ardimkerdişî welatanî pêdmendî) ame ca. Çarçevê no proje de 29 kîtabî amê vilakerdiş, înan re 18 kîtabî Kurmancî û 11 kîtabî zi Kirdkî(Zazakî) yî. Her kitabo Kurmancî 5 hezar û ê Kirdkî zi 3 hezar amê çapkerdiş.

Arminî yo peyin



Selim Çürükkaya

Mi zûnen Hesen Atmaca Arminî yo. Wext ke mi „Nasname" de ey ser a xeber wend, hepisxaneyî Amed ûme mi vîr.

1982 zimistanib, hin roj şibi kuer, yew merdim ard qoxişê ma. Eskerî emir da, nê ûmbazî verî xo hetî dêsa ta da. Ey o merdimi berd eşt hücre heştin û şi teber

Qoxiş de çew xeber nêdenî, çew neşkenî xeber bido. Kes nêzûnen o miyerik kam o, semedî çineya ardo îtiya. Ma xoi miyan de qisêkerd. Ma pers kerdî. Vengi no merdim ûmenî gueşanî ma, ey vatiyen:

Xwede yo! Xwede yo!

Ma gueştarî kerdiyen, ma nêşken taway bikerî. Ma bermey, miyerik venda Humay dayn. Ma a şew ranêkotî.

Serî sibay esker ûme miyerik qefes ra vet, kua, kua û ard katî bin.

Namê nê miyerikî Mehmed Xan Ersener bi, o Lice ra bi, dayike ey Armînî bi. Semedî dayike ey a, serê ey kotib bela. Ma yew qefes de mendiyen. Ma tiye verd de bîbî yew rêz. Eskerî ûmê verniye ma de bîy rêz.

Timûnî Mehmed Xan zur ra ardî war, pê yew la ya camiyerdê (K...) Mehmed Xan best. Hetî layo bîn best asinî qefesa, pê boyaxo sur camiyerdê ey boye kerd.

Eskerî emir da ci: Rahat! Rahat! Xo hedreki! (hazir ol), Xo hedre ki! Verî xo tadi hetî peya!

Şima ganî hin bizanî sebi pê.

Yew na roj Mehmed Xan qefes ra vet. Nenguçi dayî ey fek re, zincê ey re, çimanî ey re . O xo re şi, gina beton seri. Înan yew zincîra derg ard û best lingê ey a, yew hetî zincîr zi berd qatî çeherin de best yew demira. O lingê ey ra aleqna, zincê ey ra guîn ûmenî: Şip, şip, şip, şip

Înan va:

Miyanî şima de çew na Arminî esto?

Yew eskerî va:

Çew na qindaye yo bê sunet, sey Hesen Atmaca myanî şima de esto?

Ma fehm kerd ke Hesen Armînî yo. Ez nêzuna yewî gerê ey kerdib, yan zi înan camiyerdê ey re fehm kerdib ke Hesen Armînî yo. Eskeran tim - tim Hesen kuaynî

Ey zi camiyerdê ey bîbî , belê serê ey.

Hesen nika ho Hepisxanê Almanya de o. Dewletê Tirkan ha Hesenî wazena.

Ez semedî Hesen a gazî kena:

Biyerî ma piyer piya waharî no Armino yo peyin veci

www.arsiv.net

Mîlîtanê PDK re heta serekkomariye IRAQ: Celal Talebanî

6î Edar 2005 de Celal Talebanî parlementoyî Iraq de sey kandîdatî lîsteyî îtifaqî Kurdan semedî serekkomara Iraq a amê vîcnayiş. Mam Celalî Kurdan, mîlîtan û dîplomatî Mustafa Barzanî, peşmergeyî koyanî Kurdistan, embazî Elî Eskerî û şehîd Aram, Maociyo ewilîn ê rojhilata binatîn Celal Talebanî ewro serekkomara Iraq o.

Seyîdxan Kurij





Celal Talabanî 1933 de Başûrê Kurdistan dewa nabestê Do[illegible]tan »(YWK). O 1954 de beno endamî Polîtburoyî PDK .

Celal Talebanî 1955 de sey wendox semedî festîvalê xortan ê dinya ya şi Moskova û Çîn. 1956 de o hêna semedî torbiyayişî yew festîvalê xortana şi Moskova û ûca de sereko nemir M.Mustafa Barzanî ziyaret kerd. Mustafa Barzanî o wext Yewbiyayê Sovyet de sey surgun ciwiyayn.

1963 de yew heyetî Kurdan serekdewleta Misir Cemal Abdulnasir, serekdewleta Cezayir Ahmed bîn Bela ziyaret keno. Celal Talabanî serekî no heyet bi. Hûnc eynî ser ey sey temsîlkarî şoreşî Kurdistan Fransa, Almanya, Rusya, dewletên Balkan û Avusturya ziyaret kerd.

1964 de PDK de problem vêciyayî. Celal Talebanî pa vistorê xo Îbrahîm [illegible] şerafi de şi Lubnan, Misir û Libya.

6î Adar 1975 de bênatê Iraq û Îran de piyeameyişî Cezayir ûme îmza kerdiş. No piyeameyiş bi sebebî vilabiyayişî şoreşî Kurdistana Başûr.

Penî 1975 de «Komelay Rençderanî Kurdistan » «Şoreşgeran » û « Xeta gişti » piya Yekitî Niştimanî Kurdistan (YNK) na rue. Celal Talebanî sey sekreterî peroyî ame vîcnayiş û heta ewro zi sekretrî peroyî ê YNK yo. YNK 1976 de bi şiara şoreşa newe dest şerî çekdarî kerd.

Heta 1983 Celal Talebanî bi xo [illegible] Mustara Barzanî, peşmergeyî koyanî Kurdistan, embazî Elî Eskerî û şehîd Aram, Maociyo ewilîn ê rojhilata binatîn Celal Talebanî ewro serekkomara Iraq o. Raya verina ke yew kes ke verba yew dewlet şerî xelasbiyayişî mîlî rûmneno, la penî de beno serekkomar a dewlet.

Celal Talebanî ewro 72 serre o û Hêro Îbrahîm Ehmed a zewiciyaye yo.

Roşnvîrî Kurd wazenî Mesud Barzanî bibo serekî Kurdistan



Hewler - Sîyasetkarî Kurd Dr. Mehmud Osman Mesud Barzanî re rîca keno ke o barî serektiye Kurdistan bigîro xo ser. Dr. Mehmud Osman inay sey yew doza mîlî û tarîxî vîneno.

Karkerî pêlkeyî ey " www.kurdistanabinxete.com " ji venda şarî Kurd danî ke paşt bidî no waşte.

Nê Mesud Barzanî re rîca kene ke no mesuliyeto tarîxî bigîro milî xo ser. Na firsata tarîxî kar biyaro her di îdareyanî Kurdistan yew kiro û piya giredo; bajar û heremî ke sey Kerkûk, Şingal yan Mexmûr û ey bîn Kurdistana biyerî giredayiş.

Kese ke biwazi no waşte destek bikirî eşkenî na adres re E-mali bişawî

" info@kurdistanabinxete.com ".

Alaqa: *seyidxan@peyama-kurd.com*

Bênatê pêşmerganî Kurdistan û çekdaranî dewletê Îran de şer vêciya



Rojhelatî Kurdistan de bênatê pêşmergeyanî Kurdistan û hêzanî eskerî ê Îran de şer vêciya. Goreyî xeberê „Middle East Newslin" 6î Nîsande Bane, Mehabad, Merîvan, Pîranşar û Senendecê kurdan demonstrasyon viraştî. Eskeranî Îranê îta de eşt Kurdan ser taye kerdî birîndar û tayê zi girotî. Pêşmergeyanî ri nimite şerî hêzanî Îran kerd. Polîs û eskeranî Îran nêşkayî rewş konrol bikerî, înan Merîvan re esker waşt.

Hanc goreyî Middle East Newslinê hema hema piyerê bajaranî Rojhelatî Kurdistan de demonstrasyon bî û bênate kurdan û hêzanî çekdar ê Îranî de şer veciyat. Şarî Kurdistan tirimbêl û avahî hêzanî eskerî ricnay û vêşnay.

www.arsiv.org

درێژەی ڕۆڵی بارزانییەکان لە.....

نیساری، سەرهەنگ فولادوەند، سەرهەنگ سەرداروەر، سەرتیپ بێگلەری و سەرتیپ زەنگەنە فەرماندەی لەشکری ورمێ و دەیان ئەفسەری تر سەرۆکایەتییان دەکرد، لەو کەش و هەوا سارد و بەفرینەی ئەو کاتەدا، وەرەی بەرزی بارزانی، شکانی هێزەکانی دوژمنی مسۆگەر کرد و بە دەوڵەتی ئێرانی سەلماند کە هێزی پڕ چەکی داگیرکەر ناتوانێ گەلی مافخوراوی کورد بەچۆک بێنێ. شای ئێران شکستی سوپاکەی بۆ قەبووڵ نەدەکرا و فەرمانیدا بە وەزارەتی جەنگ، کە لێپرسراوانی ئەو شکستەی پێ بناسێنێ. لەم ڕوانگەیەوە وەزارەتی جەنگ لە نامەی ژمارە A ـ٢٠٤٣ ـ ١٣٣٦/٣/٢١(١٩٤٧) دا بە سپاهبوود شابەختی ڕاگەیاند:

**بە ئەمری شاهەنشا بە ئێوە ڕادەگەیەنین، هەروەک و ئاگادارن بارزانییەکان ڕۆژی ١٣٢٦/٣/٦ (١٩٤٧/٥/٢٧) خزاونەتە نێو خاکی ئێران و بە ڕاگەیاندنی پەیتا پەیتامان بە لەشکری چوار بۆ ڕاوتان و سەرکوتکردنیان، لەشکر تەنیا توانی ڕۆژی ١٣٢٦/٣/١٩ تووشی سەربڕۆژەکان بێ، ژمارەی ئەندامانی لەشکر دە بەرانبەری ژمارەی سەربڕۆژەکان بووە و هەمە جۆرە چەک و ئۆتۆمبیل و شتی تریان پێبووە و بارزانییەکان بە تێکڕا پیادە بوون و هیچ چەشنە وەسیلەیەکی گواستنەوەیان پێ نەبوو، خاوەن شکۆ شاهەنشا کە بەو کارەساتەی زانی، فەرمووی: دەبێت لە ماوەی ٤٨ کاتژمێردا کۆتایی بەو مەسەلەیە بێ. وێستی بەڕێزیان قەت بەجێ نەکەیشت و تەنانەت ڕۆژی ١٩٣٦/٣/١٩ سەربڕۆژەکان لە ناوچەی "شووت" تووشی لەشکر دەبن و لە پێکهەڵپوونێکدا کە لەشکر ڕایگەیاندووە، ٣١ کەسی لێ کۆژراوە و ٣٥ کەسیشی بریندار بووە و بارزانییەکانیش توانیویانە بەرەو باکور جەنابی وەزیر ڕامسفیلد بکەم بۆ ئەوەی ڕەخنەی کێشا و هات بۆ سەردانی ئێمە تەئکیدیشی بۆ بکەمەوە هەروەک چۆن ئێمە لە ڕووخانی ڕژێم هاوپەیمانیان بووین و پێکەوە خوێنمان دا لەپێناو ڕووخاندنی ڕژێمی دیکتاتۆری‌دا، هەر لە هەمان سەنگەردایین دژی تیرۆر و تیرۆریستان هەروەها بۆ بنیاتنانەوەی عێراقی فیدراڵی دیموکراتی فرە حیزبی زۆر زۆر بەخێربێن) پاشان دۆناڵد ڕامسفیلد وەزیری بەرگری ئەمریکا گوتی:(ئیمتیازێکی گرنگە بۆ من ئەمڕۆ کە لێرە ئامادەم هەروەک چۆن" ڕۆژێکی خۆشە بەلای منەوە، ئەمڕۆ دەستمانکرد بە سەردانی چەند بنکەیەکی سەربازی هاوپەیمانان بە مەبەستی دەستخۆشی لێکردن و سوپاسکردنیان، ئامادەبوونم لێرە بە هەلێکی باش دەزانم بۆ ئەوەی سوپاسی گەلی کورد و سەرکردایەتی سیاسی کردووە؟

ئەو ڕووداوە، ئابڕوو و کەرامەت و پلە و پایەی سوپای ئێرانی لەلای دراوسێکان و تەنانەت لە لای عەشایری ناوچەکە دابەزاند و دەریدەخست سوپای ئێران تا چ ڕادەیەک لاواز و بێ دەسەڵاتە ، زۆر زوو ئاکامی لێکۆڵینەوەکەتان ڕابگەیەنن تا بە خزمەتی شاهەنشا بگات سەرۆکی سەرکردایەتی سوپای ئێران ـ سەرلەشکر ڕەزم ئارا (١)

١ـ لە کوردستانی عێراقەوە هەتا ئەوبەری ڕووباری ئاراس، موڕتەزا زەربەخت، لاپەڕە ٩٤ـ ٩٥ جلپی تاران، ساڵی ١٩٩٧.

بۆ ئەوەی بە دڕووستی ئاگاداری ڕۆڵی بارزانی و بارزانییەکان لە کۆماری کوردستاندا بین، باشتر ئەوەیە گوێ لە پێشەوا قازی بگرین و بزانین چۆن و بەچ شێوەیەک دەربارەی بارزانی بۆ سەرهەنگ عەتایی سەرۆک دادگای ڕژیمی پەهلەوی دەدوێ:

... لە چەند سەعاتێکدا دەتوانم بڵێم‌مەلا مستەفا بارزانی، ئەوی لە پیاوەتی و کەرامەت و شەرافەت و ئینسانییەت و شوجاعەت و نەبەزی و سەخاوەت و نەترسی لە مێژوودا کەسانی مەزن بووبێتیان، مەلا مستەفاش هەیەتی، ئەوەی موسڵمانانی سەدەی ئیسلام لە باوەڕ و ڕاستی و پاکی و دڵسۆزی بۆ خودا و ئایین و خەڵکی هەژار و داماوی میللەت بوویانە، بارزانی هەموو ئەوانەی تێدایە، هەروەکو سەعدی دەڵێ: هر انچه خوبان همه دارند، او بتنها دارد، جا حەز دەکەن باوەڕ بکەن و پێتان خۆش بێ یا حەزدەکەن پێتان ناخۆش بێ.

هەموو ئەوانەی لە دادگا بوون، سەریان لەو تاریفەی قازی محەمەد سوڕما.

دەڵێت: مەبەستی سەرەکی ماوەوەمان لە عێراقە پێشەیی ولاتێکی ئارام و پەیوەندییەکی دۆستانەی عێراقە لەگەڵ ولاتانی دراوسێی خۆیدا، ئێمە کاتێک دۆسییەی ئاسایش دەدەینە دەست عێراقییەکان کە بزانین هێزە سەربازییەکانی دەتوانن ئاسایشی عێراق بپارێزن، لە ڕاستیدا ئەوەی کە سەرۆک بۆش دەیڵێت تەواو لە قسەکانی سەرۆک بارزانی دەچن. هوشدارییەکانی ڕامسفیلد بۆ حکومەتی بەغدا ئاشکرا بوون و زیاتر لە سەرچاوەیەک باسی لێوە کردن بەڵام دیار نەبوو داخۆ بۆ کوردستان چی پێبوو، ئایا هەر سەردانێکی مجامەلە و ئاسایی بوو، یان هێنانی پەیامێکی تایبەت بوو لە ئەمریکاوە بۆ کورد، کە ئەمە سەردانی دووەم وەزیری ئەمریکایە بۆ کوردستان دوای سەردانی کۆڵن پاوەل ی وەزیری دەرەوە. ■■■■

درێژەی نەوڕۆز و باکووری کوردستان.....

وڵاتانی ئەورووپاوە بە چاوێکی پڕ لە ڕێزەوە سەیری دەکەن و داخڕیانەکانی بە هەند هەڵدەگرن، چەند جارێک جەختی لەسەر ئەوە کردۆتەوە کە بڕچی تورکیا هێندە پەڕۆشی دابینکردنی مافەکانی سەد هەزار تورکێکە لە دوورگەی قوبرس، کەچی لە سەدا یەکی ئەوە بە تەنگی داخوازی بیست ملیۆن کوردێکەوە نییە کە هاونیشتمانی خۆیەتی و لە چوارچێوەی ئەو وڵاتەدا پێکەوە دەژین و پێکەوەش ئەو وڵاتەیان بنیات ناوە. لە هەمبەر ئەو پرسیارەش کە زۆر جاران سیاسەتمەدارانی تورک لێرە و لەوێ دەیدرکێنن و دەڵێن، (کوردەکان هاونیشتمانی ئەو وڵاتەن و هەموو مافەکانیان دابین کراوە، نازانین لەوە زیاتر چییان دەوێت؟). لە وڵامی ئەو پرسیارەدا، لەیلا زانا زیتر لە جارێک گووتوویەتی:(تورکەکانی قوبرس بۆ خۆیان چی بەڕەوا دەزانن و داوای چی دەکەن؟! ئێمەش هەمان داوا دەکەین). ئەو وەڵامە پڕ لە ڕاشکاوییە، هیچ تەم و مژ و بوار بۆ خۆدزینەوە و خۆ لە گێلیدانیشی، نەهێشتەوە. ئەمڕۆ باکوورییەکان، ئەو ناسنامەیان دۆزیوەتەوە کە زیتر لە سەدەیەکە بە هۆی سەرکوتکردنەوە کاڵ کراوەتەوە، یان لێیان سەندراوەتەوە.

بەرجەستە و پەیمانگیربوونی هەموو ئەو ڕاستییانەی سەرەوە لە نەوڕۆزی ئەمساڵدا، (هۆشداریەکەی ئەردۆغان و وەڵامە ڕوونەکەی لەیلا زانا و جۆش و خرۆش خەڵک و بەشداربوونی گۆرانبێژە بە ڕەچەڵەک کوردەکان و ئامادەبوونی زۆر لە پەرلەمانتار و سازی ئەوروپی..)، ئەو ڕاستییانە دەسەلمێنن کە کێشەی کورد لە هەموو پارچەکاندا، لە سایەی قوربانیدانی زۆڵەکانی و گۆڕانکاریە جیهانییەکاندا، پێشەوتنێکی بەرچاوی بەرەو ئاراستەی چارەسەر بووە و ئێستا زیاتر لە جاران نزیکە لە ئاشتی و ئاسایش و عێراق بدات. ئەمە بێ لەوەی دەست بە جێ ئێران و ئەمەریکا و چەند دەوڵەتێکی تر بە جۆرێک لە جۆرەکانی تر هاوکار و پشتگیری شۆڕشی کوردیان دەکرد، بە جارێک هەمووی بڕا. هەروەها ژیانی هەزارەها خانەوادەی کوردی، کە بە شێوەی ئاوارە لە دیوی ئێران بە دەم سنوورەکانی عێراقەوە لە ئۆردوگاکان نیشتەجێ کرابوون، هەڕەشەی مەرگیان لێ کرا. ئەگەرچی سەرکردایەتی سیاسی و سەربازی شۆڕشی کورد، بە جۆرێکی تر لە جۆرەکانی پارتیزانی، توانای بەرگریکردنیان هەبوو، بەڵام ئەو مەترسییانەی کە لەلای سەرکردایەتی شۆڕش سەری هەڵدا و، لە ئاکامی ئەو هەڕەشە فرە لایەنە و، گەلەکۆمەکیە دۆژمنکارییەی دۆژمنانی گەلی کورد، زۆر بە وردی لێک درایەوە و، زۆر ژیارانە و هۆشیارانە بە بێ ئارەزوومەندی، ناچاربوو بڕیاری دەست هەڵگرتن لە بەرگری کاتی شۆڕش درا. هەرچەند بڕیارێکی ئێجگار سەخت و دژوار بوو، بەڵام مرۆڤ و سەرکردەی خۆنەویست و سەرکەوتوو، ژیار و هۆشیار، ئەو مرۆڤەیە دووربینانە توانای وەرگرتنی بڕیاری یەکلاکەرەوەی هەبێت، ئەگەرچی لەدەستدانی پلە و پایە و تەنانەت ژیانی خۆشی کەسانێکی تریشی تێدا بێت لە پێناوی چارەنووسی گست نەتەوەکە کە، وەیشومەیەکی دۆژمنکارییانەی قات و قڕی چاوەڕوانی دەکات. دەرئەنجامی ئەو بڕیارەی لەو کاتە ناسک و بەرتەسکەدا وەردەگیرێت لەوەیە لە ڕووی ئازاد و ئەندیشە و شکستە گشتییەکانەوە، بکەوێتەبەر ڕەخنە و، ڕەخنەکارییەکی ئەو تۆوە، تەنانەت زۆر جار تەجاوەزی ڕەخنەی سیاسیانەش بکات، بەڵکو لێکۆڵینەوەکان خۆیان بدەن لە داوێنی ئەخلاقیەتیش.

درێژەی هەیە





کاور ٣.٢١ تا ٤.٢٠

ئاستەنگ لە ژیاندا نییە و ئەوەی کە مرۆڤ دەیخوازێت هەر پێی دەگات بەتایبەتی ئەگەر ئاواتێکی سەرەکی بێت.



گا ٤.٢١ تا ٥.٢٠

گوێڕایەڵیت بۆ بەرپرسانت بە قازانجی خۆت دەشکێتەوە و هەرگیز گوێ مەدە ئەو کەسانەی کە دەبنە هۆی شێوانی ئەو گوێڕایەڵیەت.



دوانە(جمک) ٥.٢١ تا ٦.٢١

هەمیشە حەز لە گالتە و قسەی هەڵەق و مەڵەق دەکەیت، بەڵام ئاگادارە چونکە ئەگەری ئەوە هەیە بە هۆی گالتەوە تووشی گیر و گرفت بیت.



ئەو سەختییانەی کە لەم ماوەی ڕابردوودا تووشت بوون، بەم نزیکانە کۆتاییان پێ دێت، گرنگ ئەوەیە پەند و وانەیان بۆ داهاتووت لێ وەرگریت.



کەوان ١١.٢٢ تا ١٢.٢١

باری دارایی بەرەو باشی دەڕوات و ئەگەری ئەوەش هەیە کۆمەڵێک گۆڕانکاری پۆزەتیف بەسەر پەیوەندییەکاندا بێت.



گیسک ١٢.٢٢ تا ١.١٩

ئەو کەسەی کە لەم ماوەیەدا پەیوەندی سۆزداریت لەگەڵدا هەیە، هەموو ئەو سیفەتانەی تێدایە کە لەگەڵ هەست و دڵی تۆدا بگونجێت، لە دەستی خۆتی مەدە.



سەتڵ ١.٢٠ تا ٢.١٨

دەتوانیت هەندێ گیر و گرفتی خۆت بە توانای تایبەتی خۆت چارەسەربکەیت، بەڵام بەرامبەر یارەکەت هێشتا کەم تەرخەمی.



هەرگیز بە ڕێگەی هەڵەدا نەڕۆیت چونکە سزاکەی دەچێژیت و لە هەمان کاتیشدا دووچاری کۆمەڵێک کێشەی بێ سەر و بەر دەبیت.

دڕندەیی دیداری هەلکەوت زامیر لەگەڵ.....

عەلی مەردان: دەنگێکی پڕ لە خەم و ڕەوان و ژیرە.

ناسری ڕەزازی: دەنگێکی زیندوو بۆ کۆمەڵگای کوردی کە ئەکرێ زۆر وەستایانەتر مامەڵەی لەگەڵدا بکرێت.

مەرزیە فەریقی: سڵاوی گەرمی دڵی پڕ ئومێدی پێشکەش. لەیلا فەریقی: دەنگێکی باشە، خۆزگە بیزانیایە چۆن و چی خۆش ئەڵێت!.

بەهجەت یەحیا: دەنگێکی بەسۆز کە خەون بە پەیامێکەوە دەبینێ.

زەکەریا: بۆ گونجان لەبارە لەباتی گوێگرتن لە هەندێ گۆرانی بیانی ئەتوانن گوێی لێڕابگرن.

نەجمەدینی غولامی: ئەو دەنگەی سڵاڵنی زووی هێشتا لە گوێمدا ئەزرنگێتەوە.

عەدنان کەریم: خۆزگە ئەو دەنگە نیشتیمانی خۆی ئەدۆزییەوە.

مستەفا دادار: دەنگێکی گەرم و خاوەن تەکنیکی جوان، کە زۆر لەبارە بۆ گۆرانی نوێی کوردی.و داڕشتنی شێوازێکی پڕ لە فەنتازیا.

هەلکەوت: مۆسیقا چ کاریگەرییەکی لەسەر کۆمەڵگا هەیە؟

وەلام: مۆسیقا، کاریگەرییەکی زۆری لە سەر ئاستی هوشیاری کۆمەڵگا هەیە، چونکە مۆسیقا هونەرێکی زیندووە، ڕاستەوخۆ کاریگەری لەسەر هەست و ناخی مرۆڤ دادەنێت و نامەوێت پێناسەی مۆسیقا بکەم چونکە زۆر باسیکی دردێژ و فراوانە، بەڵام مۆسیقای جوان و سروشتی و پر لە فەنتازیا و خۆشەویستی کۆمەڵگا گۆش دەکات و بەرەو شارستانیەتی دەبات.

هەلکەوت: دوا وتەت بۆ پەیامی کورد؟

وەلام: سوپاستان دەکەم کەوا هونەرمەندان بەسەر دەکەنەوە کە هەڵبەتە دەزگاکانی ڕاگەیاندن پێویستە زۆر لەوە زیاتر بەو کارە هەستن، بواری کەسانی جدی بدەن کاربکەن، داهێنان بکەن، جوانکاری بهێننە کایەوە و هاوکاریان بکەن. ■■■■

پێشمەرگە

کەمال ڕەئوف هەنجیرە - ئەڵمانیا

بابەتێکی لێکۆڵینەوەیە

بەشی سێیەم

دوای بەدەستهێنانی بەیانی١١ی ئاداری ساڵی ١٩٧٠، کۆمەڵگەی کوردەواری بە هێزی شۆڕشگێڕانیشەوە، چووە قۆناغێکی تر. یەکێک لە دەستکەوتەکانی شۆڕشی کورد، هاوکاری و چوونە ناو کار و باری ئیداری دەوڵەتییەوە، لەسەر ئاستی کوردستان و عێراقیش. هێزی پێشمەرگەش چەندین گۆڕانی بە خۆوە بینی، لەوانە: زۆر لەو پێشمەرگانەی بەر لەو میژووە فەرمانبەر و خاوەن کاری دەوڵەتی سەربازی و پۆلیسی....هتد، بوون، گەڕانەوە سەر کارەکانی خۆیان. هەروەها پێکهاتەی هێزی پاراستنی سنووریان لە هێزی پێشمەرگە دروستکرد. بەم جۆرە پێشمەرگەش بوونە بەشێک لەو پێکهاتە نوێیانە. دەتوانین ئەو ڕاستییە بڵێین، بەم گۆڕان و ئەرکە نوێیانەیان پیرۆزی نازناوی پێشمەرگەیان لێ داماڵرا و، گەڕانەوە سەر دۆخی ئاسایی جارانیان. ئەگەرچی بەڕێچوونی ژیانی ئاسایی ڕۆژانەیان گەلێک جیاوازتر و لەبارتربوو، وەک لەوەی بەر لە ڕێککەوتنەکە تیابدابوون، بەڵام ژیانێکی ئێجگار گەورەشی دا، بە وتبوون و کەمکردنەوەی قەوارەی ئەو پیرۆزییە. لەو ماوەی چوار ساڵ ڕێککەوتنەدا، تەشکیلاتێکی تایبەت و بەرچاو لە پێشمەرگە وەکو بوونە پیرۆز و خۆشەویستییەکەی نەبوو. لەوە نەبێت ئەو گەلە بە سەرکردایەتی سیاسیشەوە، لە ئاکامی فرت و فێڵی ڕژێمی بەغداد، بیری لەدەست بەردانی گیانی پێشمەرگایەتیکردبێتەوە. لەبەر گەلی کورد و پارتە شۆڕشگێڕەکەی هۆشیاری تەواویان سەبارەت بە فرت و فێڵ و تەڵەکەبازی و کارە دژوارەکانی ڕۆژ لە دوای ڕۆژی پارتی شۆڕشینی بەعس و دەوڵەتەکەی هەبوو. ئەگەرچی باسەکەمان ناچێتە سەر تاو و تۆیکردنی ئەو لایەنە، بەڵام هەر وەک هێما پێدان، پێویستە ئەوە بێتینەوە یاد، کە لە ماوەی ئەو چوار ساڵی ڕێککەتنەدا، ڕژێمی فاشی عێراق، توانی چەندین لەو پێشمەرگە نەبەزیوانەی، کە لەوەوبەر، وەک تاکو و دەستە، تزسێکی بێ شوماریان دابوو بە دەست و دایەنەکانی، زۆر بە ئاسانی توانی گەلێکیان لێ تیرۆر بکات. هەروەها بە بەکارهێنانی شێوازی تایبەت، توانی کار بکاتە سەر لاواز کردنی گیانی شۆڕشگێڕی لە نێوان کەسانێکی دیار و بەرچاو. هەروەها لە چەند قۆناغێکی سنووری کوردستانەوە، کەوتە پاکتاوکردنی نەژادی کوردی و، کاولکاری و دوورخستنەوەی هەزارەها خانەوادەی کورد لەسەر خاک و ئاوێ زێدی باب و باپیریان و، هێنانی ژمارەیەکی زۆر لە عەرەب و نیشتەجێکردنیان لەو جێیانە، بە پشتگیرییەکی تەواوی مالی و ئاسایشەوە. توانی تەنانەت سیمای شاری گەورەی کوردنشین بەو سیاسەتە بگۆڕێت. خەڵکانێکی زۆر وەکو تاکیش تووشی زەرەرمەندییەکی مالی و سامانی زۆر بوون. ئەو کارانەی ئەوان کردیان، بوونە جێ برینێکی گەورەی میژوویی، تەنانەت تاکو ئەمڕۆش گەورەترین کێشەیە، کە بۆ نەوەکانی گەلی کورد بە بێ چارەسەرکردن ماوەتەوە. ئەگەری سیاسی وامان پێدەلێت: لەوەیە ئەگەر بار و دۆخی سیاسی و کزمەڵایەتی ئێستای عێراق کەمێک بە لایەکی تردا بگۆڕێت، ئەو برینە سەختەی دوژمن لە بەشێکی ئێجگار گرنگ و ستراتیجی کوردستاندا خولقاندوویەتی، هەر وازوو سارێژ نەکرێت و، پێویست بە گژداچوونەوە بکات؟!! هۆکارە سەرەکییەکانی هەڵگیرساندنەوەی شۆڕشی کورد پاش چوار ساڵ لە دریژە پێدانی ڕێککەوتن، دەگەڕێتەوە بۆ سیاسەتە چەوت و چێڵە دوژمنکارییەکەی ڕژێمی عێراق، بەڵام بەرخۆدانی ئەم جارەی شۆڕش ئەوەی نیشاندا، کە وا هەرگیزاوهەرگیز، ئەگەر دوژمن هەزارەها شێوازی تر بۆ بنج بڕ کردنی گیانی شۆڕشگێڕی و پێشمەرگایەتی، سەرناکەوێت. وا ئەمجارە بەڕێژەی ٩٨٪ی ئەو جەماوەرە لەگەڵ بڵێسەی هەڵگیرساندنەوەی گیانی بەرگری و شۆڕشدان لە شاخ و لە شار. توانای ئەم جارەی هێزی پێشمەرگە لە ماوەیەکی کورتی چەند مانگیدا، لە هەموو بەرەکانی شەڕ و بەرەنگاربوونەوە بە ئاشکرادەرکەوت. شکستی هێزی سەربازی و سیاسەتی دەوڵەتی عێراقی، بەدەست توانای پێشمەرگەی کوردستانەوە، ناچاری کرد خۆی لە داوێکی تری فێڵاوی نێودەوڵەتی بئاڵێنێت و، بەو کارەی قەیرانێکی بێ کۆتایی بۆ خۆشی و نەوەکانی تری گەلی عێراق بخولقێنێت. ئەگەرچی ئەمجارەیان بەلای خۆیەوە یارییەکی تری سیاسی و دبلۆماسی و ئابووریەوە، لە ڕێی ئەم یارییەوە دەتوانێت، بۆ هەتا هەتایە، لە دەست کێشەی گەلی کورد ڕزگاری دەبێت و بۆ یەکجارەکی شۆڕشەکەی لەبن دێنێت. ئەو یارییە سیاسییە دبلۆماسییە ئابووریەش، ڕێککەوتنە شومەکەی ئاداری١٩٧٥ی جەزایر بوو، لەگەڵ ڕژێمی پەهلەوی ئێران. لەبەدی هێنانی ئەم ڕێککەوتنەشدا، چەند ناوەندێکی نێودەوڵەتی هاوکاریانبووە. بەو جۆرە بە گوێرەی برگەکانی ئەو ڕێککەوتنە، کۆتاییان بە ناکۆکی دریژخایەنی چەند ساڵەیان هێنا و بەرامبەر بەو بەڕۆەوەندی بەخشینە ئابووری و سنووریانەی لەسەری ڕێککەوتن، پێویستە بە هەموو جۆرێکیش ئێران دەستبەرداری هاوکاری سەربازی و تەقەمەنی و یارمەتییە و...هتد لەتەک شۆڕشی کوردا بێت. سەرکردایەتی بەعس و ڕژێمی عێراق، لە ڕێی ڕاگەیاندنەکانیانەوە دانیان بەو ڕاستیەدا نا، کەوا هێزی شۆڕشی کورد، چۆن لە بەرەکانی جەنگدا بەرەنگاریان بوونەتەوە و، کار گەیشتە ئەوەی بە ناچاری لە تەک ئێراندا لە سەر مێزی ڕێککەوتن

بۆ لاپەڕەی ٧



نەورۆز و باکووری کوردستان



ئیسماعیل تەنیا . ئەڵمانیا

ئەگەر نەورۆز، جەژنێکی هاوبەشی نێوان نەتەوەکانی فارس و ئەفغان و کورد و هەندێک نەتەوە و کەمە نەتەوەیەکی تری ڕۆژهەڵات بێت یان نا، هیچ لەو ڕاستییە مێژوویییە ناگۆڕێت کە کورد لە دێر زەمانەوە یادی کردۆتەوە و بە جەژنێکی میللی نەتەوایەتی خۆی زانیوە و لای بۆتە سیمبولێکی مەزنی ڕزگاربوون لە چەوساندنەوە و پچراندنی قەفی زنجیر و سەرهەڵدان و نوێبوونەوە.

نەورۆز لای هەموو کوردێک پیرۆزە. بروا ناکەم هیچ جەژن و بۆنەیەکی تر هەبێت نیوەی هێندەی ئەو ڕۆژە بایەخی پێ بدات و پێش هاتنیشی ئامادەکاری بۆ بکات. ئەوە نەک هەر ئێستا، بەڵکو لەو ساتانەش کە ڕژێمە کۆنەپەرستەکەی و سەرکوتکەرەکان بە یەکێک لە بۆنە حەرامکراوەکانیان دادەنا.

نەورۆزی ئەمساڵ، بەتایبەتیش لە باکووری کوردستان، بەهۆی ئەو زەمینە لەبار و ڕەخساوەی باشوور، ئەو فشارە زۆرەی ئەوروپای بۆ سەر تورکیا، لە پێناوی چاکسازی و دەستەبەرکردنی مافی نەتەوە و کەمە نەتەوە و ئاینزاکانی نێو سنووری ئەو وڵاتە، هەروەها ناچاربوونی تورکیاش بۆ ملکەچکردنی لە ئاست ئەو داواکارییانە، گوڕ و تینێکی چەندایەتی و چۆنایەتی بە نەورۆزی ئەمساڵ بەخشیوە.

ئەمساڵ، لە سەرانسەری باکووری کوردستاندا، لە هەموو شار و شارۆچکە و کۆڕە دێیەکان و تەواوی شارە گەورەکانی تورکیا، نموونەی ئەستەنبول، ئەنکەرە، ئەزمیر و ئەدەنە، وێڕای چاودێرییەکی قۆرسەر...هتد، بەڕێوەچوو. بەشداربوونی بێ شوماری گەل، لە ژن و پیاو و پیر و کاڵ، ئەو ڕاستییەی سەلماند کە خەباتی نەپساوی ئەو پارچە گەورەیە، سەرەڕای نسکۆ و شکستە سەربازییەکانیش، هەر بەڕێوەیە ئەو ڕۆژە نەما کە نکوڵی لە بوون و ناسنامەکەی بکرێت. هەڵپەڕینی ئەو ڕیش سپییە تەمەن حەفتا ساڵە لە ناو ئاپۆڕی جەماوەردا، بێ گوێدانە ئەو بەند و باوە هەڵبەستراوانەی کە بە ناوی ئاپینەوە نەوروز حەرام دەکەن، تاکە بەڵگەی شۆڕبوونەوەی نەوروز بۆ ناو ناخی هەموو تاکێکی ئەو نەتەوەیە و مرۆڤ بە بینینیان هیواکانی زێتر چرۆ دەکەن و گوڕ و تینێکی تریش دەدەنە بەر هەڵگاوەکانی.

ئەمساڵ، زۆربەی گۆڕانییەڕۆ بە ڕەچەڵەک کوردەکانی وەک ئیبراهیم تاتلیسەز و جەیلان، کە چەندان ساڵە دەنگیان، خزمەتە هونەرییەکانیان، دەقەبەر کولتووری تورک کراوە، بەهۆی ئەو زەمینە ڕەخساوە و خۆناسکردنیان، بەشداری ئاهەنگەکانیان کرد. بە دەیان لێپرسراو و سازی و پەرلەمانتاری ئەوروپی، یانگهێشتی ئەو جەژنە کرابوون. گوتارەکانی لەیلا زانا و سیاسەتمەداری کورد(فەلەکناس ئۆجە)ی ئەندام پەرلەمانی ئەوروپی، نەورۆزەکەی نوێتر و بە گوڕتر کرد. داخزیان و هۆشداربیە پێش وەختییەکە ی(ئەردۆغان)یش بۆ دەزگاکانی پۆلیس و ئاسایش، تاوەکو نەوڕۆزیش بەدەردی هەشتی ئادار نەچێت و نەبێتە مایەی سەرئێشە و نارەزایی دەربڕینی دەزگا ڕاگەیاندنەکان و نێوەند و سەنتەرە بریار بەدەستەکانی ئەوروپا، مایەی تێڕامان و لێوردبوونەوەیە.

ئەردۆغان، بە ئاشکرا داوای لە سازیەکانی دەوڵەت کرد کە لە هەمبەر خەڵک و ئاهەنگێڕان دەرنەکەون و دان بە خۆیاندا بگرن، نەک وەک ئەوەی هەشتی ئادار بە دار و کێبڵ بکەونە گیانی ئافرەتانی خۆپیشاندەر. چەند هەفتەیەکیش پێش پیرۆزکردنی نەورۆز، لەیلا زانای سیاسەتمەدار کە لەلایەن

بۆ لاپەڕەی ٧



پەیڤ...

نووسینی : ئینۆس هایەق

هەتا ئێستا چی کراوە بۆ یادی ئەنفالەکان؟؟

ئەوا ئەمسالیش مانگی نیسان هاتەوە و یادی تاوانەکانی ئەنفالی لەگەڵ خۆی هێنایەوە ، لەملاو لەولاوە ئەبیستینەوە ئەو یادە بە خەم و ئازارێکی زۆرەوە ئەگێڕێتەوە ، هەر چەند بە زەمەن لەو کارەساتە دوور کەوینەوە چەند گەورەتر و بە ئازارتر دەبێت ، یەکەم لەبەر گەورەیی قەبارەی کارەساتەکە خۆی و دووەم ، لەبەر ئەو هەموو فەرامۆش و کەمتەرخەمیە دەبینم لە یادکردنەوەی ئەو یادە کارەسات ئامێزە ..

بەباوەڕی من میللەتی کورد ئەمڕۆ بە هەردوو ئیدارەکەیەوە گەورەترین دەسکەوتی بەدەستهێنا کاتێ ڕێکەوتن لەسەر دروستکردنی هەردوو ئیدارەی سیاسی کوردی و حکومەتی عیراقی لەلایەن کوردەوە ، بەڵام ئەوەی لێی تێناگەم بۆ ناتوانن هەتا ئەمڕۆش بۆ ناتوانن هەموو هەوڵ کارمکانیان یەکخەن لە ڕۆژێکی وەک ڕۆژی یادکردنەوەی تاوانەکانی ئەنفال ، بۆچی ناتوانن پێکەوە بە یەک دەنگ بۆ شەهیدەکانی هەڵبجە و ئەنفالەکان و دێهاتە سووتاوەکان بگرین ، بۆچی هەرێک پارچە پەڕۆی خۆی دادڕیوە و لە بۆنە خۆشیەکاندا هەڵیدەگرن ، ئەی بۆچی ناتوانن یەک تۆپ قوماشی پێکەوە بکرن و بیکەن بە یەک لافیتە و یەک دروشمی لەسەر بنووسنەوە ؟؟

ئەوەی هەتا ئەمڕۆ کراوە و ئەکرێ لە کاری تاکەکەسی و تاکە لایەنی و کاری لایەنەکانی سەربەحیزبەکان و کەسایەتیەکانی سەربەحیزبەکانن زیاتر هیچی تر نین ، کاری ڕێکخراوەیین کە حیزبەکان لە پشتیەوە وەستاون ، بۆیە دەبینیت لە هەر وڵاتێک لە وڵاتانی ئەوروپا ئەگەر ئەو یادە ساز درێ ، ئیدی هەر ڕێکخراوێک سازی بدات ، دەبینیت تەنها ئەو کەسانە ئامادە دەبن کە لایەنگری حیزبێکن ، ئەو حیزبەی لەپشتی ئەو ڕێکخراوەوەیە کە یادەکەی سازداوە.

من بەشبەحاڵی خۆم هەموو ئەو یادکردنەوانە ئەگەر کەم و کووڕیش بن هەر بەرز هەڵدەسەنگێنم ، بەڵام ئەوەی مەبەستمە لێرەدا بیڵێم ئەوەیە ، چەند ئێمە یەک بنوێنین لەبەردەم کۆمەڵگای نێونەتەوەییدا ، بەتایبەت لە ناساندنی ئەو تاوانانەی بەسەرمان هاتوون ، چەند بزۆمان باشە ، چونکە ڕاکێشانی کارەسات و تاوانەکانی بەسەر گەلەکەمان هاتووە و بەسەرکردنەوەیان هەربەک بەلایەکدا بە خزمەتی مەسەلەکان ناگەڕێتەوە بە هێندی ئەوەندەی هەوڵ بدرێت پێکەوە یەک پێناسەی شیاو و گونجاوی ئەو کارەساتانە دارێژین و پێکەوە پەیرەو و پرۆگرامی کارێکی هاوبەش دانرێت بۆ کۆنگرەیەکی ساڵانە بە بەشدرای (و بەشداری حەتمی) هەر هەموو لایەنەکان و چۆنیەتی جوواڵن بەرەو -ساڵانە- وەبیر هێنانەوەی دونیا بۆ ئەو کارەساتە گەورەیە ..

من لێرەدا ئۆبالی کەس ناخەمە ئەستۆی کەس ، ئەمڕۆ بە هیچ پێوانەیەک ناشوبهێتە دوێنێ ، ئەمڕۆ کورد سەردارە و خاوەنی هێزە ، ئەگەر ئەو سەردارییە نەقۆزێتەوە بۆ سەرخستنی مافە ڕەواکانمان و بەتایبەت بۆ بەجیهانی کردنی ئەو تاوانانەی لە دژمان بەئەنجام گەیەنراون ، ئەوا ئەو پلەو پایەیە هەر نەبێت باشە ، پاشان مەسەلەیکی لەهەر هەمووی گرنگتر ناساندنی تاوانەکانە بە هاوڵاتی سادەی عەرەب و نەتەوەکانی تری عیراق لە ڕێی گێرانی کۆر و کۆبوونەوە و تەنانەت یادکردنەوەی تاوانەکان لە پایتەختی بەغدا بەبەرچاوی هەموو عیراقیەکانەوە بۆ ئەوەی هەر هەموو باوەڕ بهێنن بە گەورەیی ئەو تاوانانە. و داوا کردن لە پیاوانی ئایینی چیدی لەوە زیاتر بێدەنگ نەبن و ئیدانەی ئەو تاوانانە بکەن کە بەناوی ئایەتی قورئانیەوە لە دژی کورد بە ئەنجام گەیەنراون . ئەوە کەمترین شتە بکرێت هەر نەبێت بۆ دڵنەوایی کردنی کەس و کاری ئەنفالکراوەکان ، و دڵنیا کردنەوەیان لەوەی قوربانیەکانی ئەنفال هەرگیزا و هەرگیز بیرناچنەوە ، هەر بۆ ئەوەش زۆر گرنگە سەرۆکی کۆماری تازە هەوڵی ئەوە بدات ئایینی ئیسلام نەبێتە تاکە سەرچاوە بۆ تەشریع ، بەڵکە یەکێک بێت لە سەرچاوەکان .. چونکە کاتی خۆی بەناوی ئیسلامە قڕکراین و لە ژێر ئالای عیراقدا بوو ، بۆیە گۆڕینی ئەو ئالایە تا ڕادەیەک لە خەم و ئازارەکانی کەس و کاری ئەنفالکراوەکان کەم دەکاتەوە ، چونکە هەموو ساڵ یادکردنەوەی ئەو تاوانانە و لە سایەی ئەو ئالایەدا ئازارەکان دەکات بە دوو ئازار..■■■■

مانای هونەر

بەشی شەشەم

Herbert Read وەرگێڕانی لە فارسییەوە سەربەست خەسرەو عارف

١٤- ڕەگەزی خودی

ئەوەی ڕاستەوخۆ لە بەرهەمێکی هونەری ڕەچاو دەکەین، بە جۆرە ڕەگەزێکی خودی ناودەبەین، چاوەڕوانین ئەگەر هونەرمەند خاوەنی زەینێکی هەڵکەوتوو نەبێت، لە سەرێتی خاوەنی هەستیارییەکی کارامە و هەڵکەوتوو بێت. چاوەڕوانین هونەرمەند شتێکی نوێ و ڕەسەنمان بۆ ئاشکرا بکات؛ واتە ڕوانگەیەکی سەر بە خود و تایبەتخوازمان نیشان بدات، هەمان چاوەڕوانییە کە چاومان بە گشت تێبینییەکی تر نابین دەکات و بە هەڵەماندا دەچێت و دەرهەق بە چۆنیەتی هونەر تابلۆیەک، سەرنجی کەسێکی سادە ڕادەکێشی؛ کەسەکە ئەوە فەرامۆش دەکات کە هەستیاری حاڵەتێکی خرۆشاندنی زەینی مرۆڤە و ئەو شتانەش کە تێکەڵ بە هەستی مرۆڤ دەبن هەر یەکەیان بوویەکی هەروەک خۆیان هەیە. هونەرمەندیش زیاتر کاری بەو بینراوانە هەیە، بە هەر ڕادەیەک هونەرمەند لە هەستیاری لابدات و وانەی ئاکاری دابدات یا بێهەستانە خوو بداتە بابەتی ناهەستی تر؛ بە هەمان ئەندازە لە پلەو پایەی بەرهەمی هونەری خۆی دوادەکەوێ و توانای لە دەست دەدات. واتە پێناسەی لەباری بەرهەمی هونەری ئەمەیە کە بەرهەمی هونەری دەبێ بریتی بێت لە نەخشاندنێک کە ئەو نەخشاندن و وێنەیە شوێنەواری هونەری پێوە دیار بێت واتە شوێنەواری هەستیاری

١٥- پێناسەی نەخشاندن

نەخشاندن لە بەکارکردنی سادەی خوددا، بۆ نموونە نەخش یا وێنکردنی پارچە پەڵەیەک، واتە دابەشکردنی هێڵ و ڕەنگ لە زنجیرەیەکی دوپاتبووەوەی دیاریکراودا. نەخش پیشاندەری شێوەیەکە لەباری سنووردارێکی دیاریکراودا. لە تابلۆی هونەریدا ئەو مەیدانە یا ئەو سنوورە بە چوارچێوەی تابلۆکە سنووردار دەکرێت.

لەم نموونە سادەیەی نەخشاندنەوە گەر زیاتر بەرەو قۆناغی باڵاتر بڕۆین، ڕووبەڕووی تێکەڵبوون دەبینەوە. سەرەتای قۆناغی ئەو تێکەڵکردنەش هەڵسەنگاندن و جیاکردنەوەیە. لە هەڵسەنگاندنا بە شووێنی دووپاتی وێنەیەک لە زنجیرەیەکی یەکسانی بەرانبەریەکدا، گەر وێنەکە سەرەونگوون بکەینەوە و لە بەرانبەری وێنەی پێشوودا دابنێین، ئەو ڕووە لەوانەیە لە هەندێک لاوە کە لە هونەری جۆراوجۆردا بەدی دەکەین، دیاری بدات. بەو شێوەیە دووپاتبوونەوەی هاوسەنگی تەواو دڕووست دەبێت؛ وەک چۆن لە بابەتی بەربڵاوی هونەری ڕۆژهەڵاتدا بەدی دەکەین. بۆ نموونە دوو گیاندار ڕووبەڕووی یەکتری دادەنرێن، دوا تێکەڵی بریتییە لە ئازادکردنی هاوسەنگی هەڵسەنگێتراو و بەدیهاتنی هاوسەنگی دابەشکراو، لەو بارەیەوە بەرهەمی هونەری دەبێتە نیشاندەری خاڵی عەتف(شایەنی پێوانە کردنە بە چەقی قۆرسایی) واتە "مرکز الثقل" کە هێڵەکان و ڕووە قەبارەکان لە دەوروبەریاندا بە جۆرێک دابەش دەبن کە هاوڕێژەیی تەواو بەدی دێنێت. مەبەست لە بنیاتنانی گشت ئەم بەشە جیاوازانە بریتییە لە هارمۆنی یان هاوگونجاندن، هاوگونجاندنیش هەستی جوانیمان پێدەبەخشێ.

١٦- پێناسەی وێنە - شێوە - Form

کێشی زمانەوانی وشەی شێوە بەم جۆرە پێناسە دەکات: " شێوە؛ ڕێکخستنی بەشەکانە، لایەنی بینراوە ، شێوەی بەرهەمێکی هونەری جگە لە شێوە و ئارایشی "ڕێکخستنی" بەشەکان و لایەنی بینراوی بەرهەمەکە شتێکی دی نییە. لەبەر ئەمە هەر شێوەیەک لە بوونداری دەبێ ڕوخسارێکی هەبێت، ئەگەر دوو شت یان زیاتر پێکەوە کۆببنەوە ئارایشتێک پێکدێنن، بەڵام دیارە وەدزانین کە کاتێک لە شێوەی بەرهەمێکی هونەری دەدوێن، مەبەستمان لە شێوەی تایبەتی فیگۆرە؛ مەبەست لە شێوەیەکە یا وێنەیەکە بەجۆرێک لە جۆرەکان کارمان تێدەکات. شێوە ، پابەندێکی لەبارە یا نەزم یا هەڵسەنگاندن یان هیچ جۆرە گونجانێکی دیاریکراوی نابێت، کاتێک لە شێوەی ئەندامی وەرزشکارێک دەدوێین، یا لە شێوەی بەرهەمێکی هونەری دەدوێین، کەم و زۆر مەبەستمان شتێکە، وەرزشکار لە شیوەیەکی لەبار و گۆشتی زیادە و چەوری لەشی نەتەنیوە و بزێو و ساغە... ماسوولکەکانی بەهێزن و جووڵە و سەکەناتی بەجێیە.. هەمان خاڵ دەربارەی پەیکەرێک یان بەرهەمێکی هونەری دووپات دەکەینەوە، بڕوانە تابلۆیەک کە بە نموونە لەبەرچاودەگرین... دەبینین لە کاتی سەرنجداندا چی ڕووئەدات؟ وای دادەنێین کە تابلۆیەکی باشە و دەمانبزوێنێت.

١٧- سەرنجدان لە تابلۆی هونەری

کاتێک لە تابلۆیەک دەڕوانین، پارچەیەک ڕەنگە، بەرهەمی هونەرمەندی مەزنی ژاپۆنی کاتسوشیکا هوکوسای یە (katsushika hokusai) لە سەر ئەو بڕچوونەی کە تابلۆیەکی نایاب و باشە، ئەمەش بە هەند دەگرم کە کەسێک واتە " بینەر" لەبارێکی دەروونی گونجاودایە؛ تەنها مەرجی پێویستی باسەکە ئەمەیە کە کەسی بینەر خاوەنی سەلیقە و زەینێکی تەواو بێدار بێت. واتە با بێ و جۆرێکی تایبەت لە وێنەکاری ببینێت، یان نابێت چاوەڕوان بێت کارێکی هونەری ببینێت، تەنها لە جێگەیەکەوە ڕادەربڕێت و لە حاڵەتێکدایە کە هیچ شتێکی دیاریکراو و تایبەتی لە یادا نییە و لە بەرانبەر تابلۆی سەرنجدراودا ڕادەوەستێ؛ ئەوەی کە ڕوو دەدات تا ڕادەیەک پەیوەندی بە ئارەزووی کەسی بینەرەوە هەیە، بەڵام ئێمە مەسەلەکە لە ئاڵۆزترین جۆری توانای خۆمانەوە دەخەینە ڕوو.. واتە گرینگ کەسی بینەر، پیاوێکی ئینگلیزیە و ئاستی ژیانی ناوەندییە، ئەگەر کەسێکی ڕۆشنبیر خۆی لە پشتەوەی تابلۆکە حەشار بدات و جووڵە و سەکەناتی بینەرەکە ببینێ، دەشێت تێبینی ئەوە بکات کە چاوانی پیاوە ئینگلیزەکە کەمێ دەکرێتەوە؛ تا هەناسەیەکی قووڵیش هەڵدەکێشێت و توشی ڕاچڵەکانێکیش بێت، لەوانەیە ئەو پیاوە ئینگلیزە سێ چرکە بەرانبەری تابلۆکە بوەستێت، لەوانەشە پێنج خولەک ڕابوەستێ و پاشان ڕێگەی خۆی بگرێت، دەشێ نامەیەکیش بنووسێت و لەو چێژەی کە ئارامییەکی هێندەی پێ بەخشیوە بە ڕوویەکی سڕووش بەخش بڕچوونەکانی خۆی تۆمار بکات.



شە پۆلی گەورە - کاتسوشیکا هوکوسای (١٧٦٠- ١٨٤٩)

دڕێژەی هەیە

ڕۆژی چوارشەممەی ڕابردوو کاتێک هونەرمەندی ناوداری عێراقی "جەعفەر ئەلسەعدی" تامادەی کۆنفرانسی ڕۆشنبیران بوو لە بەغدا. لە ناکاو تووشی وەستانی دڵ بوو و دەست بەجێ گیانی لەدەستدا. وەزارەتی ڕۆشنبیری عێراق ناوی کۆنفرانسەکەی تا بە ناوی ئەم هونەرمەندە وەک ڕێزلێنانێک. ئەلسەعدی یەکێکە لە ستوونە سەرەکییەکانی شانۆی عێراق و بە مالئاوایکردنی لە ژیان شانۆی عێراق زیانێکی گەورەی لێدەکەوێت. هونەرمەندی شانۆیی بەناوبانگی عێراق "یوسف ئەلعانی" کە لە هەمان کۆنفرانسدا ئامادەبووە و لە تەنیشتی جەعفەر ئەلسەعدییەوە دانەنیشت، بە خەم و پەژارەیەکی یەکجار دیار بە ڕووخسارییەوە گوتی کە دوا زەردەخەنەی ئەو هونەرمەندەی بینی پێش مردنی. سەرەتاکانی جەعفەر ئەلسەعدی بۆ سالی١٩٣٥دەگەڕێتەوە کاتی قوتابی قۆناغی ناوەندی بوو و لەو کاتەوە لە بواری شانۆدا خزمەتی کردووە. ئەلسەعدی سەربازی کاری لە بواری شانۆدا لە بواری سینەماشدا کاری کردووە و وەک ,مامۆستایەک لە پەیمانگەی هونەرە جوانەکان و پاشانیش لە ئەکادیمی هونەرە جوانەکان چەندەها ساڵ وانەی پێشکەش کردووە. ساڵی٢٠٠٠ لە قاهیرە خەلاتکرا وەک یەکێک لە پێشەنگەکانی شانۆی عەرەبی. جەعفەر ئەلسەعدی ڕووخسارێکی سەرەکی دراما تەلەفیزیۆنییەکانی عێراق بوو، ڕۆڵ بەرجەستەکەی لە زنجیرە تەلەفیزیۆنی "هەڵۆ و چاوەکانی شار" سەرنجی بینەرانی بەلایدا ڕاکێشا.■■■■

هونەرمەندی ناوداری عێراقی "جەعفەر ئەلسەعدی" کۆچی دوایی کرد



دیداری هەڵکەوت زاهیر لەگەڵ:

هونەرمەندی مۆسیقاژەن شێرکۆ حەمە سالح



هەر لەمندالییەوە گۆشەگیر و دەستەمۆی دەنگ و ڕەنگ و ڕێتم لەرکاتەوە تێکەڵ بووە بەشەونەکانی و ئەو جیهانە مەنگەی لە دەریای موزیکدا پەنگی خواردووەتەوە. شێرکۆ زۆر زوو پەی بەموزیک برد و هەرواش دنیاکەی موزیک ئەوی ئۆستەوە. ئەیویست تەنها لە مالە خنجیلەکەی موزیکی کورد بمێنێتەوە ، خۆزا ئەو سنورەی بەزاند و لە مەیدانێکی گەورە و فرەواندا لە نار جیهانە تایبەتیەکەی سەماژنیا و مۆزو و کلتوری موزیکە خۆی پێکبێنا. ئەوە ئێستا دەست و پەنجەی دەنگەژێکانی کەمانە و پەرەو نیگایەکی نوێی داهاتوو کەوتۆتە ڕێ.

هەڵکەوت: لەمندالییەوە تا هەندەران لەمۆسیقا چیت خوێندووە ؟

وەڵام: بە هاندانی ئەندامانی خێزانەکەم ، لە تەمەنی سیانزە ساڵیدا یەکەمین وانەی مۆسیقام لە مامۆستای بەڕێز "ئازاد مەعروف" وەرگرت. سەرەتا لە سەر ئامێری ئۆکۆردیۆن و پاشان کەمان. ساڵی ١٩٨٨ دەستم بە خوێندنی مۆسیقا (ئامێری کەمان) کرد لە پەیمانگای هونەرە جوانەکانی سلێمانی لە لای بەڕێز مامۆستا ئەنوەر قەرەداغی، پاش ئەوەی هەر پێنج ساڵی خوێندنم بە پلەی یەکەم بڕی، ئارەزو و هیوای گەورە، بەرەو هەندەرانی بردم بە مەبەستی خوێندن و زیاتر قووڵبوونەوە لە جیهانی مۆسیقادا. لە ساڵی ١٩٩٥ لە ئەڵمانیا ئەژیم. پاش گەیشتنم بۆ ئێرە هەوڵم دا کە زمانی ئەڵمانی فێربم تا بتوانم بخوێنم، سەرەتا وانەی کەمانم لە سەر ئەرکی سەرشانی خۆم ئەخوێند، تا بتوانم ئامادەیی ئەوەم هەبێت بە ئاسایی بخوێنم لە یەکێک لە زانکۆکانی خوێندنی مۆسیقا کە پێی دەوترێت کۆنسەرڤاتوار. ئێستاش لە شاری ماینز لە زانکۆی **Peter Cornelius Konservatorium - Mainz** دەخوێنم لەلای مامۆستای پرۆفیسۆر "ئەلۆیس کۆتمان" کە دوا پلەمە و ساڵی چوارەمە بۆ ئامێری کەمان. لە چەندین جێگای جیاواز بەرنامە و کۆنسێرت پێشکەش دەکەین. وەک کارکردنیش لە ساڵی ٢٠٠٠ لە قوتابخانەی مۆسیقای هاتەرس هایم **Musikschule Hattersheim** وانەی کەمان دەڵێمەوە و زیاتر لە ٢٥ قوتابیم هەیە، بەشداری هەندێ کۆنسێرت و ڤیستیڤاڵی کوردی ئەکەم لەگەڵ پرۆگرامی تەلەفزیۆنی کەناڵە کوردییەکان.

هەڵکەوت: ئەمڕۆ مۆسیقای کوردی چۆن دەبینیت؟

وەڵام: هەڵسەنگاندنێکی زانستی زۆر سەختە، بەڵام هێندەی بتوانم لە ڕێی ئەزموونەکانی خوێندنەوە بەم شێوەیە ئەتوانم لەسەری بدوێم. بە هۆی نەبوونی قوتابخانەی باش، گەرانی باش و لێکۆڵینەوەی باش، کادێر و پسپۆڕی تایبەت لەو بوارەدا مۆسیقای کوردی نەیتوانیوە ئەرشیفێکی دەوڵەمەندی بۆخۆی هەبێت، ئەوەش ببێتە بنەمایەکی زانستی بۆ زیاتر پێشکەوتنی مۆسیقای کوردی، کەواتە مۆسیقای کوردی سەرەتاییە و هەر بۆیەش نەبووەتە خاوەنی فۆرم و قاڵبێکی تایبەت بە خۆی. هەندێ جار لە ئاستی مۆسیقای چاخی ناوەندی ئەورپا دا مۆسیقای کوردی دەبینمەوە کە 700 ساڵ لەمەوبەرە. ئەوەش بووەتە هۆی شێواوی مۆسیقای کوردی و تاقیکردنەوە و لاسایی چەندین شێوازی گۆرانی و مۆسیقا کە زۆربەیان زیانێکی گەورەیان بە مۆسیقای کوردی گەیاندووە . چونکە زۆر شێوازی مۆسیقا و گۆرانی هەن کە پابەندن بە هۆکاری کۆمەڵایەتی، مێژوویی، جوگرافی نەتەوەیەکی جیاواز یاخود کۆمەڵێک کە چێژ وەرگرتنیان بەو جۆرەیە کە هەستی خۆیان بەو شیوازانە دەردەبڕن، گومان لەوەدا نییە کە مۆسیقا و گۆرانی کوردی هەوێتی بەپێزی تیایە کە تائێستا بە ڕادەی پێویست سوودیان لێ وەرنەگیراوە و بەو شیوازە سەرەتاییەی خۆی ماونەتەوە، هیوادارم کەوا لە داهاتووی نزیکدا ئەو هەوڵانە زیاتر بە ئەنجام بگەن.

هەڵکەوت: بۆچی مۆسیقای کوردی ئەگەیشتوونەتە ئاستی مۆسیقای جیهانی؟

وەڵام: هۆکار زۆرن، تێگەیشتن لە مۆسیقا لە لای کۆمەڵگای کورد، ڕۆڵی مۆسیقا لە ژیان و میژووی ئێمەدا، پەیوەندی مۆسیقا بە ئاین و داب و نەریتمانەوە و تێڕوانینمان بۆی کەی مۆسیقا لە لایەن کۆمەڵگای کوردیەوە بوو بە کولتوور ئەو کاتە ئیشی بۆ ئەکرێ. هۆیەکی زۆر گرنگیش ئەوەیە کە کورد خاوەنی قەوارەیەکی سەربەخۆ نییە، تا بپەرژێتە سەر ئەوەی لەو بوارەدا تێگەیشتنێکی وای هەبێ، کە بزانێ چی ئەوێت، تا ئەمڕۆش خەبات ئەکات بۆ سەلماندنی خۆی وەک نەتەوە و مافی بوونی، بەڵام خۆشبەختانە کورد هێندە ئامادەیی هەیە کە هەنگاوەکان خێرا بنێ بەرەو دنیای نوێ. ناتوانرێتکۆمەڵگای پێشکەوتووی ئەورووپا و ئەمریکا لەگەڵ کۆمەڵگای کوردیدا لە بواری مۆسیقادا پێوانە بکرێت، چونکە مەرجی ژیانی کۆمەڵگاکان جیاوازن، هەر میللەتەش تایبەتمەندی خۆی هەیە کە ئیستاتیکای ئەو میللەتە دەستنیسان ئەکات.

هەڵکەوت: چی بکرێت تا مۆسیقای کوردی پەرەو ئەو ئاستە بچێت؟

وەڵام: کورد پێویستی بە هۆشیاری و ڕۆشنبیری کولتووری هەیە، لە سەرەتادا تا بتوانێ بیر لە هەنگاوێکی بەو جۆرە بکاتەوە، پاشان کردنەوە و دامەزراندنی قوتابخانە و پەیمانگای تایبەت بۆ پەروەردە و دڕووستکردنی کادێر و پسپۆڕ، هاوکاری دەزگاکانی ڕاگەیاندن لە ڕێی ئەوەی بایەخ بە کاری هونەری جوان بدەن، پشتگیری دەوڵەت بۆ ئەو مەبەستە زۆر گرنگە، چونکە گوێگری کورد ئاسان لە خشتە ئەبرێت، لەلایەن ئەوانەی بازرگانی بە مۆسیقای کوردییەوە ئەکەن و کاریگەری خراپیان لەسەر مۆسیقای کوردی هەیە و زیان بەخشن بە پرۆسەی پێشخستنی مۆسیقای کوردی. هیوادارم سنوورێک بۆ دەنگی ناخۆش و مۆسیقای سەقەت دابنرێت، مەرج نییە هەر کەسێک حەزی لە گۆرانی وتن کرد، لەسەر تەلەفزیۆندەربکەوێت چونکە هەموو گۆرانییەژێک ، هونەرمەند یاخود دەنگخۆش نییە، هونەر شتێکە و ئارەزوو شتێکی تر.

هەڵکەوت: بیروڕات بەرامبەر ئەم دەنگانە چییە؟

وەڵام: لەسەن زیرەک: ناوی خۆی بەخۆیەوەتی، دەنگێکی گەلەری کوردی تەڕ و بە جۆش و سروشتی یە. بۆ لاپەڕەی ٧

دیمانەیەک لەگەڵ شاعری نەوەی نوێ چنار نامق



چنار نامق ناوێکی دیاری بزاڤی شیعری کوردیە لەم نەوە تازەدا، شیعرەکانی تەو لیواولێون لە ئەدیتشەی مرۆڤانە وئازادی وپێشکەوتن، خۆی کوتەنی تەو لەگەڵ بوونداا ناتەبایە وەدەبوێت نەخشەی بوونێک دابڕێژێتەوە کەتێیدا گەڵ بە ویستی خۆی دار جێبەجێت تەگ بە ویستی پایزو زریان، چنار خاوەنی دوو کتێبی چاپکراوە لەگەڵ کۆمەڵێک نوسینی تر وشیعرەکانی وەرگێردراونەتە سەر زمانی عەرەبی وفارسی و تەڵمانی و ئینگلیزی.
چنار خاوەنی نەفەس وشێوازێکی تایبەتی نوسینە ولەتێو فەوزای دەنگەکاندا دەنگی شیعری دەناسرێتەوە.

پەیامی کورد: چنار کێ یە ؟

چنار: کەسێکم لە ئاپۆرای خەمە گەورەکانی بوونەوە رژامە نێو جەنجاڵی زەمەن و ئاوێتەی فەلسەفەکانی بووم لەوێرا چوون سێبەرەکەم لە خۆم ونبووم، سەردەمێک چوون بیرەوەرییەکانم لە ژمارەدنی رۆژگار شەکەت دەبووم و دەمێکی دی پێکەکان لە بیریان دەچوو بمخۆزنەوە.

پەیامی کورد: دەکرێت سەرەتای ئاشنابوونی بەرێزتان لەگەڵ شیعر باسبکەیت؟

چنار: رەنگە شیعر ئەو قەدەرە بێت کە بێ ویستی خۆم رژایە دنیای بێدەنگی منەوە کەسێک لە مندااڵییەوە چاوشارکێ لەگەڵ ئەستێرەومانگ بکات و خولیای گەیشتن بێت بەوان ئیدی چۆن لە دەریایی مەنگی شیعردا نوقم نابێت، ئاشناییم لەگەڵ شیعردا دەگەڕێتەوە بۆ ئەو رۆژانە لە عیشقی شیعردا فێری ئەلف و بێی کوردی بووم.

پەیامی کورد: دەقە شیعرەکانی تۆ زیاتر باس لە چی دەکەن؟

چنار: لەدەقەکانمدا پرسیارگەلێکی ئەزەلی بەدی دەکرێت کە لە پرسە سروشتییەکانەوە سەرچاوەی گرتووە و لە ناتەبایی بوونەوە خۆی دەنوێنی، ئەو نایەکسانییە کە لە بوونداا بەرچاوە هەر لە ناتەبایی وەرزەکان و ناتەبایی زەمەن و نائاسایی دابەشبوون، بەشێوەکی دیار پرسی مەرگ و لە دایکبوون، پرسی پشکوتنی گوڵ و هەڵوەرینی گەڵاکان لە وەرزی پایز، پرسیارگەلێکە هەمیشە لە منداا رەنگدەداتەوە ئەو خەمانەی کە هەمیشە بێ چارەسەر دەمێننەوە بۆیە لە شیعردا دەڵێم: بۆ ئاسمان شەو پرچی رەشەو بە رۆژ سپی دەکاتەوە خەم کە دەگری بۆ چاوی سوور دەبێتەوە شادی بەچی پێدەکەنێت.

پەیامی کورد: بۆچی ئافرەتی بەناوبانگ کەمن لەناو مەیدانی ئەدەب و هونەر بەگشتی و شیعر بەتایبەتی ؟

چنار: بەو پێیەی لە کۆمەڵگایەکی رۆژهەڵاتیدا دەژین ئافرەتانمان گوشەگیرن و سڵ دەکەنەوە بچنە نێو هەندێ لە نێوندەکانەوە یاخود دەتوانین بڵێین زۆرێک لە ئافرەتانمان رەنگە ئەدەب و هونەر نەبووبێت بە خولیایان و نایانەوێت خۆ لەقەرەی ئەو مەسەلانە بدەن، لەگەڵ ئەوەشدا ئافرەتی نووسەر و ناودارمان هەیە.

پەیامی کورد: چنار و ژن، تۆ و سروشت، شیعر بۆ کێ دەڵێیت؟

چنار: بەو پێیەی شیعر لایەنە ستاتیکییەکان لە خۆ دەگرێت دەکرێت ئافرەتیش وەکو تێکڕای بوونەوەرە جوانەکانی دیکە لە شیعرییەت بێبەش و پەراوێز نەکرێت، بێگومان خوێنەر ئازادە و مافی خۆیەتی بەپێی هزر و تێفکرینی خۆی خوێندنەوەی تایبەتی هەبێت بۆ مەسەلەکان، وەدەقی نوێ فرەرەهەندە بۆیە پێم وانییە شعرو جوانی و سروشت هەمویان زادەی خەیاڵی شاعیرن.

پەیامی کورد: لە ساتی نووسین وپاش کۆتایی هاتن بە نوسینی شیعرێک هەست بە چی دەکەیت؟

چنار: شیعر ئەو جیهانەیە سەراسیمەم دەکات و بەرەو پرسیارە یاساغەکانی بوونم دەبات و هەمیشە لە خەم و ناسۆر و خەندەکانی نوقمم دەکات ئیدی ئەو ژانە شیعرانەی کە لە کاتی شیعر نووسیندا کە نەست و هەستم دادەگرن، نازانم چیی ناوێکی لێبنێم. لای من لەدایک بوونی شیعرێک هیچی کەمتر نییە لە لەدایکبوونی کۆرپەکەم، رەنگە پێشوازی ئەو میوانە تازیزە ئەو پەڕی ئاسوودەییم بێت.

پەیامی کورد: چنار تاچەند توانیویەتی پەیامی خۆی بگەیەنێت؟

چنار: شیعرم بۆ سروشتە بۆ مرۆڤایەتییە، بۆ جوانییە شیعر ئەو هاودەمە روحییەیە کە هەمیشە لێم جودا نابێتەوە شیعر ئەو ئەوینە بەسۆزەیە کە ناتوانم دەسبەرداری بم زۆر جار پێم وایە شیعر من دەڵێت، من پێم تاوانە زۆر لە شیعر بکەم، لە نووسینەوەی، بۆیە بە هەمیشەیی لەسەر خۆم لە شیعر نووسیندا و پەلە لە شیعر ناکەم، چونکە گەر شیعر کرا بەسەنعەت ئەوە چێژ و شەفافییەتی خۆی لەدەسدەدات پاشانیش رەنگە زیز ببێت.

پەیامی کورد: شیعرەکانت تاچەند بوون (وجودای تۆیان سەلماندووە وەک ئافرەتێک؟

چنار: دەکرێت خوێنەر بڕیار لەسەر ئەو مەسلانە بدات، چونکە دوور بینی چاوی ئەوان شتەکان جوان دەبینێت، هەر لە روانگەی ئەوانیشەوە بەپێی ئەوەی پێمدەگاتەوە، بەپێی پەیامی ئەوان کە دوور لە موجامەلە بۆم دەنێرن، بەهەمیشەیی لە ریگەی (E-mail)ەوە دەستخۆشیم لێدەکەن، نامەکانیان جێگای ڕێز و سوپاسمە، دیارە ئەوان خوێنەری جدین و تامەزرۆی راستەقینەی ئەدەبن هەر بۆیە بە دووی بەرهەمە ئەدەبییەکاندا گەڕیدە و وێڵن. پێم خۆشە خوێنەران ئاگادار بکەم کە دەتوانن لەلاپەڕەی تایبەتی خۆم لە مااڵپەڕی (کوردستان نێت) بەرهەمەکانم بخوێننەوە بەم ئەدریسە: **www.kurdistannet.us/chnar** .

پەیامی کورد: بۆچی زۆرجار ئافرەت شیعر دەڵێت و دەنووسێت، بەاڵم دوای ماوەیەک ون دەبن و ناویان نامێنێت ؟

چنار: دەشێ بڵێم ئەو جۆرە حاڵەتانە بەتەنها لای ئافرەتەوە نییە بەڵکو زۆرێک لە پیاوانیشی گرتۆتەوە، رەنگە شیعر لای ئەو کەسانە خولیایەکی راستەقینە نەبێت، یاخود دەکرێت بڵێن حەز و هەڵچوونێکی هەرزەکارانەیە کە لە شکستی عاتیفە و حەزە خەفەکراوەکاندا سەرچاوەی گرتبێت هەر بۆیە بەچارەسەربوونی کێشەکە و نەمانی کاریگەرییەکان لە شیعر نووسین دەچنەوە و ئیدی مەلی شیعر هەڵەتە دەبێت و سەر بە مااڵیان ناکات.

پەیامی کورد: دەڵێن سەردەمی شیعر بەسەرچووە، راستە؟

چنار: شیعر جۆرە خزراکێکی رووحی مرۆڤە خولیادار و ئارەزوو مەندانییەتی، بۆیە هیچ کاتێ سەردەمی بەسەر ناچێت بێگومان رەوتی ژیان پێویستی بەهەموو لایەنێکە شیعریش بەشێکە لەلایەنە پێویستەکانی ژیان.

پەیامی کورد: دەزگاکانی راگەیاندن تاچەند بایەخ بە (ئافرەتی شاعیر) دەدەن ؟

چنار: بەرەو پێشچوونی تەکنەلۆژیایی نوێ وایکردووە، سەردەمی ئەوە بەسەر بچێت کە نووسەر چاوەڕوانی ئاوردانەوەی هیچ دەزگایەکی راگەیاندن بکات ئیستا ئەتەرنێت ئاسانترین هزکارە بۆ بڵاوکردنەوە و ئاشنابوون بەجیهان لە کورتترین کاتدا، هەر چەندە دەزگاکانی راگەیاندن کەمتەرخەمییان نەکردووە لەو بارەیەوە. ■■■■

شەپۆلێکی نوێ لە فیلمی سێ ڕەهەندی بەڕێوەیە!



بەپێی تازەترین هەواڵی هونەری، هەردوو دەرهێنەری بەناوبانگ، جۆرج لۆکاس و جیمس کامیرۆن، خەریکی ئەوەن کە شەپۆلێکی نوێ لە فیلمی سێ ڕەهەندی بهێنەئاراوە. هەر بەم ئاراستەیەش ژمارەیەک لەو فیلمە ناودارانەی وەک "شەڕی ئەستێرەکان" **Stars wars**، و"پاشای موستیلەکان"**Lord of the Rings**"دووبارە لە ڕێگەی تەکنەلۆجیای وێنەگرتنی بەرجەستەی تازەوە دەگۆڕدرێن بۆ فیلمی سێ ڕەهەندی کە بینەران ڕاستەوخۆ دەیبینن و پێشبینی ئەوەش دەکرێت کە ئەم فیلمانە "دوای گۆرانکاری" قازانجێکی لەڕادەبەدەر بەدەست بێنن. ئەم تەکنەلۆجیایە بینەران دەخاتە ناو جەرگەی ڕووداوەکانەوە هەروەک چاوەڕوان دەکرێت لە فیلمی"پەڕی شەڕەکان"**Battle Angel** لە دەرهێنانی جیمس کامیرۆن کە لە ساڵی ٢٠٠٧دا نمایش دەکرێت. لە ڕاستیشدا فیلمی سێ ڕەهەندی لەسەر بنچینەی پەرەسەندنێکی گرنگ لە بواری پێشەسازی سینەماوا هاتۆتەکایەوە کە پێی دەگوترێت"سینەمای دیجیتاڵی". ئەم شێوازەش فیلمەکان لەسەر شاشە بەپێی دۆبێیی ژمارەیی نمایش دەکات بەپێچەوانەی فیلمە کۆنەکانەوە، لەم سیستەمە نوێیەشدا هەر یەکەیەک سەد هەزار دۆلاری تێدەچێت. کۆمپانیاکانی هۆلیود پشتگیری لەم جۆرە شێوازە تازەیە دەکەن، بەتایبەتی لە ڕووی ئەوەوەی کە گواستنەوەی ئەم جۆرە فیلمانە لەسەر کۆمپانیاکان هەرزانتر ڕادەوەستێت، چونکە بە ئاسانی لە ڕیگەی مانگە دەستکردەکانەوە دەگوێزرێتەوە. جێگەی ئاماژە پێدانە کە گۆرینی هەر فیلمێکی کۆن بۆ سەر ئەم شێوازە تازەیە نزیکەی٤/٥ ملیۆن دۆلاری تێدەچێت. پێشبینیش دەکرێت کە کۆمپانیاکانی هۆلیود لە ڕیگەی ئەم تەکنەلۆجیا تازەوە قازانجێکی یەکجار زۆر بەدەست بێنن. ■■■■

درامانووسانی جیهان

مەهدی مێبد یاف

٢٧ـ مۆریس مێتێرلینک Maeterlinck



مۆریس پۆلیدور مێتێرلینک، لە بیست و نۆیەمی مانگی ئۆکۆستی١٨٦٤ دا، لە شاری گاند لە بەلجیکا لەدایکبووە. ژیانی منداڵییەتی بە هێمنی و ئاسوودەیی دەباتەسەر، باوکی یەکێک لە دەوڵەمەندەکانی ئەو ناوچەیە دەبێت. زمانی ئەڵمانی و فەرەنسی و لاتینی فێردەبێت و پاشان لە قوتابخانەیەکی ئایینیدا لای مامۆستایانی قەشە یەسوعییەکان وانەکانی ئەدەبییاتی کلاسیک و زانستە ئایینییەکان دەخوێنێت و خولیا و ئاشنای شیعر و ئەدەبییات دەبێت. باوکی هانی دەدات کە لە بەشی یاسا بخوێنێت، ئەویش بێ ئارەزووی خۆی فەرمان و پلانی خێزانەکەی بەجێدێنێت و پاشانیش وەک دادوەر لە دادگا کار دەکات. زۆر نابات لێ سارد دەبێتەوە و خولیا و شەیدای ئەدەبییات دەبێت و ڕێی فەرەنسا دەگرێتەبەر، لە پاریس بە شاعیرانی بزووتنەوەی سمبۆلیزم ئاشنا دەبێت و بڕیاری بڵاوکردنەوەی گۆڤارێکی ئەدەبی بەناوی(پلێیاد) دەدەن و حەوت ژمارەی لێ بڵاودەکەنەوە. لە ساڵی ١٨٨٩دا، دیوانە شیعرێک بەناوی(گەرماو) بڵاودەکاتەوە، ساڵی ١٨٩٠، شانۆنامەی (ئازاردەر) و (کوێرەکان) و (ماليني شازادە) دەنووسێت. پاش ماوەیەک مێتێرلینک بۆ بەلجیکا دەگەڕێتەوە و کاری دادوەری ـ لە دادگاکاندا ئەنجام دەدات. لە ساڵی ١٨٩١دا، بە هاوکاری هاوڕێکانی ڕێکخراوێکی ئەدەبی و هونەری دروست دەکەن و پاشانیش ئەو ڕێکخراوە دەبێتە مەڵبەندی ڕێبازی سمبۆلییەکان و لە هەمان ساڵدا شانۆنامەی(حەوت خانمە شازادەکان) دەنووسێت. لە ساڵی١٨٩٣دا شانۆنامەی(پێلێەس و میلیزاند) و، لە ساڵی١٨٩٤دا، شانۆنامەی(عەلادین و دزەکان) و، لە ساڵی١٨٩٦دا، شانۆنامەی(ئاگلاڤێن و سێلیستی) و، لە ساڵی١٩٠١دا، شانۆنامەی(ئاریان و پیاوی ڕیش ئاوی) بڵاودەکاتەوە. لەساڵی١٩٠٢دا، شانۆنامەی(موناوا) دەنووسێت و لەسەر شانۆی لۆفێر نمایش دەکرێت. لەدوابیشدا شانۆنامەی(ژوزێل) دەنووسێت. ئەوەی شایەنی باسە ئەم نووسەرە مەزنە بۆ ماوەیەک دەست لە نووسینی دراما هەڵدەگرێت و بە خوێندنەوە و لێکۆڵینەوەی زانستەکانی تر سەرگەرم دەبێت و زۆربەی کاتەکانی خۆی بۆ لێکۆڵینەوە لەسەر ژیانی گیانلەبەران و مێرووەکان تەرخان دەکات. یەکەمین کتێبی فەلسەفی سەبارەت بە(هۆشی گوڵەکان)دەنووسێت و جێی ڕەزامەندی خوێنەران دەبێت. پاشان بۆ گۆڕەپانی پیرۆزی شانۆ دەگەڕێتەوە و لە ساڵی١٨٩٢دا، شانۆنامەی بەناوباگی(باڵداری ئاوی)دەنووسێت و هونەرمەندی بەتوانای ڕوس - ستانسلاڤسکی ـ لەسەر شانۆی مۆسکۆ ڕیژیسۆری دەکات و سەرکەوتنێکی مەزن بەدەست دێنێت. پاش نووسینی شانۆنامەی(باڵندە ئاوی)ش بۆ سەر چەند زمانێکی جیهانی وەردەگێڕدرێت. بەلجیکا بێئاگایەنی خۆی لە سەرەتای دەستپێکردنی شەڕی شوومی جیهانی یەکەم، ڕادەگەیێنێت، لەگەڵ ئەوەشدا بەر هێرشی سوپای ئەڵمانیا دەکەوێت، ئەو کاتە مێتێرلینک لە تەمەنی پەنجا و دوو ساڵیدا دەبێت، داوای لێدەکرێت بەشداری لە شەڕەکەدا بکات، بەاڵم بەهۆی لاوازی لەشییەوە توانای نابێت، ئەویش نایکاتە نامەردی و پێتووسەکەی دەخاتەکار بۆ خزمەتکردنی وڵاتەکەی. شانۆنامەی(ستیلموندی پارێزگار) ڕەنگدانەوەی ئەو بەرگریکردنەیە. لە ساڵی١٩٢٠دا، ڕێکخراوێکی کولتوری لە بەلجیکا دادەمەزرێت و مێتێرلینک یەکێک لە ئەندامەکانی دەبێت و لە ساڵی ١٩٣٠دا، لە بناری شاخێکدا کۆشکێک دەکرێت، بە هیوای ئەوەی بە بەختیاری و ئاسوودەیی تیایدا بژی، بەاڵم بە دەستپێکردنی شەڕی شوومی جیهانی دووەم جارێکی تر مااڵوێرانی و ئاوارەیی دەست پێدەکاتەوە و مێتێرلینک بۆ وڵاتی پورتوگال سەفەر دەکات و پاش ماوەیەک کۆچ بۆ ئەمریکا دەکات و لەوێ شانۆنامەی(ژان دارک) دەنووسێت. تا ساڵی١٩٤٧، لە ئەمریکا دەمێنێتەوە. کاتێ بۆ وڵات دەگەڕێتەوە، لە تەمەن٨٥ ساڵیدا دەبێت. لە شانۆنامەکانی تری وەک شانۆنامەی(نەگبەتی بەسەر دەچێت)، (هێزی مەرگ)، (ماری مەکدالین)، (مااڵی ناوەوە) و(مردنی تینتاژیل) بڵاودەبنەوە و ناو دەردەکەن. مێتێرلینکی گەورە شاعیر و درامانوس و فەیلەسوف لە مانگی مایی١٩٤٩دا، لە تەمەنی حەفتا و هەشت ساڵیدا بە نەخۆشی وەستانی دڵ کۆچی دوایی دەکات و بە پێی وەسیەتنامەکەی لاشەکەی دەسووتێنن و زوخاڵەکەی لە ماڵەکەیدا دەنێژن.■■■■

رۆڵی بارزانییەکان لە کۆماری کوردستان و بزووتنەوەی رزگاریخوازی کورد دا

حامید گەوهەری

بەشی دووهەم

ئەم وتارەم لە رۆژی ٢٠٠٥/٣/٢٧ لە کۆڕێکدا بۆ یادی ١٠٢ ساڵەی لەدایکبوونی "بارزانی نەمر" لە مەڵبەندی کولتوری کوردی شاری کۆپنن، پێشکەشکرد.(ح.گ)



شەڕی بەرگریکەرانەی بارزانییەکان لە کاتێکا ئەنجامیان دەگرت، کە نەخۆشی گرانەتا وەک گەلای دار بارزانییەکانی دەوەرانده سەر زەوی و رۆژ نەبوو کە چەند کەسیان نەمرێت. لە شەش مانگی یەکەم هەتا کۆتایی ساڵی ١٩٤٦، نزیکەی ١٥٠٠-٢٠٠٠ بارزانی بە ژن و منداڵەوە مردن و هیچ گوندێکی ناوچەی بۆکان، مەهاباد، نەغەدە و شنۆ نەبوو کە گۆرستانێکی تایبەت بە بارزانییەکانی لێ نەبێت. کەچی بارزانییەکان لەگەڵ ئەوەشدا قورسایی ئەرکی مەزنی خۆیان هەڵگرت، کە پاراستنی کۆمار بوو، خەڵکی رۆژهەڵاتی کوردستان ناوی گۆڕی غەریبانیان لەسەر ئەو گۆڕانە دانابوو و دەچوون زیارەتیان دەکردن.

شەڕی مامەشا و قاراوە بە دوژمنی سەلماند کە بە ڕێگای شەڕ ناتوانێ چڕک بە گەلی کورد دابدات. بۆیە بە فێڵ و تەڵەکە ڕێگای وتوێژی لەگەڵ ڕێبەرانی کۆماری گرتەبەر، بەو هیوایە کە سوپای سۆڤێت ئێران بەجێبهێڵێ و دەستی سوپاکەی بۆ پەلاماردان و لێدانی گەلی کورد و ئازربایجان بکرێتەوە. بەم مەبەستە، کەڵکی لە دوو سیاسەت وەرگرت:

یەکەم: پتەوکردنی پێوەندی خۆی بە سەرۆک هۆزە خۆبەدەستەوەدەرەکانەوە.

دووەم: وەستاندنی شەڕ بە ڕێگای وتوێژ لەگەڵ ڕێبەرانی کۆماری کوردستاندا.

قازی محەمەد ڕۆژی ١٩٤٦/٦/١٦ چاوی بە ژەنەراڵ ڕەزم ئارا کەوت و لەسەر چەند خاڵێک لەگەڵی ڕێککەوت و دوایی لە ١٩٤٦/٦/٢١ چووە تاران و قەوام سەڵتەنەی بینی کە سەرۆک وەزیرانی ئێران بوو. قەوام بە قازی محەمەدی ڕاگەیاند؛ کە دەیەوێ لەشکری ئێران بگەڕێنێتەوە سەر دۆخی بەر لە یوڵی ١٩٤١ واتە بەر لە داگیرکردنی ئێران لە لایەن هاوپەیمانانەوە، ئەمە بەم واتایە بوو کە دەیانەوێ سوپای ئێران بگەڕێنەوە مەهاباد. تەنانەت ئەوەشی ڕاگەیاند کە دەیانەوێ کوردستانی ئێران لە هەرێمێکی جوگرافییدا کۆبەنەوە و پێشنیازی بە قازی کرد، کە بەرپرسیارێتی هەرێمی کوردستان لە ئەستۆ بگرێت. دوای گەڕانەوەی پێشەوا قازی بۆ مەهاباد، هەل و مەرجی کوردستان گۆڕا. ئەگەر تا ئەو کاتە فەرماندەکانی سوپا و کاربەدەستانی حکومەتی ئێران بۆ جێبەجێکردنی پیلانەکانیان بەشێوەی نهێنی پەیوەندییان بە سەرۆک عەشیرەتە جاشەکانەوە دەگرت، لەمەودوا بە شێوەی ئاشکرا پیلانەکانیان بە ڕێگای بەرپرسانی حیزبی و حکومەتییەوە بە ئەنجام دەگەیاند. لەو پێوەندییەدا بوو کە محەمەدی نانەوازادە فەرماندەی لەشکری 3ی هێزی ناوەندی کۆماری کوردستان سواری فڕۆکەی دوژمن بوو و ڕۆژی ١٩٤٦/٢/١٧ کاتی گەڕانەوە لە بانەوە بۆ سەقز، فڕۆکەکەی بە ڕواڵەت سووتا و لە نزیک کەلی خان کەوتە خوارێ و شەهید بوو. کردەوەی ڕێبەرانی کۆماری کوردستان، کاردانەوەی ڕاستەوخۆیان لەسەر چالاکی بارزانییەکان هەبوو، دەکرێ بڵێین کۆماری کورستان کە ڕۆژگارێک جێگای هیوا و ئومێدی کوردی هەموو بەشەکانی کوردستان بوو، بەرە بەرە لە بەرانبەر پیلانگێڕییەکانی دەوڵەتی ئێران تاقەتی لێبڕا، سوپای ئێران بە یارمەتی جاش و جاسوس و سەرۆک عەشیرەتە خۆ بەدەستەوەدەرەکان، ژێر کۆماری کۆڵی، ئەگەر سەردەمێک کۆماری کوردستان لە توانایدا هەبوو سەقز، بانە و سنە و سەردەشت ئازاد بکات و تەنانەت بەشێک لە ڕێبەرانی بارزانییەکان بیری ئازادکردنی بەشەکانی دیکەی کوردستانیان لە مێشکدا بوو، ئیتر ئەمرۆ کەوتبوونە ناو هەل ومەرجێکەوە کە توانای پاراستنی کۆماریشیان نەبوو، پێشەوا قازی محەمەد، بەرپرسیاریێتییەکی مەزنی کەوتبووە سەرشان، جگە لە ژمارەیەکی کەم لە کاربەدەستانی کۆمار و بارزانییەکان کەسی تری بە دەورەوە نەمابوو و مان و نەمانی بە مانەوەی سوپای سۆڤێت لە ئێران بەسترابووەوە، کەچی سوپای سۆڤێت لە سێپتەمبەری ١٩٤٦ دا کوردستان و ئازربایجانی بەجێهێشت و گەڕایەوە. پاشەکشەی سۆڤێت لە کوردستان و ئازربایجان و هەڕەشەی قەوام سەلتەنە، ڕێبەرانی کۆماری کوردستان و ئازربایجانی ناچارکرد، کە مەسەلەکە زۆر بە جیددی بگرن، لەبەر ئەوەی ڕۆژی ١٩٤٦/١٠/١٦ پەیمانێکی سەربازی هەشت خاڵەیان پێکەوە مۆرکرد. لە خاڵی چوارەمی ئەو پەیمانەدا، سەرۆک مستەفا بارزانی بە سەرۆکی گشتی هێزە هاوبەشەکانی کۆماری کوردستان و ئازربایجان لە بەرەی شەڕی سەقز هەڵبژێردرا، هەرچەندە بارزانی دەیزانی مۆمی ژیانی هەردوو کۆمار بەرەو خامۆشی دەچێ بەو حاڵەش بۆ ڕاگرتنی وەرەی ڕێبەرانی کورد و ئازربایجان ئەو بەرپرسیاریتییەی قەبوڵ کرد، بەڵام ئیتر کار لە کارترازابوو. دوای دوو مانگ ڕێبەران کۆماری ئازربایجان ڕایانکردە باکۆ و سوپای ئێران گەیشتە تەورێز. ڕۆژی ١٩٤٦/١٢/١٦، بارزانی چاوی بە پێشەوا قازی و لێپرسراوانی کۆمار کەوت، لەوێ بۆی دەرکەوت کە هیچ کام لە لێپرسراوانی مەهاباد نیازی بەربەرەکانی سوپای ئێرانیان نییە و هەموویان خۆیان بەدەستەوە دەدەن. ئنجا بارزانی بە تەنیا قازی محەمەدی بینی و لێی پرسی دەتەوێ چی بکەیت؟ پێشەوا لە وەڵامدا دەڵێ: دەمەوێت خۆم فیدا بکەم، بۆ ئەوەی خوێنی خەڵکی مەهاباد نەڕژێ ، خۆم بەدەستەوە دەدەم، تەنانەت بەم مەبەستە پەیوەندیم بە ژەنەراڵ هومایۆنییەوە کردووە، لەو کاتەدا فرمێسک لە چاوەکانی قازیدا قەتیس دەبێ، بە بارزانی دەڵێ" جگە لە پیاوەکانی خۆت پشت بەکەس مەبەستە، زۆرن ئەوانەی سوێندیان بۆ من خواردە، کەچی ئێستا بۆ خزمەتی سوپای ئێران پێشبڕکێیانە، هەروەها دەمەوێ لە سەرۆک هۆزەکان وریابی و بڕوایان پێ نەکەی، تکاش دەکەم بە زووترین کات مەهاباد بەجێبهێڵە تا لێرەدا لەگەڵ لەشکری ئێران بەگژ یەکدا نەچن، لە خوا دەپاڕێمەوە بتپارێزێ و سەرکەوتووبی، با ژیانی من فیدای هاونیشتمانەکانم بێت و بێتە هۆی دوورخستنەوەیان لەو بەڵایەی هەڕەشەیان لێ دەکا. دوای ئەوە ئاڵایەکی کوردستان لە گیرفانی دەردێنێ و دەیداتە دەست بارزانی و پێی دەڵێ: ئەمە ڕەمزی کوردستانە،دەتدەمێ وەک و سپاردەیەک لات بێت، چونکە پێموایە تۆ لە هەموو کەس باشتر پارێزگاری دەکەی.

بنەماڵەی بارزانییەکان لە ناوچەی مەهاباد و بۆکانەوە دەبەن لە نەغەدە و شنۆ و گوندەکانی نزیکیان کۆیان دەکەنەوە و شێخ ئەحمەدیش دەگاتە شنۆ، کۆبوونەوەیەک لەگەڵ سەرکردەکان پێک دێنن، بڕیار دەدن دوو هێڵی بەرگری لە نێوان نەغەدە و مەهاباد و دوو هێڵی بەرگریش لە دۆڵی بەراندز و دۆڵی قاسملوو دانێن و هەتا بۆشیان دەکرێ بەهۆی سەرماوسۆڵی زستان، خۆ لە تێکهەڵجوونی هێزەکانی جاش و سوپای ئێران بپارێزن. دیارە سوپای ئێرانیش ئەزموونی شەڕی بارزانییەکانی هەبوو و خۆی لە قەرەیان نەدەدا. ڕۆژی ١٩٤٦/١٢/١٧ سوپای ئێران بە سەرۆکایەتی سەرهەنگ "غەفاری" مەهابادی داگیرکرد. پێشەوا قازی لەگەڵ محەمەد حوسێن خانی سەیفی قازی و سەدری قازی، چەند ڕۆژ دوای جێگیربوونی لەشکری ئێران لە مەهاباد دەسبەسەر کران و بەیانی ڕۆژی ١٩٤٧/٣/٣١ لەوجێیەی کەکۆماری دیموکراتی کوردستانیان لێ دامەزراندبوو، لە سێدارە دران. دوای کشانەوەی بارزانییەکان لە مەهاباد ڕژێمی ئێران دەیویست بارزانییەکان چەک بکات و لە هەمەدان نیشتەجێیان بکات کە سەرنەکەوت و بارزانییەکان ڕۆژی ١٩٤٧/٤/١٠، بەگوێرەی بڕیاری سەرکردەکەیان گەیشتنە سەر سنووری دەستکرد و لە ڕوباری گادەر پەڕینەوە و بۆ خۆڵقاندنی حەماسەیەکی تر، کە میژووی گەلی کورد شانازی پێوە دەکات، بە شێوەی کاتی ئێرانیان بەجێهێشت. دەوڵەتی ئێران لە ڕاپۆرتێکیدا، ناوی ئەو هێزانەی دەنووسێ کە بۆ سەرکوتکردنی بارزانییەکان و گرتنی مستەفا بارزانی ڕەوانەی کردبوون، ئەوانە بریتیبوون لە: هەنگێک و دوو گورهانی سواڕە، ١١ گوردانی پیادە، ٣ دەستەی خۆمپارە هاوێژ، ١٤ دەزگای تانک، گورهانێک و دوو دەستە تۆپخانەی ٧٥ ملم، دوو دەستە ڕەشاش، ١٢٥ سوارەی چەکدار لە عەشیرەتەکانی هەرکی و بەگزادە، کە ژمارەی گشتی ئەو هێزانە پتر لە پێنج هەزار چەکدار بووە و سەرهەنگ

بۆ لاپەڕەی ٧

ئایا عێراق دیموکراتییە؟

غازی حەسەن - ئەمریکا



کورد یەکێکە لە لایەنە سەرەکییەکانی پێکهاتەی دەسەڵاتی سیاسی لە عێراقدا کە ڕۆژانێک لە ئێمە بە عێراقی نوێ ناوی دەبات. لەتەک هێزداری وخۆسازی کورد دەگەڵ ڕوداوەکانی ناو عێراق، هێشتا ڕێگەکانی بەردەم دیموکراسییەت یەکلا نەبوونەتەوە، چونکە مەسەلەی سەرەکی کە دەستورە لەبەردەم ململانێیەکی دژوار دادەبێت.

لێرەوە دەڤێت دەرهەقی سۆزی دیموکراسی هەندەک سەرنج و تێروانین دەربارەی هەڵومەرجی ئێستای عێراق بخەینە ڕوو،لە نێویاندا دەستنیشانکردنی مام جەلال لە لایەن کورد بۆ نوێنەرایەتی کردنی کورد لە دەسەڵاتی فەرمانڕەوایی لە بەغدا و دواتر هەڵبژاردنی لە لایەن کۆمەلەی نیشتیمانی بۆ سەرۆکایەتی عێراق، یەکێکە لە نیشانەکانی نزیک کەوتنەوە لە دیموکراتییەت و هەنگاوێکیشە بەرەو ئاسۆیەکی نوێ. بەڵام وەکو هەندێک لایەن باسی لێوەدەکەن کۆتایی هاتنی تەواوی شتەکان نییە، بەڵکە دکارین بێژین تەنێ هەنگاوێکە بەرەو دیموکراتییەت، تەنیا هەنگاوێکە و بە س!!!. لەم ڕۆژانەدا بە هۆی وەدەست هاتنی ئەم دەسکەوتە مەزنە، گەرەکمانە هەندێک لە دۆزە بنەڕەتیەکانمان لە بیر دەرچێت، لایەنی کورد لە خۆشی و تەنیا لە خۆشی بەدەستهێنانی سەرۆکایەتی عێراق بە دیموکراتی ناودەبات، بە دیموکراتی ناوهێنانی عێراقیش ناراستە وخۆ بە دیموکرات نێوبردنی عەرەبی نارازییە لە پێشکەوتنەکانی کورد.

بۆیە دەبێت کورد لە سەرکەوتنەکانیدا زێدەڕۆیی نەکات و لە ململانێی و خەباتیش بۆ دەستهێنانی مافەکانی پێویستە دەسبەردارى مافەکانی نەبێت لەپێناو هەندێک مافی بچوک وکاتی. ڕاستە دەست خستنی سەرۆکایەتی لە عێراقدا ڕووداوێکی مێژوویی و سیاسی سەردەمانەیە، بەڵام دەبێت ئەمی هەمی تێبگەین کو ئەف پێنگافە لە سایەی بوونی ئەمەریکا و لەژێر ڕۆشنایی بەرنامەی ئەمەریکی هاوپەیمانەکانی بەدەست هاتووە نەک مرۆڤدۆستی و واقیعبینی عەرەبی عێراقی. کەوایە دەبێت وریای ئەوە بین کە عێراق دیموکراتی نییە، بەلکە لەسەر ڕێگەی بەرەف دیموکراتی بوونە. دیارە لناف بەری دیموکراتی بوون و چوون بەرەف دیموکراتی ژی بوونیش جودایی و نابەرابەرییەکی دیار وبەرچاف هەیە.

خەونە، کە کورد بەرامبەر جەلادەکانی پڕستی سەرۆکایەتی دەولەتێکی بەرکەوت، کرادارێکی مێژوو کردە کە کوردێک کار بۆ یەکخستنەوەی عێراقێک لەسەرلێواری لەتبوون و لێکدابڕان بکات و جەلادەکانیشی لە جەنگی دەروونی نێوەخۆییدا لە زیندانەکاندا بتڵێنەوە.

من وای دەبینم پێویستە کورد بانگەشەی عێراقێکی دیموکراتی و مافی مرۆڤ تێدا پارێزراوو یاسایی و ئازاد بکات و هەلی چەسپاندنی ئازادی ڕادەربڕین و چاپ و بڵاوکردنەوە و ڕێزگرتنی یەکترو سرینەوەی فکرو ئایدۆلۆژیای شۆڤینی و دیکتاتۆری بدات، هەوڵی بەدیهێنانی دەستورێکی دادوەرانە لەپێناو چەسپاندنی مافی کوردو نەتەوە و ئایینەکانی تر بدات. یانی بەڕاستی کورد دەبێت نوێنەرایەتی دیموکراتیەت و ئازادی و سەربەستی بکات. بۆیە نابێت خۆمان دەسخەڕۆ بکەین و بە لایەن و کەسانێک بڵێین دیموکرات وئازادو داکۆکیکەر لە مافەمەدەنی و دیموکراتییەکان، کە هێشتا لەسەرەتای ڕێگەدا هەندێکیان بە ڕاشکاوی نیگەرانی و دووڵی خۆیان لە هەمبەر پایە و شوێنی کورد لە عێراقی هاتوو دەردەبڕن. کە ئەمەش بەلگەی نادیموکراتی بوون و بااڵدەستی پاشماوەی شۆڤینیەت و بیرتەسکی و بەرچاوتەنگی شۆڤینیانە و بیرتەنگی گروپە ئیسلامییە مەزهەبی و توندڕۆکانە.

لە کردەوەدا عێراق هێشتا بەلگەیەکی سەرەکی دیموکرات بوونی لە بەردەم داماوە، ئایا خەڵک لە ئەنجامی دیموکراتی بوونە مام جەلالیان قبوڵە یاخود لە ئەنجامی ڕێکەوتنێکی سیاسی نێوان گروپەکان بە تایبەتیش کورد و شیعە ئەم دەرەنجامە هاتووە،لامان ڕونە پڕۆسەیەکی سیاسی و ڕێککەوتنێکی پێشوەخت لە نێوان کوردو شیعە پڕۆسەکەی بەڕێوە بردووە، بۆیە ناکرێت بڵێین مەسەلەی دیموکراتیەت لە عێراق کۆتایی هاتووەو ئێمە لە کەشێکی دیموکراتی یەکلاکەرەوە دەژین. بەپێچەوانە هێشتا گروپە توندڕۆ پاشماوەکانی فکری شۆڤینی بەعس وَ ئیسلامییە توندڕۆکان کە لەسەر بنەمای نەتەوەیی و زمانی عەرەبی خۆیان پف دەدەن، ڕۆلێکی نێگەتیڤانە لەسەر دوارۆژی دیموکراتیەت دەگێڕن، من تانوکەژی ترسم لە فکری کودەتاچیانەی عەرەبی هەیە و بە دووری نازانم لە کاڤێکدا کە ئەمەریکاو هاوپەیمانان لەنێو عێراقدا نامێنن پەنا وەبەر کودەتای سەربازی و سیاسی بنەن و کورد بخنەوە پەراوێزی ڕووداوەکان.

بۆیە کورد لە پێش هەر لایەنێکی تر سوود لە دیموکراتیەت دەبینێت، بەڵام ناشبێت تەنیا لەژێر کاردانەوەی ڕووداوەکان و خۆشییەکانماندا عێراق بە دیموکرات و یەکڵابووەوە ناوببەین، نەخێر دەکرێت بڵێین عێراق هەنووکە لەسەر ڕێگەی بیناکردنی دیموکراسییەتە، مەرج نییە ئەم دیموکراتیەش لە دوارۆژدا بتوانێت درێژە بە ژیان و پاراستنی ڕێکەوتن و بەرابەری لە نێوان لایەن و پێکهاتەکان بپارێزێت. ■■■■

چلەی ماتەمینی شەهید کمال شاهین بەڕێوەچوو



"عبدالقهار رمکو" بەرپرسی "وفاق" و "یاشار کایا"

سەعات ٤ ی ئێوارەی ڕۆژی ٤/١٠ لە شاری "بۆن" ئەڵمانیا ڕێکخستنەکانی براڵی "وفاق الدیموقراطی الکردي السوري" کۆڕی چلەی ماتەمینیان بۆ شەهیدی سەرکردە کمال شاهین گرت. بەئامادەبوونی کۆمەڵێکی زۆر لە هەڤاڵانی شەهید و وڵاتپارێزان لە ڕیزەرەسمێکی شکۆدار و شایستە بەم ڕۆژە قارەمانە، سەرەتا دەقیقەیەک ڕەستان بۆگیانی پاکی شەهیدان، "ئینجا عبدالقهار رەمکو" بەرپرسی "وفاق" لە ئەڵمانیا وتارێکی بەم بۆنەیەوە ناراستەی ئامادەبووان کرد و ڕۆڵی شەهید "کمال شاهین" ی لە خەباتی گەلەکەمان بەرزنرخاند جێگەی باسە چەند کەسایەتیەکی ناسراوی وەک بەڕێز "یاشار کایا" و عاکف حسن" نوێنەری حزبە کوردستانیەکانی خۆر ئاوا بەو بۆنەیەوە وتاریان خوێندەوە و کۆرەکە ماوەی نزیکەی ٣ سەعاتی خایاند. ■■■■

www.kurdistanwar.com

بەهاوکاری حکومەتی هەرێمی کوردستان کۆنفرانسی ژنی کورد لە سوید سازدرا

هەڵکەوت زامیر - لە ژێر دروشمی(ژنانی باشووری کوردستان و بنیاتنانی کۆمەڵگای مەدەنی) و بە ئامادەبوونی پتر لە ٢٠٠ ژنی ژنی کورد و بیانی و نوێنەرانی حزب و ڕێکخراوە کوردستانییەکان، کۆنفرانسی ژنی کورد لە ستۆکهۆڵمی پایتەختی سوید بە هاوکاری حکومەتی هەرێمی کوردستان سازدرا. دوای وەستانی یەک خوولەک بۆ گیانی پاکی سەرجەم شەهیدانی کوردستان، کۆنفرانسەکە لەلایەن خەبات خان کە ژنێکە لە پرۆسەی ئەنفالەکان دەربازبووە و لە گەرمیانەوە هاتبوو، کرایەوە. داوی خوێندنەوەی وتەی کۆمیتەی ئامادەکاری کۆنفرانس، وتاری بەڕێز نیچیرڤان بارزانی سەرۆکی حکومەتی هەرێمی کوردستان لەلایەن تەها بەرواری نوێنەری حکومەتی هەرێمی کوردستان لە باکووری ئەورووپا خوێندرایەوە، کە تیایدا سەرۆکی حکومەت پشتگیری خۆی بۆ کۆنفرانس دووپاتکردەوە و داوای لە بەشداربووانی کۆنفرانس کرد کە(بە شێوەیەکی زانستییانە لە هۆکاری چەوسانەوە و دواکەوتنی ئافرەت لە کۆمەڵگەی کوردستان بکۆڵنەوە بۆ ئاشکراکردنی ئەو فاکتەرانەی کە کاریگەری نێگەتیڤیان لەسەر ڕەوشتی سیاسی و کۆمەڵایەتی و ئابووری ئافرەتان لە کوردستاندا هەیە.) لە ڕۆژی یەکەمی کۆنفرانسدا لێکۆڵینەوەی گرنگ دەربارەی پەیوەندییە خێزانی و کۆمەڵایەتییەکان و دەسەڵاتی ئابووری سیاسی ژنی کورد، هەروەها زەوشتی ژنانی ئەنفال پێشکەش کرا و دواتر گفت و گۆیان لەسەر کرا. دواتر چەند چالاکییەکی هونەری نمایشکر. ڕۆژی دووەمی کۆنفرانس چەندین بابەت و لێکۆڵینەوە سەبارەت بە کۆمەڵگەی مەدەنی لە بوارەکانی پەروەردە و یاسا، سڕینەوەی ئاسەوارەکانی بەعس لە دەزگاکانی دەوڵەت پێشکەش کرا. لە دانیشتنەکانی دوای نیوەڕۆدا فیلمێکی دیکۆمێنتاری دەربارەی ژنی کورد نیشان درا. خاتوو ئۆلا هۆفمان جێگری پارتی چەپی سوید، بابەتێکی لەسەر خەباتی ژنان لە بنیاتنانی کۆمەڵگەی مەدەنی و ئەزموونی سوید وەک نموونە پێشکەشکرد. پاشان چەند بابەتێک سەبارەت بە ڕۆڵی ژنانی باشووری کوردستان لە ڕێکخراوە مەدەنییەکاندا و ئەزموونی ژنی کورد لە سیاسەتدا پێشکەشکرا. دواتر د. خالید سالح هەڵسەنگاندنی کۆنفرانسەکەی پێشکەشکرد و لە کۆتاییدا ڕەشنووسی پەیامی کۆتایی کۆنفرانس خوێندرایەوە.

لەسەر ئەوەی ناوی (کوردستان)ی هێناوە دەسەڵاتدارانی تورک مامۆستایەکی نەمساوییان دەرکرد

Peyamner - ڕۆژنامە و دەزگاکانی ڕاگەیاندنی نەمسا ڕۆژی ڕۆژی دووشەممەی ڕابردوو بەشێوەیەکی چڕوپڕ لەسەر بەسەرهاتی ئەو مامۆستا نەمساوییە وەستان کە لە یەکێک لە قوتابخانەکانی شاری ئیستانبوڵدا و بەبێ مەبەست ناوی کوردستانی هێناوە و لەسەر ئەو (هەڵە)یەشی مافی وانەگوتنەوەی لێ سەندراوەتەوە.

وەک ئاژانسی فرانس پرێس لەزاری ئەو ڕۆژنامە نەمساوییانەوە بڵاوی کردۆتەوە، ئەو مامۆستایە لە یەکێک لە قوتابخانە دواناوەندییەکانی شاری ئیستانبوڵ و لەکاتی گوتنەوەی وانەدا ناوی (کوردستان)ی هێناوە و ئەوەش یەک شەپۆلی نارەزایی توندی لای قوتابیان و کەسوکاریان دروستکردووە و سەرئەنجام بڕێک هۆی لێسەندنەوەی مافی وانەگوتنەوە لەو مامۆستایە.

گێرهارد بیلز (تەمەن ٥٠ ساڵ) کە لە قوتابخانەی دواناوەندیی (قەدیس جۆرج) لە شاری ئیستانبوڵ مامۆستای زیندەوەرزانی بووە، بە ڕادیۆی ڤییەنای ڕاگەیاندووە کە ئەو بێ هیچ مەبەستێک لەکاتی گوتنەوەی وانەدا گەشتێکی خێزانیی خۆی بۆ ڕۆژهەڵاتی تورکیا بۆ قوتابییەکانی گێڕاوەتەوە و لەجیاتی ڕۆژهەڵاتی تورکیا ناوی (کوردستان)ی هێناوە، ئەمەش بۆتە هۆی توڕەبوونی توندی قوتابییەکانی و هەموویان لێکەوە هەستاون و هاواریان کردووە (هەموو ئەوانە دەکوژین کە کوردستانیان دەوێت).

گۆڤاری (پرۆفایل)ی نەمساوی لای خۆیەوە بڵاوی کردەوە کە بەڕێوەبەرایەتی قوتابخانەکە بیانیان لەسەر کارەکەی دەرکردووە و پێیان ڕاگەیاندووە کە بەهۆی ئەوەی هەڕەشە لە (ئاسایشی وڵات) دەکات، ڕوخسەتی کارکردنی لێدەسەنێتەوە.

ڕادیۆی ڤییەنا بۆ دڵنیابوونەوە لەو ڕووداوە، پەیوەندیی بە بەڕێوەبەرایەتی قوتابخانەی نێوبراو کرد و جێگری بەڕێوەبەر ڕاستیی ڕووداوەکەی دووپات کردەوە.

گێرهارد بیلز لەکاتی قسەکانیدا بۆ ڕادیۆکە داوای لێبوردنی لە دەسەڵاتدارانی تورکیا کرد و ڕایگەیاند کە ئەو بێ هیچ باگگراوندێکی سیاسی ناوی کوردستانی هێناوە و ڕوونی کردەوە کە ئەوە ناوی ناوچەیەکی جوگرافییە و ئەوان لە زانستی ڕووەکناسیدا خوێندوویانە.

ئەم ڕووداوە لەکاتێکدا دێت کە تورکیا لەبەر دەرگای یەکێتی ئەورووپادا وەستاوە و چاوەڕێی ڕوخسەتی چوونە ژوورەوە دەکات.

لە نێوان (پ ک ک) و سوپای تورکیا لە شرنەخ پێکدادان ڕوویدا

Peyamner _ بە پێی هەواڵی (ئاژانسی فرانس پرێس) سەرچاوەیەکی ئەمنی تورکی ڕایگەیاندووە، کە ڕۆژی یەک شەممەی ڕابردوو لە نزیک شرنەخ لە کوردستانی باکور لە نێوان چەکدارانی (پ ک ک) و دەوریەکی سوپای تورکیا پێکدادان ڕوویداوە.

سەرچاوەیەکی ئەمنییەکە ئاشکرای کرد، کە لە ئەنجامدا دوو لە چەکدارانی (پ ک ک) کوژران و کە هەندێ چەک و تەقەمەنی وەکو بۆمب و کلاشنکۆفیان لەلا بووە، بەڵام بە هیچ جۆرێ سەرچاوەیەکە باسی لە زیانی مادی و گیانی سوپای تورکیا نەکرد.

سەعدی پیرە : لەمەودوا شەڕە پەڕۆ قەدەغەیە و لە بۆنە نەتەوەییەکاندا تەنیا ئاڵای کوردستان بەرز دەکرێتەوە

Peyamner - لە کۆنفرانسێکی ڕۆژنامەوانیدا کە ڕۆژی شەممە لە بارەگای مەڵبەندی سێی یەکێتی نیشتمانیی کوردستان بۆ سەعدی ئەحمەد پیرە بەرپرسی مەڵبەندی سێی یەکێتی نیشتمانیی کوردستان لە هەولێر سازدرا، سەعدی پیرە پێی لەسەر ئەوە داگرت کە مام جەلال لە پۆستی سەرۆک کۆماری عێراقدا نوێنەرایەتی هەموو خەڵکی کوردستان دەکات و پاڵێوراوی لیستی هاوپەیمانیی کوردستان بووە، نەک تەنیا پاڵێوراوی یەکێتی. لەوکۆنفرانسەدا سەعدی پیرە لەسەرەتاوە گوتی "لە ئەنجامی پێداگیریی کورد و سەرکردایەتی سیاسیی کورد لەسەر بەدەست هێنانی یەکێک لە پۆستە سیادییەکان، توانرا پۆستی سەرۆک کۆماری عێراق بۆ کورد مسۆگەر بکرێت". هەروەها گوتی "هەڵبژاردنی مام جەلال بۆ ئەو پۆستە، ڕووداوێکی مێژوویی گرنگە بۆ کورد و بۆ مێژووی دەوڵەتی عێراقیش، چونکە یەکەمین جارە کوردێک دەبێتە سەرۆک کۆمار" هەر بۆیە، وەک ئەو گوتی "گەلی کوردستان بەهەموو چین و تۆێژێکیەوە و هەروەها سەرجەم حزب و ڕێکخراوە سیاسییەکانی کوردستان بەو بۆنەیەوە خۆشحاڵیی خۆیان دەربڕی". سەعدی پیرە ڕۆژگاری شەڕی ناوخۆی وەبیر هێنایەوە و گوتی "کورد لە ڕابردوودا بە ناکۆکیی و شەڕی ناوخۆ لەم تەپۆلکە بۆ ئەو تەپۆلکە زیاتری بەدەستەوە نەبوو، بەڵام لە ئەنجامی یەکخستنی گوتاری سیاسی کوردی و هاوکاریی زیاتری سەرکردایەتی سیاسی کورد لەنێوان خۆیاندا، توانییان پاڵێوراوی خۆیان بگەیەننە پۆستی سەرۆک کۆمار". دەربارەی هەندێ گرژی و ئاڵۆزیی کە شەڕە پەڕۆی ئاهەنگی ئەو بۆنەیە لەگەڵ خۆی هێنای، سەعدی پیرە گوتی "هەموو لایەک ئەوە دەزانین کە مام جەلال وەک پاڵێوراوی یەکێتی ئەو پۆستەی وەرنەگرتووە، تەنانەت بەڕێزیشی لە وتارەکەی خۆیدا لەنێو پەرلەمانی عێراق ئەوەی ڕاگەیاند کە بەرهەمی خوێنی شەهیدان و ڕەنجی خەباتگێڕانی کورد ئەویان گەیاندۆتە ئەو پۆستە". هەروەها گوتی "یەکێتی نیشتمانیی کوردستانیش لەوە تێدەگات کە ئەگەر مام جەلال تەنیا بە پاڵێوراوی خۆی بزانێت، هەم مام جەلال بچوک دەکاتەوە و هەم پۆستەکەش" لەکاتێکدا "مام جەلال لەو پۆستەدا نوێنەرایەتی هەموو خەڵکی کوردستان دەکات". سەعدی پیرە لە گرنگیی هەندێ وردە ڕووداوی کەم کردەوە کە لێرە و لەوێ ڕەنگە لەم ڕۆژانەدا بەهۆی ئاهەنگێڕان و خۆشی دەربڕینەوە ڕوویان دابێت و گوتی "دەمەوێت ئەوە بڵێم کە لە کۆبوونەوەی فراوانی وەکو ئەوەی ئەمجارە کرا و لەم جۆرە ئاهەنگ و خۆشی دەربڕینانەدا حەتمەن شتێک هەر ڕوودەدات، بەڵام نابێت کەس بەشێوەیەکی خراپ سوود لەو ڕووداوانە وەربگرێت، چونکە تەبایی و یەکڕیزیی کورد بەرقەڕارە و پتەوترینش دەبێت". سەعدی پیرە هەروەها ڕایگەیاند کە "ئەمە هەنگاوی یەکەمە و هەنگاو و دەستکەوتی دیکە لەدواوەیە و هێشتا زۆرێک لە خواست و هیواکانمان نەهاتوونەتە دی" و ئاماژەی بەوە کرد کە "هێشتا ناوچە تازە ئازادکراوەکان لەگەڕاونەتەوە باوەشی کوردستان" و هەروەها گوتی "کێشەی کەرکوک هێشتا چارەسەر نەکراوە و ئەمەی کراوە تەنیا زەمینەسازییە بۆ بەدەستهێنانی مافەکانی دیکەمان کە ئەوەش تەنیا بە یەکڕیزیی بەدەست دێت". بەرپرسی مەڵبەندی سێی یەکێتی لە درێژەی قسەکانیدا گوتی "دەبێت ڕۆڵی کاک مەسعود بارزانی سەرۆکی پارتی دیموکراتی کوردستان بەرز بنرخێنین کە هیچ دەرفەتێکی لەدەست نەدا جەخت لەسەر پشتیوانیی بۆ بەڕێز مام جەلال لەپێناوی گەیشتن بەو پۆستە نەکاتەوە و پشتیوانیی لەوەی کە ئەو پۆستە دەبێت بۆ کورد بێت و ئەوە نەبێتە تەقلید کە لە عێراقدا قەدەغە بێت پۆستی سیادی بەدەست کوردەوە بێت". هەروەها گوتی "٣٠ حوزەیرانی ساڵی ڕابردوو کە سەروەریی بۆ عێراق گەڕایەوە، هەردوو بەڕێزان بارزانی و تاڵەبانی لە بەغدا ڕایانگەیاند کە ئەوان ڕازین بەڕێز غازی یاوەر ببێتە سەرۆک کۆمار، بەڵام بەو مەرجەی ئەوە نەبێتە تەقلیدێک بۆ هەمیشە کە کورد مافی وەرگرتنی پۆستە باڵاکانیان نەبێت، ئێستاش پاش هەڵبژاردن دەرکەوت کە کورد هێزی دووەمی عێراقن و مافی ئەوەیان هەیە پۆستە گرنگ و باڵاکانی دەوڵەتی عێراق بەدەستەوە بگرن". لە کۆتایی ڕوونکردنەوەکەیدا سەعدی پیرە گوتی "بۆنە و ئاهەنگی دیکەی زۆرمان لەپێشە و لێرەوە دەمەوێت هەڵاڵانی خۆمان بە تایبەتی لە سنووری ڕێکخستنی مەڵبەندی هەولێر لەوە ئاگادار بکەمەوە کە شەڕە پەڕۆ قەدەغەیە و لەجیاتی ئەوە دەبێت ئاڵای کوردستان کە ئاڵای هەموانە، لەو بۆنانەدا بەرز بکرێتەوە".

جەختیشی لەسەر ئەوە کردەوە کە بەرپرسانی ڕێکخستنەکانی یەکێتی بەرپرسیارن لەوەی نەهێڵن لەهیچ بۆنەیەکی دیکەدا شەڕە پەڕۆ ڕووبدات. هەروەها گوتی "ئێمە لە خولی ڕابردووی پەرلەمانی کوردستان نەمانتوانی ئەوە بکەین، بەڵام پەرلەمانی کوردستان لە خولی داهاتوو قەدەغەکردنی شەڕە پەڕۆ بکاتە بڕیار".

پەرلەمانی تورکیا هەفتەی داهاتوو مەسەلەی قەتڵوعامی ئەرمەن تاوتوێ دەکات



Peyamner – عەبدوللا گوڵ وەزیری دەرەوەی تورکیا دوێنێ شەممە لە لێدوانێکی ڕۆژنامەوانیدا ڕایگەیاند کە پەرلەمانی تورکیا لە کۆبوونەوەی هەفتەی داهاتوویدا ڕێوشوێنەکانی بەرەوڕووبوونەوەی ئەو هەڵمەتە تاوتوێ دەکات کە لەلایەن ئەرمینیا و کۆمەڵگای نێودەوڵەتییەوە بۆ ناچارکردنی ئانکەرە لەسەر دانپێدانان بە قەتڵوعامی ئەرمەنەکاندا دەستی پێکردووە. هەرێەک لە ئەرمینیا و یەکێتی ئەورووپا و کۆمەڵگای نێودەوڵەتی، لە هەوڵی ئەوەدان تورکیا بەوە قایل بکەن کە ئەو ڕەشەکوژییەی دژی ئەرمەنەکان لەساڵانی نێوان ١٩١٥-١٩١٧دا ڕوویداوە، بە قەتڵوعام دابنێت. نەیارەکانی پەیوەستبوونی تورکیا بە یەکێتی ئەورووپاوە وای دەبینن کە یەک لە مەرجەکانی پەیوەستبوون بەو یەکێتییەوە قایلبوونە بەو پێوەرە مرۆییانەی یەکێتی ئەورووپا بۆ خۆی کردوونەتە پێوەری باڵا و بۆ وڵاتێک کە ئامادە نەبێت ڕابردووی خۆی تاوانبار بکات، پەیوەستبوونی بەو یەکێتییەوە ئاسان نییە. گوڵ لەکاتی سەردانەکەیدا بۆ جەزایر لەو بارەیەوە بۆ ڕۆژنامەوانان دوا و ڕایگەیاند؛ لە دانیشتنی داهاتووی پەرلەماندا کە تایبەت دەبێت بە گفتوگۆکردنی ڕێوشوێنەکانی بەرەوڕووبوونەوەی ئەو هەڵمەتە، ڕای خۆی دەربارەی ئەو مەسەلەیە دەڵێت. وەزیری دەرەوەی تورکیا هەروەها گوتی "دەبووایە تورکیا چالاکتر بێت و ئەو مەسەلەیە بەشێوەیەکی ئازایانەتر بخاتە بەردەم کۆمەڵگای نێودەوڵەتی تا ڕاستییەکان باشتر ببینن". شایانی باسە ئەحمەد نەجدەت سیزەر سەرۆک کۆماری تورکیا، ڕۆژی پێنج شەممەی ڕابردوو ڕایگەیاند کە وڵاتەکەی گوشارەکانی یەکێتی ئەورووپا لەو بارەیەوە ڕەت دەکاتەوە و ناچێتە ژێر باری دانپێدانان بەوەی کە ئەوەی دژی ئەرمەنەکان ڕوویداوە جەنگی جینۆسایدبووبێت. تورکیا بەشێوەیەکی بەردەوام بەکارهێنانی دەستەواژەی (جەنگی جینۆساید) بۆ وەسفکردنی ئەو قەتڵوعامەی لەسەردەمی دەسەڵاتی عوسمانییەکاندا دژی ئەرمەن ڕوویداوە، ڕەت دەکاتەوە. هاوکات لەنێو یەکێتی ئەورووپادا ڕایەکی بەهێز هەیە کە پێی وایە دەبێت تورکیا پێش دەستپێکردنی دانوستانەکانی پەیوەستبوون بەو یەکێتییەوە، کە وا چاوەڕوان دەکرێت سەرەتای مانگی ئۆکتۆبەری داهاتوو دەست پێبکات، ئەو کێشەیە یەکلا بکاتەوە. ئەرمەنەکان کە لە وڵاتانی ڕۆژئاوادا لۆبییەکی بەهێزیان هەیە، تورکیای عوسمانی بەوە تاوانبار دەکەن کە لەسەروبەندی جەنگی یەکەمی جیهانیدا نزیکەی سێ ملیۆن ئەرمەنی لەچوارچێوەی جەنگێکی جینۆسایددا کوشتووە، بەڵام تورکەکان پێ لەسەر ئەوە دادەگرن کە ژمارەی کوژراوەکانی ئەرمەن لەو ڕووداوانەدا لە 250 تا 300 هەزار کەسێک تێپەڕی نەکردووە. تورکیا دان بەوەدا دەنێت کە قەسابخانەیەکی لەو شێوەیە ڕووبداوە و زۆرێک لە ئەرمەنەکان لەکاتی گواستنەوەیاندا لەشوێنی نیشتەجێبوونی خۆیان کوژراون، بەڵام وای دادەنێت کە ئەوەی ڕووبداوە تەنیا سەرکوتکردنی خەڵکانێک بووە کە بەهاوکاریکردنی ڕووسەکان لەسەردەمی جەنگی جیهانیی یەکەمدا تاوانبار بوون و هەر لەو ڕووداوانەدا ژمارەیەکی زۆری تورکیش کوژراون.

دەستگیر کردنی ئەندامێکی ڕێکخراوی قاعیدە کە پەیوەندیی بە موخابەراتی سوریاوە هەبووە

Peyamner – فرانس پرێس – وەزارەتی بەرگریی عێراق ڕۆژی سێشەممەی ڕابردوو ڕایگەیاند کە هێزەکانی پاسەوانانی سنوور ڕۆژی یەکشەممەی پێشوو لە پارێزگای ئەنبار تیرۆرستێکی عێراقیی سەر بە ڕێکخراوی قاعیدەیان دەستگیرکردووە کە چاوەڕوانی وەرگرتنی ئۆتومبیلێکی مینرێژکراوی لەلایەنی سوورییەوە دەکرد. وەزارەتی نێوبراو هەروەها ڕایگەیاند کە دەستگیرکراوەکە پەیوەندیی بە دەزگای موخابەراتی سوریاوە هەیە.

بەگوێرەی بەیاننامەیەک لە مەکتەبی ڕاگەیاندنی وەزارەتی بەرگرییەوە، هێزەکانی پاسەوانیی سنوور ڕۆژی یەکشەممەی ڕابردوو لەسەر سنووری نێوان عێراق سوریا لە پارێزگای ئەنبار، توانیویانە ناجی خەلەف ئیبراهیم دەستگیر بکەن کە دەیویست ئۆتومبیلێکی مینرێژکراو لەلایەنی سوریاوە بگەیەنێتە ناو عێراق و بیتەقێنێتەوە.

بەڵێی بەیاننامەکە نێوبراو خەڵکی (گەرمە)ی سەر بە پارێزگای ڕومادیە و لەکاتی لێکۆڵینەوەدا دانی بەوەدا ناوە کە ئەندامی ڕێکخراوی قاعیدەیە و پەیوەندیی بە دەزگای موخابەراتی سوریاوە هەیە و خولێکی مەشقکردنی لەشاری لازقییە بینیوە.

Impressum
خاوەنی ڕۆژنامە
Peyama Kurd Verlag
Peyama Kurd
Thomas-Mann-Str. 22
53111 Bonn / Germany
Fon: +49 (0228) 18 00 654
+49 (0228) 18 00 655
Fax: +49 (0228) 18 00 656
www.peyama-kurd.com
info@peyama-kurd.com
ژمارە تەلەفۆنی ئابونە
+49 (0228) 41 02 801
دەستەی نووسەران
کرمانجی ژێرین:
دانا عەلی، ئینوس فایەق، زەکی عەزیز، نزار جاف، جوتیار داڤروش، مەنسور سیدقی
سۆرانی جوارتایی
کرمانجی ژوور:
فادل ئەرچیلیک، سیروان حاجی بەرکۆ، سلێمان ئالیخانی، ز. پیرکەمال
کرمانجی (زازاکی):
سەیدخان کورژ
پەیامی کورد بە مافی خۆی دەزانێ کە ئەو بابەتانەی پێی دەگات کورت بکاتەوە و لە بارێ ڕێزمان ڕاستیان کاتەوە و بابەتی بڵاوکراوە لە ماوەیەکی چاپ نەکات.
پەیامی کورد نازادە ئەو بابەتانەی کە بڵاو و هێرشی نایەجێتی تیدایە بڵاو نەکاتەوە.

پەیامی کورد

ژمارە ٣٢ (ساڵی یەکەم)

رۆژنامەیەکی هەفتانەی گشتییە

٢٠٠٥/٤/١٥

چیا حاجۆ: وەرزشکارێکی کورد لە ئاستی وەرزشی جیهانیدا



لاپەڕەی 13

رامسفێلد سەردانی عێراق و کوردستان دەکات
یەک سەردان و دوو پەیامی جیاواز





رۆژی سێ شەممە 12/4/2005 دۆناڵد رامسفێلد ی وەزیری دەرەوەی ئەمریکا لە سەرانێکی کتوپردا گەیشتە بەغداد. سەرەتا لەگەڵ سەرۆک کۆماری عێراق بەریز جەلال تاڵەبانی کۆبوونەوە و دواتر لەگەڵ ئیبراهیم جەعفەری و ئەیاد عەلاوی و بەرپرسانی حکومەتی پێشوو و نوێی عێراق. لە کۆنگرەیەکی رۆژنامەوانی کورتدا مام جەلال ئەمریکای بە هاوپەیمان و هێزەکانی ئەمریکاشی بە هاوڕێ ناوبرد و هیواشی خواست کە پەیوەندی یەکی باشتریان لەگەڵ ئەمریکادا هەبێت لە داهاتوودا، تاڵەبانی پێشبینی ئەوەشی کرد کە هێزەکانی ئەمریکا لە ماوەی دوو ساڵی داهاتوودا عێراق بەجێبهێڵن؛ لە درێژەی قسەکانیدا گوتی(پێویستە کاتی تەواو بدرێت بە هێزەکانی عێراق بۆ بنیاتنانەوەی خۆیان و کۆنترۆلکردنی وڵات تا وایان لێبێت بتوانن بەو ئەرکانە هەستن کە ئێستا 140000 هەزار سەربازی ئەمریکایی پێی هەڵدەستن، ئیمە هەوڵ دەدەین زۆر بە خێرایی هێزەکانمان بنیات بنێین و لە دوو ساڵی داهاتوودا جڵەوی ئاسایش بەدەست بگرین..لە تەوەرێکی تری گفتوگۆکەدا مام جەلال سوپاسی حکومەتی ئەمریکی کرد بۆ ئەو هەوڵ و تێکۆشانەی لە پێناو رزگارکردنی عێراق لە دەستی ئەو دیکتاتۆرە و بەرەنگاربوونەوەی تیرۆر. دوای کۆبوونەوەکانی لە بەغداد، سەردانی کوردستانی کرد و لە پیرمام لەلایەن بەریز مەسعود بارزانی یەوە بە شێوەیەکی ڕەسمی و تەشریفاتی پێشوازی کرا و دواتریش کۆنگرەیەکی رۆژنامەوانیی کورتیان ئەنجامدا. سەردانەکەی رامسفێلد تەنها سەردانێکی سەرپێی و بۆ بەسەرکردنەوەی هێزەکانی ئەمریکا نەبووە. سەرچاوە ئاگادارەکان وای لێکدەدەنەوە کە رامسفیلد هاتووە هۆشداری بداتە حکومەتی نوێی عێراق کە پابەندی ڕێنوێنی یەکانی ئەمریکابن، لە پێش هەموویانەوە پابەندی نووسینەوەی دەستوور و خۆئامادەکردن بۆ هەڵبژاردنی داهاتوو لە کاتی خۆیدا، هەروەها بێلایەن ڕاگرتنی سوپا و دەستێوەرنەدانی لە کاروباری دەوڵەت و بێلایەنی دادگا و بە حیزبی نەکردنی دامودەزگاکانی دەوڵەت، هەروەها نەیاری خۆشی بۆ ئالوگۆڕەکانی دەزگاکانی ناوخۆ و سوپا بە ناوی پاکسازی ڕاگەیاند. پێشتریش قسەکەری وەزارەتی دەرەوەی ئەمریکا نەیاری خۆی بۆ لێبوردنەکەی مام جەلال لە یاخیبووەکان ڕاگەیاند و گوتی نابێت ئەو کەسانە بگرێتەوە کە سەربازانی ئەمریکی یان کوشتووە. دواتر سەردانی کوردستانی کرد و دوای کۆبوونەوەیەکی تایبەت لەگەل بارزانیدا، کۆنگرەیەکی

بۆ لاپەڕەی ٧

کورد لە سایەی عێراقی نوێدا

زەردەشت خورماڵی - لەگەڵ ئەوەی کە ئاراستەکانی سیاسەتی نێودەوڵەتی و ناوچەکەش تا ڕادەیەک بە قازانجی کورد دەشکێتەوە، بەڵام هێشتا کات زووە تا کورد پشتوێنی لێ بکاتەوە و پاڵی لێ بداتەوە. لە ڕاستیشدا هەرچەندە بار و دۆخەکەی ئێستا گونجاو و لەبارە بۆ کورد، کەچی لە هەمان کاتیشدا مەترسییەکان لە هەموو ساتێکی دیکە پترن بۆ لەناوبردن یان شێواندنی هەندێ داواکاری سەرەکی گەلی کورد لە سیستەمی سیاسی عێراقی دوای ڕژێمی دیکتاتۆری سەدام. لێرەشدا نابێت گەلی کورد بە هەڵبژاردنی بەرێز مام جەلال بۆ پۆستی سەرۆکایەتی ئەوەندە گەشبین و بەختەوەر بێت کە ئیدی وابزانێت گرفتەکانی دیکەشی کورد بە هەمان شێوە چارەسەر و بەلادادەخرێن. هەڵبەتە هەڵبژاردنی مام جەلال بۆ پۆستی سەرۆکایەتی عێراق لە خۆیدا سەرکەوتنێکی مەزن بوو بۆ نەتەوەی کورد و بە وەرچەرخانێکی ئاشاسایی لە میژووی عێراق و ناوچەکە دەژمێردرێت و دەکرێت لە سایەیدا کورد پتر پابەندی داواکارییە ڕەواکانی بێت بەتایبەتی سەبارەت بە ناوچە کوردییە تەعریب کراوەکان و لە سەرووی هەموشیانەوە کەرکوکی دڵی کوردستان. سەرچاوە بە ئاگاکان ئاماژە بەوە دەدەن کە ئەگەری ئەوە هەیە باڵە سیاسییە عێراقییە جیاوازەکان فشار بخەنە سەر لیستی هاوپەیمانی کوردستان تا هەندێ لە داواکارییەکانیان دوابخەن یان بەلای کەمەوە تاماوەیەکی دیاریکراو هەڵیانپسێرن، ئەو سەرچاوانە لە درێژەی قسەکانیاندا، دەڵێن ئەگەر هات و هاوپەیمانییەتی کوردستان چووە ژێرباڕەوە ئەوا دەکرێت لە داهاتوودا جۆرە گۆڕانکارییەک بەسەر ئەو داواکارییانەدا بێت و بەو جۆرە نەمێنێتەوە کە کورد دەیخوازێت. گومانیش لەوەدا نییە کە هەموو هێزە سیاسییە عێراقییەکان"بە شیعە و عەرەبە سوننییەکانەوە" زۆر بە نیگەرانییەوە دەڕواننە یەکخستنی مالی کورد و هاتنە ئارای وتارێکی یەکگرتوو کە هەموو هێزە کوردستانییەکان کۆکن لەسەری و پێ لەسەر دادەگرن. ئەم نیگەرانییە لەوانەیە جۆرە(ڕێکەوتنێکی کاتی) یان(لەیەکگەیشتنێکی دیاریکراو) لە نێوان ئەو دوو باڵە سیاسییە عێراقییە بهێنێتە ئاراوە کە لە خۆیدا بە هەوڵێکی سەرەتایی دادەنرێت بۆ کۆسپ دانان لە ڕێگەی داخوازییە ڕەواکانی گەلەکەمان. هەڵبەتە لە گەمەی سیاسیدا دەبێت پێشبینی هەموو ئەگەرێک بکرێت و پارت و هێزە کوردستانییەکانیش کاتێکی تێکەڵ بە گەمەکە دەبن ئەوا ئەگەری ئەوە هەیە کە لە ژێر کاریگەری هەندێ بار و دۆخی تایبەتیدا چاو لە هەندێ داواکاری گرنگ(بۆ ماوەیەکی دیاریکراو)بپۆشن، یان لانی کەم جۆرە گۆڕانکارییەک بەسەر داواکارییەکاندا بهێنن تا لەگەڵ تێڕوانینی باڵە سیاسییە عێراقییەکاندا بگونجێت. کاتێکیش کە ئاستەنگ لە سیاسەتدا بوونی نییە و ئامانج و داواکارییەکانیش دەچنە ژێر کاریگەری هەل و مەرج و پێشهاتە چاوەڕوانەکراوەکان، ئەو کاتە مافی خۆمانە کێچ بچێتە کەوڵمانەوە و نیگەرانی یەخەمان بگرێت، چونکە چوونە ژێر باری هەر جۆرە فشارێک لەم کاتە ناسکەی عێراق و کوردستاندا، واتای دووبارەبوونەوەی هەمان پاشقوڵەکەی ساڵی١٩٢١ ڕادەگەیەنێت، ئەمەش لەخۆیدا واتای ئەوە دەگەیەنێت کە دیسانەوە گرەوەکەمان دۆڕان و خۆمان حەشاردایە ناو بازنەیەکی داخراوەوە و دیسانەوە دەبێت چاوەڕوانی گۆڕانکارییەکی مەزن بین تا لە سایەیدا شتێ بە شتێک بکەین. لە هەمان کاتیشدا نابێت باڵە سیاسییە عێراقییە جیاوازەکان بە کەم بگرین و وابزانین کە دۆستی کورد و ئەمریکا لە سەرووی هەموو گۆڕانکارییەکی سیاسییەوەیە، چونکە ئەگەری ئەوە هەیە کە هەموو باڵە سیاسییە عێراقییەکان ڕێککەون لەسەر جۆرە(تەنازولێکی) ئاشاسایی بۆ ڕۆژاوا لەپێناوی ڕێگەگرتن لە داواکارییە ڕەواکانی گەلەکەمان و ڕێککەوتنامە شوومەکەی جەزایر دەکرێت بە شێوە و ڕووخسارێکی دیکە دووبارە بێتەوە. هەربۆیە زۆر گرنگە کە شەقامی کوردی بە گشتی و ڕۆشنبیرانیش بە شێوەیەکی تایبەتی ڕۆڵی مێژوویی خۆیان بەم ئاراستەیە ببینن و لە هەموو ئان و ساتێکی مێژووی دیکە وشیار و بە ئاگاتربن. ڕۆشنبیرانی کورد دەبێت ئەرکی مێژوویی سەر شانی خۆیان جێبەجێ بکەن لەمەڕ چاودێریکردنێکی ژیرانەی گۆڕانکارییە سیاسییەکانی عێراق و کوردستان و خستنە ژێر تیشکی هەموو ئەو ئەگەرانەی کە بە زیانی داهاتووی نەتەوەکەمان دەکەوێتەوە تا هەر لە ئێستاوە ڕێگە چارەسەرییەکی گونجاوی بۆ بدۆزرێتەوە بەر لەوەی کار لە کار بترازێت و دەستمان لە بن هەمانەکەوە دەربچێت. ڕۆشنبیرانی کورد بە نزیکبوونەوەیان لە شەقامی کوردی و گەیاندن و شیکردنەوەی واتا و ناوەڕۆکی هەموو ئەگەرەکان لە بەردەمیدا، ئەوا ئەم کارە لە خۆیدا شەقامی کوردی دەکاتە یاریزانی سەرەکی گەمە سیاسییەکە و ئەو کاتەش هیچ جۆرە فرت و فێڵ و پاشقول و تەڵەکەبازی سوودی نابێت، تەنها ئەوە نەبێت کە داواکارییە ڕەواکانی بە ڕاست و ڕوونی جێبەجێ بکرێن. ■■■■

حامید گەوهەری

ڕۆڵی بارزانییەکان لە کۆماری کوردستان و بزووتنەوەی ڕزگاریخوازی کورد دا

• شەڕی مامەشا و قاراوە بە دوژمنی سەلماند کە بە ڕێگای شەڕ ناتوانێ چۆک بە گەلی کورد دابدات. بۆیە بە فێڵ و تەڵەکە ڕێگای وتوێژی لەگەڵ ڕێبەرانی کۆمار گرتەبەر.

• لە خاڵی چوارەمی ئەو پەیمانەدا، سەرۆک مستەفا بارزانی بە سەرۆکی گشتی هێزە هاوبەشەکانی کۆماری کوردستان و ئازربایجان لە بەرەی شەڕی سەقز هەڵیژێردرا، هەرچەندە بارزانی دەیزانی مۆمی ژیانی هەردوو کۆمار بەرەو خامۆشی دەچێ

لاپەڕەی ٢

غازی حەسەن - ئەمریکا

ئایا عێراق دیموکراتییە؟

• کورد یەکێکە لە لایەنە سەرەکییەکانی پێکهاتەی دەسەلاتی سیاسی لە عێراقدا کە زۆرانێک لە ئێمە بە عێراقی نوێ ناوی دەبات.

• خەونە، کە کورد بەرامبەر جەلادەکانی پۆستی سەرۆکایەتی دەولەتێکی بەرکەوت، کرادارێکی مێژوو کردە کە کوردێک کار بۆ یەکخستنەوەی عێراقێک لەسەرلێواری لەتبوون و لێکدابڕان بکات و جەلادەکانیشی لە جەنگی دەروونی نێوەخۆییدا لە زبندانەکاندا بتلێنەوە.

لاپەڕەی ٢

دیمانەیەک لەگەڵ شاعری نەوەی نوێ چنار نامق

• ڕەوتی ژیان پێویستی بە هەموو لایەنێکە، شیعریش بەشێکە لەلایەنە پێویستەکانی ژیان.

لاپەڕەی ٤



www.kurd.org